

**ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN JÎNDAR
MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ**

Teza Lîsansa Bilind

DEVOKA DEVERA FILISTANÊ

Zafer AÇAR

121302102

ŞÊWIRMENDÊ TEZÊ

Alk. Doç. Dr. M. Zahir ERTEKÎN

Bîngol – 2015

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi

FILİSTAN YÖRESİ AĞZI

Zafer AÇAR

121302102

TEZ DANIŞMANI

Yrd. Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN

Bingöl – 2015

JI BO RÊVEBIRIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ

Ev xebat ji aliyê juriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî de wekî Teza Lîsansa Bilind hatiye pejirandin.

(îmze)
Serok : ..*Prof. Dr. Hasan Çiftçi*..
(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)
Endam : ..*Yrd. Doç. Dr. M. Bahir ERTEKİN*..
(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)
Endam : ..*Yrd. Doç. Dr. Hayreddin KIZIK*..
(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)
Endam :
(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)
Endam :
(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku îmzeyên jorîn ên endamên hîdekariyê yên navborî ne.

Îmze

.....
Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav

Rêvebirê Enstîtûyê
(Mor)

NAVEROK

NAVEROK	II
KURTE	VI
ÖZET.....	VII
ABSTRACT	VIII
PÊŞGOTIN	IX
LÎSTEYA TABLO Û WÊNEYAN.....	X
KURTKIRIN.....	XI
NÎŞANÊN VEGUHASTINÊ	XII
DESPÊK.....	1
1.BEŞA YEKEM	5
1.1.DANASÎNA NAVÇEYÊ.....	5
1.2.ERDNIGARIYA NAVÇEYÊ.....	5
1.3.DÎROKA NAVÇEYÊ	5
1.4.REWŞA ÎDARÎ YA NAVÇEYÊ.....	7
1.5.DANASÎNA DEVERÊ	7
2.BEŞA DUWEM.....	9
2.1.ZIMAN.....	9
2.1.a.Zarave.....	9
2.1.b.Devok	9
2.2.Zimanê Kurdî	10
2.2.DENGZANÎ	12
2.3.DENGSAZÎ.....	12

2.3.1.Dengsaziya Kurdî.....	13
2.3.2.Dengên Kurdî.....	13
2.3.2.a.Dengdêr.....	16
2.3.2.b.Dengdar.....	17
3.BEŞA SÊYEM.....	19
3.1.DENGSAZIYA DEVERÊ.....	19
3.2.a.Dengdêr.....	19
<u> </u> Dengdêra ‘a.....	19
<u> </u> Dengdêra ‘e.....	19
<u> </u> Dengdêra e’.....	19
<u> </u> Dengdêra ‘i.....	19
<u> </u> Dengdêra ‘î.....	20
<u> </u> Dengdêra ‘u.....	20
3.2.a.1.Guherîna Dengdêran.....	20
<u> </u> Guherîna î > y.....	20
<u> </u> Guherîna û > î.....	21
<u> </u> Guherîna û > w.....	21
<u> </u> Guherîna ê > î.....	21
<u> </u> Guherîna e > i.....	21
<u> </u> Guherîna u > i.....	21
3.2.a.2.Ketina Dengdêran.....	22
3.2.b.Dengdar.....	22
<u> </u> Dengdara ç.....	24
<u> </u> Dengdara ğ.....	24
<u> </u> Dengdara h.....	24
<u> </u> Dengdara k.....	24

<u> </u> Dengdara p	24
<u> </u> Dengdara r	24
<u> </u> Dengdara n	25
<u> </u> Dengdara t	25
3.2.b.1. Guherîna Dengdaran	26
<u> </u> Guherîna b > v	26
<u> </u> Guherîna d > c	26
<u> </u> Guherîna d > t	26
<u> </u> Guherîna f > v	26
<u> </u> Guherîna h > h	26
<u> </u> Guherîna j > ş	26
<u> </u> Guherîna n > m	26
<u> </u> Guherîna r > l	26
<u> </u> Guherîna s > z	27
<u> </u> Guherîna y > w	27
3.2.b.2. Ketina Dengdaran	27
<u> </u> Ketina “d”yê	27
<u> </u> Ketina “h”yê	27
<u> </u> Ketina “k”yê	27
<u> </u> Ketina “n”yê	27
<u> </u> Ketina “t”yê	28
<u> </u> Ketina “y”yê	28
3.2.b.3. Di dengdaran de Cotbûn	28
3.3. Di Kîteyan de Rûdanên Dengan	28
3.3.1. Dariştina Kîteyan	29
<u> </u> Kîteya “da”	29

<u> </u> Kîteyên “ka, kan, kî”	29
3.3.2. Ketina Kîteyan	29
3.3.3. Kewyana Kîteyan	30
3.3.4. Racivîn	30
3.4. Biservekirin	30
3.5. Di Ravek û Tewanga Navan de Rûdanên Dengan	31
3.5.1. Di Ravekê de	31
3.5.2. Di Raveka Zincîrîn de	32
3.5.3. Di Tewanga Navan de	32
3.6. Di Cotepeyvan de Rûdanên Dengan	33
ENCAM	34
ÇAVKANÎ	37
PÊVEK 1: Dengên Kurdî li gor Alfabeya Fonetîk a Navnetewî	40
PÊVEK 2: Alfabeya Dengên û Tîpên Kurdî - Berawirdkirî	41
NEXŞEYA ELCEWAZ Ê DEVERA FILISTANÊ	42
WÊNE: ÇIYAYÊ SÎPAN, ELCEWAZ Ê FILISTAN	43
METN	44
FERHENG	99

KURTE

Lêkolînên ser zimanê kurdî roj bi roj zêdetir dibin. Êdî niha zêdetir zanîngeh lêkolînên ziman, edebiyat, dîrok û çanda kurdî dikin mijara xwe. Lêkolînên ser şêwe û devokên kurdî jî êdî zêdetir tên kirin û hem lêkolînên qadê û hem jî lêkolînên ser berheman niha zêdetir agahiyan li ser devokên kurdî didin.

Wekî ku tê zanîn li ser devokên kurmacî xebatên akademîk ên wekî tez nû ne. Hem dengsazî(fonetîk), hem bêjesazî(morfoloji) û hem jî hevoksazî(sentaks) ya kurmacî di van çend salên dawî de dibin mijara xebatên akademîk û tezan. Digel pirsên termînolojiyê, standardê û berhemên rêzimana kurmacî jî tezên li ser devokan dikarin gelek pirsan çareser bikin û rê li ber pêşketina kurmacî vekin.

Xebatên devokên kurmacî gelekî pêwîst in û ji ber pircuretiya devokên wê berhevkerin û lêkolîna wan dê xizmeteke mezin ji kurdî re bikin. Em hêvî dikin ev xebata me ya li ser devokeke devereke herêmeke kurmacî dê bibe nimûneyeke pêşîn û dê alîkariya lêkolîneran bike.

Peyvên Sereke: Kurmacî, Devok, Devera Filistanê, Dengzanî, Dengsazî

ÖZET

Son zamanlarda Kürtçe üzerine arařtırmalar giderek yoęunlařmaktadır. Artık Kürt dili, tarihi, edebiyatı ve kùltürü üzerine bilimsel çalıřmalar daha çok üniversitenin ilgi alanı haline gelmiřtir. Kürtçenin řive ve aęızları üzerine çalıřmalar artık hem alan arařtırmaları řeklinde hem de eserler üzerinde arařtırmalar yapılarak devam etmekte ve Kürtçenin aęızları üzerinde daha fazla bilgi vermektedirler.

Bilindięi gibi Kurmancinin aęızları üzerinde tez düzeyinde akademik çalıřmalar yenidir. Artık Kurmancinin ses bilgisi, řekil bilgisi ve cümle bilgisi tezlere konu olmaktadır. Kurmancideki terminoloji, standardizasyon ve dilbilgisi eserlerinin sorunlarıyla beraber aęız çalıřmalarıyla ilgili tezler pek çok sorunun çözümlüne ve Kürtçenin gelişimine yardımcı olabilirler.

Kürtçenin aęızlarıyla ilgili çalıřmalar çok önemlidir ve kürtçedeki aęız çeřitlilięinden dolayı derleme ve incelemeler Kürtçeye büyük bir katkı saęlayacaktır. Kürtçenin bir bölgesindeki bir yöreden derledięimiz bu çalıřmanın öncü bir örnek olacaęına ve arařtırmacılara yardımcı olabileceęine inanıyoruz.

Anahtar Kelimeler: Kurmancî, Aęız, Filistan Yöresi, Sesbilim, Ses Bilgisi

ABSTRACT

Researches on Kurdish language enlarge day by day. Today more universities study on Kurdish language, literature, history and culture. Researches on sub-dialects and accents of Kurdish language enlarge as well. Moreover both fieldworks and literature researches give more information on Kurdish dialects.

As it is known well academic studies on sub-dialects of Kurdish are novice. In recent years phonetic, morphology and syntax of Kurdish are subject matters of academic studies and thesis. Along with problems of terminology, standardization and grammar books of Kurmanci, thesis on sub-dialects could solve many issues and improve Kurmanci.

Studies on sub-dialects of Kurmanci are significant. Collecting and studying of numerous sub-dialects will make major contributes to Kurdish. We hope that this study on a sub-dialect of an area of a Kurmanci speaking region would be a leading pioneer and help researchers.

Key Words: Kurmancî, Sub-dialect, Area of Filistan, Phonology, Phonetic

PÊŞGOTIN

Bi navê Xwedayê Rehman û Rehîm.

Kurdî zimanekî dewlemend e û xwedî dîrokeke dirêj e. Ji ber bandora dîrok û erdnigariyê, kurdî berbelav bûye, guhertin dîtiye û bûye xwediyê gelek zarave, şêwe û devokan. Her zarave bi tevî devokên xwe ve têra xwe dewlemend e û xwediyê çandekê rengîn e. Di nav zaravayê kurdî de jî ji aliyê jimara qisekaran û berbelaviya rûerdê ve kurmancî zaraveya herî mezin e û xwediyê gelek devokan e.

Di zimanekî de devok, ji bo naskirin û fêmkirina çawaniya zimanekî nimûneyên hêja ne. Herwiha xebatên ser devokan ji bo berhevkirina hêmanên folklorê, derxistina hin bêjeyan û ji mirinê xilaskirina wan, fêmkirina rewş û rûdanên zimên gelekî girîng in. Dîsa xebatên ser devokan; dengên cuda, bêjeyên cuda, hevok û qalibên cuda yên zimên derdixin û dema ev xebat hatin komkirin di derheqê wî zimanî de agahiyên nû derdixin û îmkana terîfên giştî di derbarê zimên de didin.

Wekî ku tê zanîn li ser devokên kurmancî, xweser jî li Kurdistana Bakur, xebatên akademîk ên ser devokan gelekî kêr in û nû ne. Herwiha li ser dengsazî, bêjesazî û hevoksaziya kurmancî xebatên akademîk gelekî kêr in. Ji ber ku herêma kurmancî evqas mezin û lêkolînên ser devokên kurmancî evqas kêr in, ev rewş; qadeke vala, îmkana lêkolînên berfireh û firsendên mezin derdixe pêşîya me. Me jî da dû van îmkana û firsendan û devereke ji Herêma Serhedê da ber xwe û xebata xwe li ser devoka vê deverê kir.

Me berhevokên xwe ji Devera Filistanê girtin ku ev dever, di navbera Elcewaz û Erdîşê de ye û dikeve binê riya van herdu navçeyan û bi tevayî heft gund û zozanek in.

Ji bo vê xebata xwe ez di serî de ji malbata xwe re, ji gelê deverê û heçiyê ku alîkarî kiriye re spas dikim. Dîsa ji bo pêşniyar û alîkariya wan ji Seyfeddin AYKAÇ û Yakup AYKAÇ re spasîyên xwe pêşkeş dikim. Herwiha ji bo pêşniyar, pişgirî û alîkariya wî ji şewirmendê xwe birêz Alk. Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN re spas dikim.

Zafer AÇAR

Wan - 2015

LÎSTEYA TABLO Û WÊNEYAN

Tablo 1	Tabloya dengdêrên kurmancî	16
Tablo 2	Tabloya dengdarên kurmancî	18
Tablo 3	Tabloya dengdêrên deverê	20
Tablo 4	Tabloya dengdarên deverê	25

KURTKIRIN

b.	: Baneşan
b.n.	: Berhema navborî
bnr.	: Binêrin
B.Z.	: Berî Zayînê
c.	: Cild
cn.	: Cînav
ç.	: Çap
d.	: Daçek
êd.	: Ên din
g.	: Gihanek
h.	: Hoker
h.b.	: Heman berhem
hn.	: Hevalnav
j.	: Jimar
n.	: Nav
P.Z.	: Piştî Zayînê
r.	: Rûpel
wd.	: Wekî din
wer.	: Werger
ww.	: Wekî wan

NÎŞANÊN VEGUHASTINÊ

1. Dengdêr

a	: a
‘a	: a’ya eynî
e	: e
‘e	: e’ya eynî
e’	: dengê e digel dengê ‘e, coddengdêr, pevdeng.
ê	: ê
i	: i
‘i	: i’ya eynî
î	: î
‘î	: î’ya eynî
o	: o
u	: u
‘u	: u’ya eynî
û	: û

2. Dengdar

b	: b
c	: c
ç	: ç
ç	: ç’ya nerm û nehilmî.
d	: d
f	: f
g	: g
ğ	: dengê qirikî û zimanokî, di navbera “g” û “x”yê de.
h	: h
h	: dengê qirikî û zimanokî, ji “h”yê stûrtir e.

j	: j
k	: k
ќ	: k'ya nerm û nehilmî.
l	: l
m	: m
n	: n
ñ	: n'ya stûr, pêşarîkî û difnî.
p	: p
þ	: p'ya nerm û nehilmî.
q	: q
r	: r
ř	: r'ya stûr
s	: s
ş	: ş
t	: t
ţ	: t'ya nerm û nehilmî.
v	: v
w	: w
x	: x
y	: y
z	: z
...>	: Ji forma berê guherîna forma niha.
<...	: Forma berê, forma standart.
˘	: Hevgirtina bêjeyan, nîşana biservekirinê.

DESPÊK

Xebatên li ser devokan ji bo hînbûna hûrgiliyên zimên, taybetiyên rêzimana wî, folklor û edebiyata devkî ya wî zimanî gelekî girîng in. Îro li gelek deverên herêmên zaravayên kurdî gelek hêmanên zimanê kurdî veşartîne û li benda keşîfkirinê ne.

Heta niha gelek xebat li ser rêzimana kurdî, edebiyat û folklorê kurdî hatine kirin. Lê xebatên ser devokên kurdî hêj nû ne û yê akademîk wekî tez gelekî kêmtir in.

Giringiya Mijarê

Di zaravayê kurmancî de gelek dever hene ku hêj xebatên akademîk ser nehatine kirin. Ji bo ku tezên ser devokên kurmancî nû ne ev xebata me em hêvî dikin dê bibe nimûneyek pêşîn û ji bo lêkolîneran dê bibe alîkar.

Me xebata xwe kire sê beş. Di beşa pêşîn de me danasîna navçe û deverê kir ku dîroka navçeyê, erdnîgariya wê û rewşa îdarî ya wê diheve. Herwiha me di derbarê deverê de danasîneke kurt jî kir. Di beşa duwem de me behsa ziman û şaxên wê, zimanê kurdî û zaravayên wê kirin. Dîsa me behsa dengzaniyê û ji ber ku xebata me ser dengsaziya deverê bû me behsa şaxên dengzaniyê û di nav wan de jî behsa dengsaziyê kir. Di beşa sêyem de jî me cî da lêkolîna xwe. Di lêkolîna xwe de digel tesbîtên xwe yê ser devokê, me dengên deverê û rûdanên dangan di devoka deverê de tesbît kirin; dengdêr, dengdar, ketin û guherîna wan, rûdanên kêteyan, kewyan û dariştina kêteyan, racivîn û hin rûdanên din me tesbît û rave kirin.

Piştî van hersê beşan me metnên ku girtibûn û deşîfre kiribûn digel berhevok û vebêjên wan, bi rêzê me xist nav teza xwe, di dawiyê de jî me bêjeyên xasî deverê û yê li deverê cuda tîrê bilêv kirin, digel wateyên wan, di dawiya teza xwe de di bin navê ferhengê de kom kirin.

Xebatên bi vî rengî divê zêde bibin, divê zanîngeh û beşên ziman û edebiyata kurdî gelekî giringiyê bidin tezên ser devokên kurdî. Heke tezên ser devokên zaravayên kurdî bên kirin, pê wan dê ziman û edebiyata kurdî geş bin. Lewre metnên ku tîrê girtin hem hêmanên edebiyata devkî, hem hêmanên folklorê û hem jî bêjeyên nû dertînin.

Rêbaz û Armanc

Ji bo ku em vê xebata xwe bikin, me ev rêbaz şopandin û me ev armanc dan pêşiya xwe:

Rêbaz

Di Xezîrana 2014'an de, ji bo agahiyên li ser Elcewazê û gundên wê me Şaredariya Elcewazê û Qaymeqamiya wê ziyaret kir. Me li navçeyê bi kesên ku li ser navçeyê xwedî agahî bûn re hevdîtin pêk anîn û hin agahî ji wan girtin.

Dîsa ji bo lêkolîna qadê; em li heft gundên deverê -digel zozaneke gundekî wê- geriyan. Me metnên xwe ji gundên **Bilîs (Bitlis) - Elcewazê (Adilcevaz)** yên **Devera Filistanê** ku dikeve navbera riya **Elcewaz - Erdîşê** û Gola Wanê girtin ku ev gund: **Arinçkûs (Kavuştuk), Arîn (Göldüzü), Axçira (Akçira) - Livind (Levent), Koçerî (Erikbağı), Pargat (Esenkiyî), Qerekeşîş (Yarımada) û Xornas (Karşiyaka)** in. Pêşî me kal û pîrên gundan diyar kirin û lêpîrsîna; temenê wan, xwendin û nexwendina wan, xwecihîbûn an nebûna wan kirin. Dûre li her gundekî herî kêr kesek herî zêde çar kesan re me hevdîtin pêk anîn ku temenê wan di navbera 63-93'an de bûn, û me ji wan, mijarên ku me pêş de diyar kiribûn pîrs kirin û ew dan axaftin. Me axaftin û vegotinên wan jî girtin qeydê û ji cîhaza qeydê jî ew derbasî ser rûpelan kirin.

Mijarên ku me ji kal û pîrên deverê pîrs kirin piranî ev bûn: *“Dewat, Cot, Çêkirina Xalîçeyan, Çêkirina Kulavan, Çêkirina Rîs, Çûna Aş, Çêkirina Hin Xwarinan, Çêkirina Hin Amûran, Serpêhatî, Lîstik, Bênder, Girtina Berên Şîr û Çûna Zozanan.”* Paşê me ew mijar nivîsîn û dengên deverê tesbît kirin û ew di metnan de diyar kirin. Dûre ji bo ku wateyên wan bê fêmkirin me bêjeyên xasî deverê tesbît kirin û di dawîya xebata xwe de ew di qismê ferhengê de nîşan kirin digel wateyên wan.

Piştî lêkolîna qadê, di derbarê teza xwe de me çavkaniyên nivîskî û dîtbarî lêkolan û em li tezên ku hatibûn nivîsîn geriyan, -çi kurdî çi tirkî û çi îngilizî bin- û me ji hinekên wan piranî ji aliyê rê û rêbazên nivîsandinê ve îstifade kirin. Komkirina çavkaniyan û xwendina wan bi qasî sê-çar mehan domandin.

Piştî komkirina çavkaniyan me di meha mijdarê de dest bi deşîfrekirina metnan kirin. Metnên ku me di hevdîtinan de ji devên şazde kesan girtibûn me

nivîsîn û li gorî tîp û nîşanên veguhastinê, ku me di serê xebata xwe de cî daye wan, me ew diyar kirin. Dûre me digel beşên din ên tezê lêkolîna xwe ser metna navborî kir û teza xwe qedand.

Armanç

Di vê xebata xwe de ji bo ku dengên kurmancî yên heyî di zimanê standart û di devoka Devera Filistanê de tesbît bikin, wan bidin ber hev, cudatiya devoka deverê bi zimanê standart re nîşan bidin, hin bêje û hêmanên zimanê devkî yên deverê derînin me ev xebat kir.

Wekî ku tê zanîn sê şaxên sereke yên zimên hene ku ew jî; *dengsazî*, *bêjesazî* û *hevoksazî* ne. Ev xebata me çendî li ser devokê be jî me tenê di vê xebata xwe de lêkolîna xwe li ser dengsaziya devokê kir. Me dengên devokê, rewşa wan, bi kurmanciya standart re cudatiya wan û tabloya dangan diyar kirin. Dîsa di serê xebata xwe de me cî da nêrînên xwe yên di derbarê dengzaniya kurmancî de û li ser termînolojî û transkrîpsiyonê me fikr û pêşniyarên xwe parve kirin.

Çavkanî

Ji bo vê xebata xwe di serî de me lêkolîna qadê kir û çavkaniya herî girîng a vê xebatê gelê deverê bû. Ji bilî kesên ku me pêre hevdîtin kirin, me li hin tezên zimanê tirkî yên di vî warî de hatine nivîsîn nihêrîn. Xweser jî me ji teza li ser du navçeyên Diyarbekirê hatibû kirin zêdetir îstifade kir.¹ Dîsa li ser devokên zaravayên kurdî hin tezên ku hatine nivîsîn ên îngîlîzî me nihêrîn ku nimûne; Ebdulmecîd Reşîd Ehmed li ser fonetîka soranî², Lanja Zaîd Mehmûd dîsa li ser fonetîka soranî³ û Jodi Ludwig Marchal⁴ jî li ser fonetîka soranî û kurmanciya Behdînanî tez amade kirine dikarin bên nîşandan.

¹ Özçelik, Doç. Dr. Saadettin & Boz, Yrd. Doç. Dr. Erdoğan, *Diyarbakır İli Çüngüş ve Çermik Yöresi Ağzı*, weşanên Türk Dil Kurumu, Ankara, 2001.

² Rashid Ahmad, Abdul-Majeed, *The Phonemic System of Modern Standart Kurdish*, The University of Michigan, 1986.

³ Zaid Mahmoud, Lanja, *Kurdish Personal Affixes*, The University of Texas, July 1994.

⁴ Ludwig Marchal, Jodi, *The Phonological and Sociolinguistic Analysis of Kurdish*, Southern Illinois University, May 2007.

Ji bilî van xebatan li ser devokên kurmançî em negihîştin tu tezên bi zimanê kurdî ku em dikarin bêjin ev xebat dê bibe xebata yekem a ser dengsaziya devokeke kurmançî.

1.BEŞA YEKEM

1.1.DANASÎNA NAVÇEYÊ

Navê Elcewazê ji bêjeya erebî *Zatulcewz* tê. Ev nav cara pêşîn di navê mîrektiyeke ereb-îslam de tê dîtin ku P. Z. derdora 890'an de li vir hatiye damezrandin. Navê bajêr ê kevntir ê esil, Artske yan jî Artsîke ye. Ev nav îhtimal e ku ji zimanê Êrartû be.⁵

1.2.ERDNIGARIYA NAVÇEYÊ

Elcewaz navçeyeke Bilîsê ye ku dikeve peravê bakur ê Gola Wanê. Rûerdê wê 812 km² ye. Li başûr û rojhilatê navçeyê Gola Wanê, li bakurojhilatê wê navçeya Wanê Erdîş, li bakurê wê navçeya Agiriyê Panos û navçeya Mûşê Milazgir û li rojavayê wê jî navçeya Bilîsê Xelat heye. Li qismê axa navçeyê yê bakur çiyayê volkanîk Sîpan (4058 m.) û platoya volkanîk Zozanê Sûtê cî digre. Li qismê rojhilat jî Deşta Filistanê cî digre ku ji bo çandiniyê yek ji deşta herî pêwîst a bajarê Bilîsê ye. Navçe ji aliyê avhewa û rûbera riwekên xwe ve wekî herêma Rojhilatê Anatolyayê ye.

Beşeke mezin a axa navçeyê ji platoyên volkanîk ên bilindahiya wan cî cî 2500 metreyî derbas dibin pêk tê. Li peravê Gola Wanê bestên bi aluvyon hene. Ji bilî Çiyayê Sîpan ji 3000 metreyî jortir bilindahiyên wê tune.

Navçeya Elcewazê ji ber rewşa eraziya xwe û şiliya kêma ji aliyê jêderên avdanê ve ne dewlemend e. Lê li ser axê ev gol hene: Gola Wanê, Gola Arînê, Axirgol, Gola Cîl û Golên krater ên serê Çiyayê Sîpan in.⁶

1.3.DÎROKA NAVÇEYÊ

Dîroka Elcewazê heta Serdema Kalkolîtîk (Serdema Kevir-Paxir) diçe. Ev serdem salên B.Z. 6000 - B.Z. 2500 digre nav xwe. Piştî vê serdemê qewmê pêşîn ê ku tê dîtin li Elcewazê Hurrî ne. Hurrî ji Kafkasyayê tîna Anatolyayê û bi cî dibin. Ev

⁵ “Tarihçe”, tr.wikipedia.org/wiki/Adilcewaz, 03 Sibata 2015.

⁶ Adilcewaz Bülten 2013. r. 20

serdema ku Hurrî tède ne Serdema Bronz e. (B.Z. 2500 – B.Z. 1200). Vê serdemê ji herêmê re Hattî tê gotin. Di vê navê de li Mezopotamyayê Asûrî li ser hukm in û ji nêzîk ve ji herêmê re eleqedar in. Di vê serdemê de Asûrî li Anatolyayê koloniyên bazirganiyê ava dikin û nivîsa mixî tînin û li Anatolyayê didin nasîn. Bi vî awayî li Anatolyayê serdemên berî dîrokê diqedin û serdemên dîrokê dest pê dikin. B.Z. di sedsala 13. de li heremê serdema Konfederasyonên Êrûatrî-Naîrî tê dîtin. Di dawiya vê serdemê de li dora Gola Wanê Dewleta Êrartû tê damezrandin. (B.Z. 831) Dewleta Êrartû herêmê ji îstîlaya Asûriyan rizgar dike. Li 6 km bakurê Elcewazê Kela Kef a 2270 m bilind, yek ji berhemên herî pêwîst ên Êrartuyan e ku heta roja me maye. Deslatdariya Êrartuyan heta B.Z. 612'yan didome. Dûre li heremê bi dorê Îskîtî, Med û Pers deslatdar dibin.

Deslatdariya Persan ji B.Z. 555'an heta B.Z. 331'an didome. Di vê navê de Îskenderê Makedonî dertê seferê û Persan tevî hemî Anatolyayê ji Elcewazê jî derdixe. Piştî mirina Îskender herêm, ji fermanarê wî Selevkos re dimîne û kratiya ku bi navê Selevkos tê zanîn heta B.Z. 64'an hakimî herêmê dibe. Ji serdema bi Îskender dest pê dike heta rûxandina Selevkosan re Serdema Helenîstîk tê gotin. Serdema Helenîstîk ji aliyê Împaratoriya Romayê ve tê bi dawî kirin. Heta ku Împaratoriya Romayê ji ber koça qewman dibe du perçe Elcewaz jî bi tevê Anatolyayê di bin deslatdariya Romayê de dimîne. Paşê herêm heta 640'an di bin deslatdariya Bîzansê de dimîne. Piştî vê; deslatdarî, di nav Bîzans û Mîslîmanan de diguhere.

Cara pêşîn artêşên Îslamê di dema Hz. Umer de tînin herêmê. Piştî ku Ebbasî têk diçin û Selçûqî tînin Anatolyayê herêm wekî sînorê Merwaniyan û Prensiya Ermenî, Vaspûrakan e. Elcewaz - Xelat û Milazgir ji salên 1100 heta 1207'an di bin deslatdariya Sokmeniyên de dimînin. Dûre hakimiyeta herêmê bi dorê di nav Harzemşahî, Selçûqiyên Anatolyayê, Mongolî, Îlhanî, Karakoyûnî û Akkoyûniyan de diguhere. Di dema Osmaniyên de deslatdariya li herêmê di navbera Osmanî û Safewiyên de çend caran diguhere. Dûre bi Peymana Amasyayê (1555) Elcewaz dikeve bin deslatdariya Dewleta Osmanî. Ji vê dîrokê şûnde herêm digihêje îstîkrarê

û ev îstîkrar heta Şerê Cihanê yê I. didome. Di Şerê Cihanê yê I. de Ūris Rojhilatê Anatolyayê dagir dîkin. Elcewaz jî di 23'ê Gulana 1915'yan de tê dagirkirin.⁷

Piştî Şerê Cihanê yê I. û îlankirina Komara Tirkîyeyê Elcewaz jî 1926'an heta 1953'an li ser Xelatê dimîne. Piştî ku Bilîs dîsa dibe parêzge, Elcewaz jî di vê dîrokê de dibe navçeyekê û bi Bilîsê ve tê girêdan.⁸

1.4.REWŞA ÎDARÎ YA NAVÇEYÊ

Bi navçeyê ve girêdayî; 8 tax, beldeyek û 28 gund hene. Serjimara navenda navçeyê jî 1965'ê heta 2000'î ne pir zêde dibe lê ji 2000'î vir ve berbiçav zêde dibe. Li aliyekî din serjimara çoltera navçeyê her zêde dibe.⁹

Li gorî Saziya Îstatîstîk a Tirkîyeyê di sala 2013'yan de serjimara bajêr 14.275, ya belde û gundên wê 17.090, bi tevayî serjimara wê 31.365 kes in.¹⁰

1.5.DANASÎNA DEVERÊ

Devera Filistanê ku girêdayî navçeya Elcewaza Bilîsê ye ji heft gundan û yek jî zozanê gundekî pêk tê ku dikeve navbera Elcewaz û Erdîşê û dîsa dikeve navbera riya Elcewaz – Erdîşê û Gola Wanê. Ev dever wekî Deşta Filistanê jî tê zanîn ku navê wê ye fermî Deşta Gulistanê (Gulistan Ovası) ye.

Deşta Filistanê bi qasî 250.000 dekarî mezin e û cihê herî pêwîst ê çandiniya navçeyê ye.¹¹ Gelê deverê bi çandiniyê û ajelkariyê debara xwe dîkin. Ji bilî genim, ji bo xwedîkirina ajelan ket û korîgan jî tê çandin.

Filistan jî bêjeyên *file* (ermenî) û *istanê* pêk tê ku ji ber niştecihên wê yên berê ên ermenî ev nav girtiye. Gundên li deverê ne hemû, lê berê piranî gundên ermenîyan bûne û li gorî hin kesên deverê berê gundên kurdan jî li deverê hebûne. Dîsa li gorî vegotinên ehlê deverê piştî ku ermenî tîr ketilkin û ji deverê tîr derxistin, hin gundên deverê heta demekê vala mane û piştî komkujiya Geliyê Zîlan hin desteyên eşîrên niştecihên hin gundên Geliyê Zîlan tîr û li van gundan bi cî

⁷ b.n., r.11-13.

⁸ N. Ergören- Y. İpek, “Adilcevaz 1953 Yılında İlçe Oldu”, <http://www.adilcevaz.com>, 03 Sibat 2015.

⁹ “Nüfus”, tr.wikipedia.org/wiki/Adilcevaz, 03 Sibat 2015.

¹⁰ “Adrese Dayalı Nüfus Kayıt Sistemi Veri Tabanı”, <http://rapor.tuik.gov.tr>, 03 Sibat 2015.

¹¹ www.adilcevaz.gov.tr, 16 Tebax 2014.

dibin. Niha xelkê Devera Filistanê ji bilî Brûkiyan ku qismek ji ehlê Arinçkûsê ne û Kurhesiniyan ku ew jî qismek ji ehlê Koçeriyê ne, hemî, piranî ji hin eşîrên Devera Sîpan û Geliyê Zîlan in ku ew eşîr jî ev in: *Bekirî, Hemoyî, Asî, Şemskî, Laçekî, Kêrdizî, Berjêrî, Memanî, Sorî, Hesenî û Îskî*.

Devera Filistanê li gorî nexşekirina Öpengin & Haig dikeve Herêma Bakur a kurmançî¹² lê gundên Elcewazê; gava mirov ber bi rojavayê Elcewazê diçe di devoka gundên wê yê aliyê rojava de hin cudatîyên berçav tînin û xusûsiyetên devoka deverên Bilîs-Tetwanê xwe nîşan dide. Jixwe me li jor jî gotibû ku ehlê deverê piranî ji eşîrên Devera Sîpan (qesta me Elcewaz, Milazgir, Panos û Erdîş e) û Geliyê Zîlan in. (bnr. jor) Lewma me xebata xwe; ne wek Devoka Elcewazê, lê wek Devoka Filistanê bi nav kir lewre devoka gundên Elcewazê ne homojen e.

¹² bnr. Öpengin, Ergin & Haig, Geoffrey, “Regional variation in Kurmanji: A preliminary classification of dialects”, <http://www.kurdishstudies.net/407-983-2-PB-pdf>, 04 Sibat 2015.

2.BEŞA DUWEM

2.1.ZIMAN

Ziman navgîna îfadekirin, ragihandin û nîşandanê ye. Heta niha ziman ji aliyê gelek kesan ve bi terîfên cuda ve hatiye nasandin. Ji van pênasan hinekên wan rastîn hinekên wan jî pênasên mecazî ne ku em di biwêj û gotinên pêşiyên de dibînin. Dîsa ji bilî zimanê însan zimanê candarên din û di zimanê însan de jî zimanên xeynî dengen, wek cureyên zimên hatine nîşan dan. Dîsa bêjeya “ziman” di gelek zimanan de pirwate ye; hem ezayê tamkirinê hem jî rista ragihandinê ye ku em jêre ziman dibêjin.¹³ Em lêre dikarin ziman wiha terîf bikin: “Ziman; navgîna diyarkirina hêst, raman û daxwazan e ku wateyan bi riya dengen di nav sîstemeke xweser a dengen de nîşan dide.”

Ziman ji deng û pêkhatiyên dengen pêk tê ku ev wekî fonem, morfem, bêje û hevok in.¹⁴ Herwiha zimanek di nav xwe de vediqete hin beşan ku bi pejirandina giştî ev şaxên ziman zarave û devok in.

2.1.a.Zarave

Zarave, beşa herî mezin a zimanekî ye û devokan digire nav xwe. Şêweyeke cuda a zimanekî ye ku di herêm û welatên cuda de ji aliyê kesên zimanyek ve tê axaftin.¹⁵ Wekî mînak kurmançî zaraveyek e kurdî ye û li gelek heremên cuda tê axaftin.

2.1.b.Devok

Ji zaravayê biçûktir, li gorî zaraveyan di herêmên dorteng de tê axaftin. Di nav heman zaraveyê de, xasî deverên biçûktir e û cudahiyên wê kêmtir e.¹⁶ Wekî mînak; Devoka Botanê, Devoka Serhedê, Devoka Behdînanê çend devokên kurmançî ne.

¹³ Aksan, Prof. Dr. Doğan, *Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, weşanên Türk Dil Kurumu, Ankara, 2009, c. I, r. 50.

¹⁴ b.n., r. 57-62.

¹⁵ b.n., r. 141.

¹⁶ b.n., r. 142.

2.2.Zimanê Kurdî

Zimanê kurdî zimanekî ji malbata Hind-Ewropayî, ji şaxa Hind-Îran û ji milê Îranê ye. Zimanên Med, Faris, Belûc, Peştû, Tat, Taliş û Gilek jî di nav vê komê de ye.¹⁷ Zimanê Kurdî vediqete hin zarave û gelek devokan.

Li gorî Şerefnameyê¹⁸ kurd ji aliyê ziman, urf û adet û rewşên xwe yê civakî ve dibin çar şax, ku ev in:

1. Kurmanc
2. Lor
3. Kelxur
4. Goran

Li aliyekî din di derbarê navandina zaraveyên kurdî de hin cudatî hene. Hinek kurmancî û soranî wekî kurmancîya jêrîn û ya jorîn dinavînin, hinek navê goranî lê hinek li şûna wî hewremanî tercîh dikin. Wekî din zazakî jî bi çend navan tê navandin, wekî; “kirdkî, kirmanckî, dimilî.”¹⁹

Yek ji sinifandina kurdî ji aliyê Cemal Nebez ve wiha hatiye kirin.²⁰

1. Kurmanciya Jorîn

- 1.1.botanî
- 1.2.hekarî
- 1.3.badînanî
- 1.4.aşteyî
- 1.5.bayezîdî

2. Kurmanciya Naverast

- 2.1.soranî
- 2.2.silêmanî
- 2.3. sineyî
- 2.4.erdelanî
- 2.5.germiyanî
- 2.6.hewlerî

¹⁷ Yıldırım, Prof. Dr. Kadri, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi, Kurmanci Lehçesi*, weşanên Mardin Artuklu Üniversitesi, Stenbol, 2012, r. 22.

¹⁸ Bidlîsî, Şerefxan, *Şerefname, Dîroka Kurdîstanê*, weşanên Avesta, Stenbol, 2007, r. 101.

¹⁹ Di derbarê zaraveyên kurdî û navandina wan de bnr.: <http://candname.hawarnet.net/2012/05/em-zimane-kurdi-binasin.html>, 03 Sibet 2015.

²⁰ Yıldırım, h.b., r. 25-26.

2.7.kerkûkî

2.8.mukrî

2.9.şarbajêrî

2.10.pişdêrî

3. Kurmanciya Jêrîn

3.1.feylî

3.2.kirmaşahî

3.3. lekî

3.4.kelxurî

3.5.xaneqînî

3.6.lorî

4. Goranî û Zazakî

4.1.goranî

4.2.hewramî

4.3.zazakî(kirdkî, kirmanckî, dimilkî)

Wekî ku li jor jî diyar dibe di derbarê zarave û devokên kurdî de fikrên cuda hene lê bi pejirandina giştî zaraveyên sereke yên kurdî ev in:²¹

1. Kurmanciya Jorîn
2. Kurmanciya Jêrîn
3. Goranî
4. Kirmanckî
5. Lorî

Zimanê Kurdî wekî ku li jor hat diyarkirin; ji aliyê binyadê ve zimanekî Hind-Ewropî ye, ji aliyê şeweyê ve jî zimanekî tewangbar e. Di kurdî de dariştina peyvan bi paşgiran û pêşgiran ve çêdibe yanî bêjeyên kurdî hem li pêş û hem jî li paş ve pêvekan digirin. Dîsa kurdî ji bilî zaraveya soranî zimanekî bi zayend e.

Ziman qadeke mezin e û zimanzanî gelek zanistan digire nav xwe; dengzanî, rêziman, rastnivîs, watenasî û hêj gelek zanistên din û şaxê wan dikevin nav zimanzaniyê. Di vê xebata xwe de em ê bi kurtasî behsa yek ji van zanistan

²¹ Tan, Samî, *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî, Stenbol, 2011, r. 28.

dengzaniyê û milekî wê dengsaziyê bikin. Lê lêkolîna me dê li ser dengsaziya Devoka Filistanê be.

2.2.DENGZANÎ

Ji zanista ku li ser çêbûn, guherîn, lêkolîn û şopandina dangan dixebite re dengzanî tê gotin.²² Dengzanî hemî rewşên dangan ên wekî; guherîn, dariştin, ketin, racivîn, kewyan û wd. lêdikole û şaxeke zimanzaniyê ye.

Dengzanî heke zimaneke tenê ji aliyê dengên wê ve lêbikole wekî dengsazî tê navandin. Dengzanî hemî dengên dinyayê bi tevahî dike mijara xwe, di hemî zimanan de xalên hevpar, rûdan û qanûnan lêdikole.²³

Îro dengzanî vediqete gelek şaxan ku wekî; “Dengzaniya Gotinî, Dengzaniya Bihîstinî, Dengzaniya Akustîk, Dengzaniya Fیزیolojîk, Dengzaniya Azmûnî û Dengzaniya Giştî”²⁴ şaxên wê hene.

2.3.DENGSAZÎ

Deng, di zanista fîzîkê de wekî rûdana demborî ya bi lertzê ve pêk tê ye. Dema têlek an jî cismekî ku ji herdu aliyê wî ve hatiye rakişandin bi lêdanekê ve deng derdixe ew deng; tevgera lerizandinê ya di hewayê de ye ku bi pêlên dangan ve tê bihîstin.²⁵ Di ziman de jî: “Bayê ku ji pişikê mirov derdikeve diçe zengilorê, li vir bizavekê dide ta ango jiyên deng; ew deng bi alîkariya qirik, lêv, diran, ziman, arîkê dêv û difîna mirov dirûvekî digire.”²⁶

Di zimên de peyv li ser fenoman ava dibin, fenom wekî dengên bingehîn tên pejirandin.²⁷ Fenom bi tîpan tên îfadekirin. Kîte ji tîpan bêje ji kîteyan û hevok jî ji bêjeyan pêk tên.

²² Ocek, Nezîr, *Waneyên Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Sîtav, Wan 2014, r. 21.

²³ Aksan, Prof. Dr. Doğan, *Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, weşanên Türk Dil Kurumu, Ankara, 2009, c. I, r. 26.

²⁴ b.n., c. II, r. 9-11.

²⁵ b.n., r. 12.

²⁶ Tan, h.b., r. 36.

²⁷ b.n., r. 39

2.3.1. Dengsaziya Kurdî

Xebatên li ser zimanê kurdî ji Maurizio Garzonî vir de dewam dikin. Xweser jî li ser rêzimana kurdî gelek xebat hatine kirin û hinekên wan li ser dengên kurdî û dengsaziya kurdî zêdetir sekinîne. Xebatên ser dengsaziya kurdî jî piranî wekî beşek ji rêzimana kurdî hatine kirin. Nimûne; Xebata Bedirxan & Lescot²⁸, xebata Qanatê Kurdo²⁹ û xebata Sadiq Bahaeddînê Amedî³⁰ çend ji van xebatan in ku bi dirêjahî ser dengsaziya kurdî sekinîne. Ji bilî van xebatan xebatên wekî tez ên ser dengsaziya kurdî hêj nû ne. Ji ber ku tezên ser dengsaziya devokên kurmancî kêma in an jî nû tên kirin ew ê bi kêşeyên nestandartbûna termînolojîyê û nestandartbûna nîşanên veguhastinê re rû bir û bimînin.

Di zimanekî de hemî deng dikarin bi tîpan neyên nîşankirin lewre hem piranî deng ji tîpan zêdetir in hem jî li gorî zarave û devokên zimên, deng dikarin kêma an zêde bibin.

Dema ku dengên deverên kurmancî hatin tesbîtkirin ji bo ku tevliheviyek çênebe û standardek bê girtin divê nîşanên veguhastinê yê dengan bê tesbîtkirin û alfabeke dengan a standart bê amadekirin û li gorî wê alfabeke lêkolîn bê kirin. Eger her lêkolîner li gorî dengan nîşanên cuda bi kar bîne ew ê bibe kêşeyekê mezin û dê karê lêkolîneran dijwar bike. Wekî mînak îro di tirkî de ev kêşe heyê ku lêkolîner jê bêzar in û rîya standarda alfabeke dengan digerin. Bi tevî dengên alfabeke tirkî, heta niha di devokên Tirkiyê de 133 deng (48 dengdêr, 85 dengdar) hatine tesbîtkirin³¹ ku ji van dengan hinek; bi dengê lê bi çend nîşanan, hinek; bi çend dengan lê bi heman nîşanê hatine nîşankirin.³²

Ji ber vê jî di vê xebata xwe de digel dengên heyî yê alfabeke kurdî, dengên bê tîp û dengên xasî Devera Filistanê me diyar kirin û fikr û tesbîtên xwe me deranîn.

2.3.2. Dengên Kurdî

Di alfabeke kurdî de wekî tê zanîn 31 tîp hene. Ji van 8 tîp dengdêr û 23 tîp jî dengdar in.

²⁸ Bedirxan, Celadet & Lescot, Roger, *Kürtçe Dilgisi(Kurmanci)*, ç. 5. Weşanên Doz, Stenbol 2011.

²⁹ Kurdo, Qanatê, *Rêzimana Kurdî*, weşanên Nûbihar, Stenbol 2013.

³⁰ Amedî, Sadiq Bahaeddîn, *Rêzimana Kurdî, Kurmanciya Jêrî û Jorî ya Hevberkirî*, weşanxana Dîwan, Stenbol 2012.

³¹ Demiray, Erdiç, *Ağız Araştırmalarında Transkripsiyon İşaretlerinin Kullanılması Sorunu*, Turkish Studies, 2008, r. 203.

³² b.n., r. 209.

Alfabeya kurdî alfabeyeke ne fonetîk e lewre ji bo her dengêkê tîpek nehatiye danîn. Ji bilî 31 tîpên alfabeyê hin deng hene ku di alfabeya erebî de beramberî wan tîp hene lê di alfabeya latînî de tunene. Dîsa hin deng jî hene ku di herdu alfabeyan de jî wekî tîp nehatine nîşankirin. Di alfabeya latînî de dengên bêtîp ên sereke gava ku tên bikaranîn ji girêdana peyvan û tevayiya hevokê tên fêmkirin. Hin ji van xasî kurdî ne hin jî ji zimanên biyanî ketine nava kurdî. Tîpên kurdî yên di kurmancî de wekî deng hene lê di alfabeyê de nehatine nîşankirin ev in:

1. Dengdêrên eynî (ع) yên ji dengdêrên “a, e, i, î,” çêdibin. Li hin deveran tîpên ‘u’ û ‘o’ jî bi dengê eynê ve tên bikaranîn û peyvên bi wan jî tên dîtin. Mînak: “ ‘orîn, ‘urf û ww.
2. Dengdarên ne hilmî yên “p, ç, t, k”, dengdara “r” ya lertzok, dengdara “l” ya bişid, dengdarên qirikî “ğ”(غ) û “h”(ح).

Dema em li alfabeya fonetîk a navneteweyî IPA’yê dinêrin em dibînin ku ew alfabe hem dengên tîpên alfabeya latînî dihewînin hem jî dengên ku di alfabeyê de wekî tîp nehatine nîşankirin têde cî digirin. (bnr. Pêvek: 1) Lê ev alfabe ji bo bikaranîna alfabeya dangan a kurdî vê gavê ne li cî ye. Lewre divê pêşî dengên hemî deverên kurdî bîn diyarkirin, li ser alfabeyeke dangan niqaş û xebat bîn kirin, heta ji teknolojiyên dengnasiyê bê îstîfadekirin, dûre li ser alfabeyê biryar bê dayîn. Dîsa Kurdish Academy jî alfabeya yekgirtû ya bi hersê alfabeyên kurdî; -erebî, latînî, kîrîlî- diyar kiriye û têde kurmancî-soranî, berawerdkirî, hemî dengên sereke yên kurdî cî digire. (bnr. Pêvek: 2) Ev alfabe jî bi kêşe ye. Nimûne, dengên nehilmî yên tîpên “p, t, k” wekî; “ ph, th, kh” bi kar aniyê û “ç”ya nehilmî jî têde cî nagre. Hal ev ku dengên hilmî “p, ç, t, k” dirêj in û gava ji devê mirov dertên mirov bi dengê “h”yê dihese.³³

Di kurdî de ji bo bikaranîna dengên bêtîp danîna nîşanan an jî diyarkirina tîpan kêşeyek e ku hê jî hin nivîskar an jî weşan li gorî xwe van dangan bi tîpan diyar dikin an jî li ser hin tîpan nîşanan zêde dikin û wisa diyar dikin. Bikaranîna dengên bêtîp de; dengdêr, piranî bi nîşaneyê “ ‘ ” dengdar jî, bi duxal, dabir, xêz an jî nîşaneyekê din hatiye kirin. Di berhema xwe ya Rêzimana Kurdî de Qanatê Kurdo di

³³ Tan, *h. b.*, r. 40.

derbarê mijarê de hin agahiyan dide û bixwe jî ji bo dengên bêtip nîşanên wekî “ ‘ ” û “ ’ ” bi kar tîne.³⁴

Dîsa ji bo dengên nehilmî yên “p, ç, t, k” û “l”ya bişid û “r”ya stûr jî gelek niqaş hatine kirin û di weşanên cuda cuda de li ser van dengên nîşane hatine danîn. Wekî mînak di kovara Hêvî de ev mijar ji bo “p, ç, t, k” û dengên “r”ya stûr û “l”ya bişid nîqaş hatiye kirin.³⁵ Di heman berheme de dengên “p, ç, t, k” bi nîşana “ ‘ ’ ” wekî “p’, ç’, t’, k’ ” tên nîşankirin û ji bo “r”ya stûr jî tu nîşan nehatiye danîn. Dîsa di berhema navborî de wekî biryar, sedema bikarneanîna pênc dengdarên navborî³⁶ yek bi yek tên diyarkirin. Li aliyekî din Qanatê Kurdo di berhema xwe ya Rêzimana Kurdî de berevajî nîşankirina Kovara Hêvî dike, “p, ç, t, k” wekî yên nehilmî û “p’, ç’, t’, k’ ” jî wekî yên hilmî diyar dike.³⁷

Ji bilî van dengdarên navborî herdu dengdarên qirikî û zimanokî (غ) û (ح) jî hin nîşan cuda hatine bikaranîn. Wekî mînak; Celadet Bedirxan ji bo tîpa (غ) tîpa x û ji bo tîpa (ح) jî tîpa h bi kar anîye³⁸ lê paşê wî ew terikandiye û di şiklê dawî ya alfabe ya kurdî de cî nedaye van herdu tîpan.

Ji bilî van çend mînakên navborî, xebatên din jî hene ku tevî nîqaşên ser dengsazî û tîpsaziya kurdî bûne. Di vê xebata xwe ya ser Devoka Filistanê de me jî di nîşankirina hinek dengên de da ser şopa pêşiyar, di hinekan de jî tesbît û nîşankirina xwe dan pêş. Û dengên ku di alfabe de nînin me wiha nîşan kirin:

Dengdêrên bi dengê eynê(ع) çêdibin me dabir “ ‘ ” dan rexê wan ê çepê. Dengê “e”ya bieyn jî, ya wekî cotdengdêr jî me dabir “ ’ ” da rexê wê yê rastê. Dengdarên ku di alfabe de tunene jî me wiha nîşan kirin: “Ç ya nehilmî wekî ç, p ya nehilmî wekî p, k ya nehilmî wekî k, t ya nehilmî wekî t, dengdara (غ) wekî g û dengdara (ح) jî wekî h” me nîşan kirin. Dîsa me r ya stûr wekî r nîşan kir û ji bo ku li deverê l ya bişid gelekî kêmtê dîtin me jêre tu nîşan daneynîn lê dema ciyên derbas dibûn me ew cot bi kar anîn û bi wî awayî me dengên xwe diyar kirin.

³⁴Kurdo, h.b., r. 43-46.

³⁵ Kovara Hêvî, *Ziman*, hejmar: 1, Parîs, Îlon 1983, r. 10-16.

³⁶ Di kovarê de wekî biryar, “l”ya bişid wekî dengê hevpar ê kurmançî û soranî nayê dîtin.

³⁷ Kurdo, h.b. r. 39-39.

³⁸ Bedirxan & Lescot, h.b., r. 18.

Ji bilî van dengên ku me li jor behs kirin li deverê bi qasî ku me tesbît kir dengê *n* ya stûr jî heye ku dengdareke pêşarîkî û difnî ye. Me ev deng jî wekî **n** di metnên xwe de diyar kir.

2.3.2.a.Dengdêr

Dengên ku gava derdikevin rastî tu astengiyê nayên û bi serê xwe xwedî dengê ne wekî dengdêr tên navandin. Di alfabeya kurmancî de 8 dengdêr hene. Ji van “a, ê, î, o, û” yên dirêj “e, i, u” jî yên kurt in. Herwiha ji dengdêran “a, e” nizm “î, ê, o, u, û” jî dengdêrên bilind in. Em dengdêrên kurdî li gorî cîderkên wan dikarin wiha nîşan bikin:

1. Dengdêrên pêşderkî : î, e, ê
2. Dengdêrên navderkî : i, u
3. Dengdêrên paşderkî : a, o, u

Li gorî vebûna dêv:

1. Nîvgirtî : î, ê, o, u, û
2. Vekirî : a, e,

Li gorî şiklê lêvan:

1. Rast : a, e, ê, i, î
2. Gilover : o, u, û

Em dikarin van dengdaran li gorî taybetiyên navborî wiha li ser tabloyê nîşan bidin:

DENG DÊR		LI GORÎ CÎDERKÊ DENG DÊR					
		Dengdêrên Pêşderkî		Dengdêrên Navderkî		Dengdêrên Paşderkî	
Li Gorî Vebûna Dêv		Nîvgirtî	Vekirî	Nîvgirtî	Vekirî	Nîvgirtî	Vekirî
Li Gor Şiklê Lêvan	Rast	î, ê	e	i			a
	Gilover			u		o, û	

1. Dengdêrên Kurmancî yên Sereke

2.3.2.b.Dengdar

Dengên bi alîkariya dengdêran dertên û bi serê xwe bilêvkirina wan zor in wekî dengdar tên zanîn. Di kurmancî de 23 dengdar hene. Em wan li gorî cîderkên wan dikarin wiha nîşan bikin:

1. Dengdarên lêvkî : b, p, m, w
2. Dengdarên diranlêvkî : f, v
3. Dengdarên diranî : s, z, d, t, n
4. Dengdarên pêşarîkî : ş, j, ç, ç, r, l, y
5. Dengdarên arîkî û qirikî : g, k
6. Dengdarên qirikî : q, x, h,

Dîsa li gorî şeweyê derketina wan, em wan dikarin wiha nîşan bidin:

- b : cotlêvkî, girtiya nerm
- c : pêşderkî, girtiya nerm
- ç : hilmî, girtiya hişk
- d : girtiya nerm
- f : fîzeka hişk
- g : giriya nerm
- h : paşderkî, nîvdengdêr
- j : fîzeka nerm
- k : hilmî, girtiya hişk
- l : rexkî
- m : cotlêvkî, difnî
- n : pêşderkî, difnî
- p : hilmî, girtiya hişk
- q : girtiya hişk
- r : lerzokî
- s : pêşderkî, fîzeka hişk
- ş : fîzeka hişk
- t : hilmî, girtiya hişk
- v : fîzeka nerm

- w : nîvdengdêr
 x : domdara hişk
 y : pêşderkî, nîvdengdêr
 z : fîzeka nerm

Niha jî em van dengan li ser tabloyê li gorî cîderkên wan û şeweya derketina wan nîşan bidin:

DENG DAR		LI GORÎ CÎDERKÊ DENG DAR					
		Lêvkî	Diranlêvkî	Diranî	Pêşarîkî	Arîkî, qirikî	Qirikî
LI GORÎ ŞEWÛYÊ DERKETINÊ DENG DAR	Fîzeka hişk		f	s	ş		
	Fîzeka nerm		v	z	j		q
	Lerzokî				r		
	Girtiya nerm	b		d	c	g	
	Girtiya hişk	p			ç	k	
	Rexkî				l		
	Difinî	m		n			
	Domdara hişk						x
	Nîvdengdêr	w			y		h

2. Dengdarên Kurmancî yê Sereke

3.BEŞA SÊYEM

3.1.DENGSAZIYA DEVERÊ

3.2.a.Dengdêr

Li Devera Filistanê ji bilî van heşt dengdêrên (a,e,ê,i,î,o,u,û) zimanê nivîskî ev dengdêr jî tên bikaranîn: ‘a, ‘e, e’, ‘i, ‘î, ‘u. Ji bilî dengê *e*’ dengê din piranî di bêjeyên esilerebî de tên dîtin. Hin bêje jî yan bi veguhestina hin tîpan dengê eynê girtine, mînak; “hişk > ‘işk” yan jî dengên olandar in, mînak; “ ‘intîn, ‘ewtîn” .

Dengdêra ‘a

Dengê ‘a’ yê eynî ye. Di serê bêjeyê de piranî di peyvên esilerebî de tê dîtin. Di nav bêjeyê de jî ev deng di deverê de tê bikaranîn. ti‘ala 1d/32, ‘alem 1d/42, ‘ancûz 1e/69, ‘aciz 10c/4, men‘a 12a/39, Qur‘an 13e/1, ‘adet 16c/21

Dengdêra ‘e

Dengê ‘e’ yê eynî ye. Ev deng jî zêdetir di bêjeyên esilerebî de tê dîtin, çendî piranî di serê bêjeyan de bê dîtin jî di nav bêjeyan de jî tê dîtin. ‘eynî 1b/32, ‘ereba 1d/14, ‘ef 1d/42, bi‘ecîm 1e/83, ‘eware 2b/7, si‘eţ 4a/4, ‘eşîr 8b/4, ‘Evdilê 8c/15, ‘esrê 13a/4, ‘eba 16d/13

Dengdêra e’

Ev deng ji dengên ‘e’ya normal û ‘e’ya eynî pêk tê. Wekî pevdengekê dikare bê dîtin. Bi serê xwe xwendina wê zor e lê di nav bêjeyê de tê xwendin. Dema tê xwendin pêşîye dengê *e* dertê paşê jî dengê *e* dertê. Ev deng di deverê de berbelav e û di gelek peyvên de tê bikaranîn. Di hemî zarave û herêmên kurdî de tune lê dema em bêjeyan didin ber hev tê dîtin ku yan di hin devokan de ketiye yan jî bi nîvdengdêr “h”yê re têkildar e. re’î 1b/46, pé’n1c/8, çe’v 1d/17, ne’l 1d/24, me’sî 1d/47, be’r 1e/15, te’jî 3b/10, dipe’ţ 5a/3, de’nû 9b/13, de’waţê 10a/1, de’wê 12a/45, ze’v 14c/9

Dengdêra ‘i

Dengê ‘i’ya eynî ye û wekî dengdarên din ên eynî ew jî qirikî ye lê di qirikê de ji yên din jêrtir e. Hinek bêjeyên bi vî dengî tên bikaranîn erebî ne hinekên wan jî

bi ketina dengdara “h” yê re vediguhêzin vî dengî. ‘int ‘int 1e/56, ‘işk 1e/93, ‘işaret 8b/2, ‘Izedîn 12b/45

Dengdêra ‘î

Dengê ‘î’ yê eynî ye. Bikaranîna wê kême. Piranî di serê bêjeyan de tê dîtin. ‘îyar 1b/42, Se‘îd 16c/11, ‘Îskî 8a/42

Dengdêra ‘u

Dengê ‘u’ yê eynî ye. Kême tê dîtin. Piranî di serê bêjeyan de tê dîtin. ‘urf 8b/4

Dengdêrên deverê wekî ku tê dîtin dengdêrên kurmancî yê bi dengdara eyn(ع) a erebî ve tîn bikaranîn in. Ji bilî van dengan, dengê (ع) dîsa dikare were ba ‘o’ yê û pêre bê bikaranîn lê gelekî kême tê dîtin.

Niha em dengdêrên ku li deverê tîn bikaranîn di tabloyê de nîşan bidin.

DENG DÊR		LI GORÎ CÎDERKÊ DENG DÊR					
		Dengdêrên Pêşderkî		Dengdêrên Navderkî		Dengdêrên Paşderkî	
Li Gorî Vebûna Dêv		Nîvgirtî	Vekirî	Nîvgirtî	Vekirî	Nîvgirtî	Vekirî
Li Gor Şiklê Lêvan	Rast	î, ê	e	i		‘î, ‘i	a, ‘a, ‘e, e’
	Gilover			u		o, û, ‘u	

3. Tabloya Dengdarên Deverê

3.2.a.1. Guherîna Dengdêran

Guherîna î > y

Di devoka deverê de di dema kewyana kêteyan de dengê ‘î’ vediguheze nîvdengdêr ‘y’ yê. Deyja 1b/14, ayja 1g/37, Ayla 3b/1, meyja 5a/5

Guherîna û > î

Zêdetir di demên borî de veguhestina ‘û’ yê li ser ‘î’ yê ye. stîyê 1d/49, bîye 8a/3, rabîye 8a/15, bîya 12b/43

Guherîna û > w

Dengê ‘û’ wekî gihaneka ‘û’ di deverê de tune. Dema ku du bêje tèn rêzkirin an bê gihanek in an jî gihaneka ‘û’ vediguhêze dengdêra ‘u’ yê (mînak: jin u mêr 8b/13) yan jî nîvdengdêr ‘w’ yê. me w Xoinasê 3b/5, Me’rxura w Laçekîya 8a/18, me w zarê mala Hiseyn Paşa 8a/71, sîce w zarûk 16a/10

Guherîna ê > î

Veguhestina dengê ‘ê’ bi ‘î’ yê re di zimanê standart de jixwe tê dîtin. Mînak: dêya/diya, rêya/riya, pêya/piya. Lê li deverê di hin bêjeyan de piranî dengê ‘î’ tê bihîstin. pîya 9a/7, jîhatye 11a/5, rîya 12a/30, dîya 12b/43

Guherîna e > i

Ev guherîn piranî di jimarên sed û qatên wî de tê dîtin. hizkî 1b/34, dusid 1d/2, çarsid 7b/3, sêsid 12a/39

Guherîna u > i

Ev deng di hin bêjeyan de bi herdu bikaranînan jî heye. Wekî mînak: dusud/dusid, şesud/şesid, lubek/libek, gurover/girover, hundur/hundir/hindir û ww. Lê di hin bêjeyan de baş diyar dibe ku dengdêra ‘u’ vediguhêze dengdêra ‘î’ yê, xweser jî di kêteya yekem de meyl ji dengê ‘u’ ber bi ‘î’ yê ye. tine 1e/22, muhib 1e/84, dinya 1g/34, misade 8b/2, şikir 12c/4

Di bêjeyên erebî de dengdêra “u” ya kêteya pêşîn vediguheze “î” yê. Ji ber tunebûna “waw” ê di kêteya yekemîn de ye³⁹ ku di zimanê standart de jî tê dîtin.

³⁹ Zêrevan, Arif, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (Kirmancî)*, weşanên Nefel, Stockholm, 1997.

3.2.a.2.Ketina Dengdêran

Di devoka deverê de ketina dengdêran pir tê dîtin. Ji dengdêran “î” ku em dikarin bêjin dengdêra herî zêde dikeve, ew e. Ji bilî wê dengdêrên “î”, “ê”, “û” jî dikevin. Em ê ketina dengdêran li gorî kêteyên wan wiha nîşan bidin:

- Di kêteya serî de dema ku kêteya duwem bi dengdêrê dest pê dike; banyana 1d/16, bavîtana 1f/15, danî 2a/2, dajoşin 3a/2, dalandin 16a/25
- Di kêteya navîn de ketina dengdêran gelekî tê dîtin. Piranî dengdêra ‘î’, ya ‘î’ û dengdêra ‘û’ dikevin. kûçkê 1a/1, dibjarî 1a/6, bimra 1b/3, dikşîne 1e/18, didrût 2a/2, digrin 3b/5, mervek 6a/5, çêdkir 7a/8, gotye 8a/19, radbûn 11b/10, hebya 13c/4, heçya 16d/20
- Di kêteya dawî de ketina dengdêran, piranî dengê ‘ê’ û dengê ‘î’ dikevin. diday 1b/36, çûy 1e/76, nay 1g/8, boy 1g/10, dileyst 8b/15, nayn 15c/6

3.2.b.Dengdar

Di devoka deverê de ji bilî dengdarên zimanê nivîskî ev dengdar hene: “ç, g, h, k, n, p, r, t.”

Em dengdarên deverê li gorî cîderkên wan dikarin wiha bidin nasîn:

1. Dengdarên lêvkî : b, p, p, m, w
2. Dengdarên diranlêvkî : f, v
3. Dengdarên diranî : s, z, d, t, t, n, n
4. Dengdarên pêşarîkî : ş, j, c, ç, ç, r, r, l, y
5. Dengdarên arîkî û qirikî : g, k, k
6. Dengdarên qirikî : g, h, q, x, h,

Dîsa li gorî şeweyê derketina wan em hemî dengdarên deverê dikarin wiha nîşan bidin:

- b : cotlêvkî, girtiya nerm
- c : pêşderkî, girtiya nerm
- ç : hilmî, girtiya hişk
- ç : nehilmî, girtiya hişk
- d : girtiya nerm

f : fîzeka hişk
 g : giriya nerm
 ğ : paşderkî, girtiya nerm
 h : paşderkî, nîvdengdêr
 ħ : paşderkî, fîzeka nerm
 j : fîzeka nerm
 k : himî, girtiya hişk
 k̂ : nehilmî, girtiya hişk
 l : rexkî
 m : cotlêvkî, difnî
 n : pêşderkî, difnî
 ñ : pêşderkî, difnî
 p : cotlêvkî, hilmî, girtiya hişk
 p̂ : cotlêvkî, nehilmî, girtiya hişk
 q : girtiya hişk
 r : lertzokî
 r̂ : lertzokî, stûr
 s : pêşderkî, fîzeka hişk
 ş : fîzeka hişk
 t : hilmî, girtiya hişk
 t̂ : nehilmî, girtiya hişk
 v : fîzeka nerm
 w : nîvdengdêr
 x : domdara hişk
 y : pêşderkî, nîvdengdêr
 z : fîzeka nerm

Niha jî em dengdarên deverê li gorî ku di metnan de derbas bûne bi mînanan nîşan bidin.

Dengdara ç

Dengdara nerm, nehilmî, kurt û arîkî ye. Li deverê di gelek bêjeyan de tê dîtin. çîrok 1a/17, piçûk 1e/4, nêçîrvan 3b/1, avrênç 4a/5, koçerî 6b/6, qîç 7a/9, qûçê 8a/47, dipêçand 9b/5, çiya 12a/34, çe`v 12b/3, kuçîk 13c/1, çe`l 15a/12, çirik 15c/5, Çîçê 16b/29

Dengdara ğ

Dengdara qirikî û zimanokî ye. Di devoka deverê de kê m tê dîtin. Ogir 1e/102, Çelîbağ 8a/14, ağa 8a/70, Miğarê 12a/1, zegîre 12a/26, egleb 14b/2

Dengdara h

Ev dengê qirikî jî zêdetir di bêjeyên esilerebî de tê dîtin. heywan 1b/1, heft 1e/30, hemû 3a/16, heşa 7b/6, hal 8c/2, hev 12b/4, heşa 12c/2, hine 12c/14, heyata 14a/3, rihet 15a/6, heçya 16d/20

Dengdara k

Dengdara nerm, nehilmî, kurt û arîkî ye. Di devoka deverê de berbelav e. kevîr 1a/1, kirîkî 1c/11, kîlçîk 1h/24, ka 2a/3, şîşîkêkî 3c/1, dikir 4b/4, Yekî 5b/2, hindîk 6a/7, kevn 7a/17, kanîk 8a/65, kulav 9b/1, ewk 12a/28, kuçîk 13c/1, sakîna 15c/9, kulîlka 16a/23

Dengdara p

Dengê nerm, nehilmî, kurt û lêvkî ye. Di devoka deverê de pir tê dîtin. Parzûn 1b/28, kapa 1h/23, piştî 3a/11, pûng 4a/2, pênc 6b/8, sîpênc 7b/4, peya 10a/4, panzde 10b/8, parava 12c/7, pê 13b/11, penêr 13f/3, tapan 14c/6, tirpan 15c/1, dipîvan 15a/9, Papê 16b/29

Dengdara r

Ev dengê arîkî û lertzokî, ji “r”ya normal stûrtir e û li deverê di gelek bêjeyan de tê dîtin. radixist 1a/5, avrênç 1b/46, reqreqanî 1e/117, zarek 3a/6, dirist 4b/4, roj 5a/2, rişta 5b/1, reş 7a/4, kavir 10a/14, kurê 12a/13, Ber 12b/30, cure 13b/11, Rûn 14b/6, serad 15a/8, kirik 16c/19

Dengdara n̂

Ev deng ji “n”ya normal stûrtir e, pêşarîkî û difnî ye. Li deverê di hin bêjeyan de tê dîtin. Ne di hemî bêjeyan de lê di hin bêjeyan de bandora dengên “i”, “t̂”, “p̂” li ser vî dengî tê dîtin. re’n 1b/46, binî 1d/34, t̂nin 1e/50, koçana 3a/4, genim 5a/8, nok 7a/22, rûniştine 8a/10, de’nû 9b/13, dixistne 10d/5, penêr 12a/26, tañin 13a/1, rûn 15b/6, boña 16a/3

Dengdara t̂

Dengê nerm, nehilmî, kurt û arîkî ye. Di devoka deverê de berbelav e. tañi 1a/19, Tûredew 1b/46, xet 2a/1, koçan 3a/4, toxafk 4a/7, t̂r 5b/1, bîst 6c/4, dañanî 7a/2, Tîrşîk 8a/9, sertêdan 8b/8, jêhañi 10c/6, Heça 12b/31, derdxist 13a/11, toraq 14b/7, zivistanê 15b/7, pirtîk 16a/23

Niha em dengdarên ku li deverê tên bikaranîn li ser tabloyê nîşan bidin.

DENG DAR		LI GORÎ CÎDERKÊ DENG DAR					
		Lêvkî	Diranlêvkî	Diranî	Pêşarîkî	Arîkî, qirikî	Qirikî
LI GORÎ ŞEWYÊ DERKETINÊ DENG DAR	Fîzeka hişk		f	s	ş		
	Fîzeka nerm		v	z	j		h
	Lerzokî				r, r̂		
	Girtiya nerm	b		d	c	g	ğ
	Girtiya hişk	p, p̂		t, t̂	ç, ç̂	k, k̂	q
	Rexkî				l		
	Difinî	m		n, n̂			
	Domdara hişk						x
	Nîvdengdêr	w			y		h

4. Tabloya Dengdarên Deverê

3.2.b.1.Guherîna Dengdaran

Guherîna b > v

Li deverê dengdara lêvkî “b” di hin bêjeyan de vediguhêze dengdara diranlêvkî “v”yê. divê 1b/19, navêje 1g/26, hev 3b/1, ‘Evdilmecîd 8a/23, nevîne 8a/53, seva 12a/26, şeva spî 12b/29

Guherîna d > c

Li deverê kê m tê dîtin. Cîya wan 1e/8

Guherîna d > t

Guherîna dengdara “d” bi “t”yê re, li deverê; wekî zimanê standart, di hin lêkeran de tê dîtin, herwiha di dema ketina dengdêra “i” de jî ev veguheztin pêk tê. tê 1e/64, çêtîkirin 1h/1, tanî 5a/1, dernetket 10d/8

Guherîna f > v

Ev herdu dengdarên diranlêvkî; di deverê de, piranî “f” vediguhêze “v”yê lê di hin bêjeyan de berevajî dibe, wekî mînak; merif, diruf... ze’v 1g/5, sîhevî 7b/5, kivşe 8b/26

Guherîna h > h

Ev guherîn di hevgirtina bêjeyan de tê dîtin ku piranî bêjeya “her” dema tê serê bêjeyekê pêk tê. herêkî 1e/23, herro 12a/13, hergav 12a/37, hersal 12a/47

Guherîna j > ş

Ev guherîn di hin bêjeyên deverê de tê dîtin, di hin rewşan de jî di hevgirtina bêjeyan û kewyana kêteyan de tê dîtin. şîtera 1e/39, paqîş 1e/137, şuxu 16b/2, qîşka 16d/21

Guherîna n > m

Mînakên vê guherînê kê m in. nêvan 1e/36

Guherîna r > l

Mînakên vê guherînê kê m in. Weldigerandin 1d/30

Guherîna s > z

Ev guherîn di zimanê standart de jî heye.⁴⁰ Di devoka deverê de mînakên vê guherînê pir in. Xilaz 1a/26, dezmeş 1e/53, nazkî 1e/109, dezmal 2b/5, derbaz 15b/3

Guherîna y > w

þewa 1e/142

Ev guherîn kême tê dîtin lê berevajî vê guherînê jî tê dîtin. Mînak: sîyar.

3.2.b.2. Ketina Dengdaran

Di devoka deverê de ketina dengdaran gelek tê dîtin. Xweser jî di dawiya bêjeyan de ketina dengdaran gelekî berbelav e.

Ketina “d”yê

Di dengê dawiyê de tê dîtin. Kême caran tê dîtin. çen 5a/8, mexse 9b/9, dikelan 13c/4

Ketina “h”yê

Ev dengdar di dawiya hin bêjeyan de dikeve ku di zimanê standart de jî tê dîtin.⁴¹ Herwiha li deverê ji jimarên di navbera 10 û 20'an de jî ev deng dikeve. şe 1e/13, þanzde 9a/9, dezga 12b/6, yanzde 12b/13, þeyjde 16a/16

Ketina “k”yê

Ev deng di pêveka nediyariyê “ek”ê de di hin bêjeyan de dikeve. misîne 1e/9, tişte 1e/44, berbû 10a/13, hine 11c/5, þiçe 13f/2, gele 14a/3

Ketina “n”yê

Li deverê dengdara pêvekên pirjimariyê “ên, an” hema bêje qet nayê bikaranîn, di dema axaftinê de dengdara “n” dikeve û pirjimarî, ji lêkerê yan jî ji bêjeyên pirjimariyê îfade dikin diyar dibê. bîst sala 1b/27, destîkê wan 1c/1, dasa 3a/10, girîyê þenêr 7b/6, Adema 8a/20, hineka 10a/11, cotê berê 11a/6, Van sala 12d/6, qîçkê kulîlka 16a/22

Li aliyekî din “n”ya cînava kesî “min” piranî dikeve. mi 1e/67

⁴⁰ bnr. Bedirxan & Lescot, h.b., r. 36.

⁴¹ bnr. Bedirxan & Lescot, h.b., r. 45.

Ketina “t”yê

Ev dengdar jî di dawiya hin bêjeyan de piranî dikeve. Dîsa wekî zimanê standart ê nivîsê, ji hin lêkeran jî dikeve.⁴² qe 1e/22, go 12a/45, des 13b/2

Ketina “y”yê

Dema bêjeya “yek” bi bêjeya “her” ve tê bikaranîn dengdara “y” dikeve û tîpa serî “h” jî vediguheze “h”yê. Herekî 1e/22

Jixwe di zimanê standart de jî qertafên nediyariyê “-eke, -ekî, -ekê” bi ketina dengdara “y” hatine pê.

Ji bilî van dengdaran dengdêrên wekî; “j, m, r, s, z” gava di dawiya hin bêjeyan de bin, dikevin ku heryek di bêjeyek duduyan de tenê tê dîtin lewma em ê bi rêzê wan wiha nîşan bidin: “j” ro 1d/27, “m” ce 1d/25, “r” se 5a/7, “s” çiqe 14b/5, “z” e 8c/10

Wekî ku ji mînakan jî diyar dibe ev dengdar piranî ji bêjeyên yekîte dikevin.

3.2.b.3.Di dengdaran de Cotbûn

Di devoka deverê de cotbûna dengdaran bi sê awayan tê dîtin.

- Dema ku dengdêra “i” dikeve, herdu dengdêrên rast û çepê digihêjin hev. lêddan, 1h/31, berdday 3a/8, hildda 3a/17, neddît 8b/20, daddim 13d/1
- Dema ku dangdarek bişid tê xwendin. temmîz 1b/10, miccit 1b/10, wellehî 1e/85, îllakim 1g/1, hemmû 1d/11, millet 14c/4, Temmam 16b/18
- Ji ber kewyana kêteyan dengdar cot dibin. herro 12a/13, serra 12a/41, hevva 12c/7

3.3.Di Kîteyan de Rûdanên Dengan

Di devoka deverê de hevgirtina bêjeyan û kêteyan, ketin û kewyana kêteyan, racivîn berçav tînin. Dema em li hin bêjeyan dinêrin em dibînin ku bi ketina hin dengan bêjê hev digrin.

⁴² bnr. Bedirxan & Lescot, h.b., r. 35.

3.3.1. Dariştina Kîteyan

Kîteya “da”

Di devoka deverê de kîteya “da” tê dawiya hin bêjeyan. Ev kîte ji paşdaçek “da”yê cudatir e. wî da 1g/25, davîtê da 4a/3, davîtnê da 6a/1, ‘erdê da 13a/1, aş da 14a/1

Kîteyên “ka, kan, kî”

Kîteya “ka” tê dawiya bêjeyên wekî; “hêdî, zû, qestî, xwezî, hemû û êd. ” Kîteya “kan” piranî tê dawiya bêjeyên “herdu û hersê”yan, dema ku tê carna dengdara “n” carna jî kîteya “an” dikevin. hersêka 1e/10, hemûşka 1e/140

Dîsa kîteya “kî” tê dawiya hin bêjeyên ku ew bêje bi ketina hin kîteyan guherîne û kîteya “kî” bi wan bêjeyên nû çêdike. hakî 1g/38, çakî 1h/5, sakî 12b/26

3.3.2. Ketina Kîteyan

Li deverê ji ber ketina kîteyan di bêjeyan de kurtbûn pêk tê. Di hin bêjeyan de serî de, di hinekan de di navê de û di hin bêjeyan de jî di dawiyê de kîte dikevin û bêje kurt dibûn.

Di serî de; sa < wisa 1a/13, zanî < dizanî 1b/2

Di navê de; bine < bidine 1e/17, bisenim < bisekinim 1e/54, tême < têxime 1e/66, nane < nadine 1e/130, cake < careke 3b/9, kene < ketine 7a/11, digon < digotin 15a/3

Di devoka deverê de di hin bêjeyan de dema pêveka “-ek” tê dawiya bêjeyeke ku bi dengdêrê qediyaye, dengdêra “e” dikeve û di bêjeyê de kurtbûn pêk tê. Li hin herêmên din de dengdêra “e” bi tevî tîpa alîkar “y” bi bêjeyê ve digre.⁴³ alîkî 1b/52, 1e/6, cîkî, Paşak 1g/1, kanîk 8b/65

Dîsa di ravekan de heke raveber an jî raveker bi dengdêrên “e, a” ve biqede dema dengdêrê digre, dengdêrên “e, a” dikevin. Ev rewş di ravekên deverê de berbelav e. ‘ereba ga 1d/43, birê wî 1e/98, xalîçê giran 16a/15

Di dawiyê de; ça < çawa/çakî, 16b/25, ha < hakî 9b/4, he < heye 1h/9

⁴³ Kurdo, *h.b.* r. 51.

3.3.3.Kewyana Kîteyan

Di devokê de hin bêje ji ber ketina hin kîteyan û hevgirtina hin kîte û bêjeyan têne pê ku em ê di qismê servekirinê de cardin cî bidin hin mînanan. deyja < de îja 1d/1, çabkin < çakî bikin 1e/48, hemasa < hema wisa 3b/2, Ayja < a îja 6a/1, medgo < me digo 7b/9, anha < a niha 8a/2, edbêm < ez dibêm 12c/4, Êştera < ê ji te ra 16c/12

Wekî ji mînanan jî diyar dibe ji ber ketina kîteya bêjeya duwem û servkirina wê bêjeya yekem re, bêje yan jî kîte digihêjin hev û dikewin. Ji bo ketin, kurtbûn û kewyana kîte yan jî bêjeyan em dikarin çend mînakên wiha bidin ku ji bo meyla axaftinê dikare fikrekê bide:

Ez ji te ra dibêjim > Ezj tera dibêm > Ej tera dibêm > Eştera dibêm
Nizanim ji ku > Nizam ji ku > Niza jku

3.3.4.Racivîn

Di devoka deverê de racivîna kîteyan cuda ye, di hin bêjeyan de awayên dirêj tê bikaranîn, mînak; “guh, duh” di hin bêjeyan de awayê kurt, mînak; “cî, sî”. Di devoka deverê de di hin bêjeyan de racivîna kîteyan wiha tê dîtin:

- Hin kîte vediguhezî dengdêrên dirêj; cî 1g/7, sîpênc 7a/5, tî 8d/7
- Hin kîte jî tenê dengdêrê wan ê kurt dirêj dibin. mîh 7b/3
- Di hin bêjeyan de jî kîteya “eh” vediguheze dengdêra e'. ze'f 1b/1, çe've 1e/96, dipe't 5a/3, me'r 16b/3

3.4.Biservekirin

Li deverê di gelek bêjeyan de tê dîtin. Bi çend awayan tê dîtin. Li deverê di axaftinê de berbelav e. Di hin mînanan de dengdêrên dawî yên daçek, cînav an jî gihanekan dikevin û dengdar bi bêjeya yekem ve dizeliqe. çij < çî ji 1g/14, çib < çî bi 1g/21, mel < me li 4b/1, yêk < yê ku 4b/10, Mej < me ji 7a/15, meb < me bi 8a/29, El < ez li 10a/7

Wekî ji mînanan jî diyar dibe bêje piranî kîteyên dutîp in. Dîsa bêjeya serî dikare wekî xwe bimîne û bêjeya duwem bigre. Ev piranî hevgirtina cînavên kesî û paşdaçekan de tê dîtin. xura 1a/11, meda 1h/7, me'a 8a/5, te'a 13a/4, jê'a 15a/7

Dîsa dema cînava min bi paşdaçekê ve tê bikaranîn dengdara “n” dikeve û paşdaçek diçe ser cînavê. Mîra 16a/19

Li aliyekî din li deverê paşdaçekên “de, re, ve” wekî; “da, ra, va” tèn bilêvkirin ku hin bêje bi van paşdaçekan ve gihiştine hev û bêjeyên nû çêbûne: “Derva, zûda, kuda, kura, çira, heva, parava û ww”.

Dîsa di ravekê de dema hin cînav wek raveker in dengdara serî bi raveberê ve dizeliqe. tacêx < tacê xu 1g/42, bûkam < buka min 5a/9, tayêw < tayê wî 7a/6, dênax < dêna xu 12a/17, rîsêw < rîsê wî 12b/38, dilêm < dilê min 12b/47, Bavêm < bavê min 15b/4

Di hin mînakên de jî dengdêra qertafa ravekê ya diyar an jî qertafa dema bê dikeve û dengdar bi nav an jî cînavê ve dizeliqe. xuy < xu yê 1h/18, Faţêy < Faţê yê 12b/42, teş < te yê 12b/43, mey < me yê 16c/8

3.5.Di Ravek û Tewanga Navan de Rûdanên Dengan

Di devoka deverê de qertafên ravekê û yên tewangê digel hin cudatiyan, piranî wekî zimanê standart in. Em ê jêrê ser van cudatiyan bi kurtasî bisekinin.

3.5.1.Di Ravekê de

a) Qertafên ravekê yên diyar

-a: Raveber wekî zimanê standart e. xalîya hêşîn 1b/7, qîza gavan 1g/1, nexaşya hal 8c/2

Eger qertaf di şûna cînavê de be tu demî dengdara ‘y’ nakeve, herdem wekî “ya” tê bikaranîn. ya Enqerê 12b/12

-ê: Raveber wekî zimanê standart e. sirsûmê herî 1b/50, rûnê helandî 1c/1, kirîbê zarê min 8c/11, welaţê jêrê 12a/6

Eger qertaf di şûna cînavê de be tu demî dengdara ‘y’ nakeve, herdem wekî “yê” tê bikaranîn. yê kê 1d/2

Di raveka navî de raveker di dawiya bêjeyê de qertafa tewangê “î” nagre lê dengdêrên bêjeyê ji “a” yan jî “e”yê vediguhezîna “î”yê, mînak: “şivîn”, yan jî piranî “ê”yê. devê çêm 1e/26, pûrta dêwêr 3c/1, gurzê gîhê 15c/6

-ên: Li deverê dengdara pêvekê, ne di raveberê ne jî di ravekerê de nayê bikaranîn. postê dewara 1d/45, zarê xûşka me 1e/69, malxê mala 1f/1, girîyê peñêr 7b/6, bûkê niha 9a/7

b) Qertafên Ravekê yên Nediya

-eke: Wekî zimanê standart tê bikaranîn. pezeke me 1b/32, dezmaleke sor 2b/5, maleke dostekî min 8c/11

-ekî: Wekî zimanê standart tê bikaranîn. merivekî navpeketî 8a/24, qîza cînarekî me 8b/1

-ine: Di devoka deverê de piranî tîpa “i” dikeve û wekî “ne” tê bikaranîn.

3.5.2. Di Raveka Zincîrîn de

Li deverê, raveka zincîrîn ji kurmanciya standart cudatir e. Dema raveber bi hevalnavan ve tê wesfandin qertafa mê û yekjimar “e”, ya nêr û yekjimar “î” û ya pirjimar “ne” ye.⁴⁴

-î: conîkî piçûk î aha 1a/8, kevçiyê min î zêr 1e/139

-e: pîrika min e Neno 12b/31, xûşkeke mele ye rehma 16a/24

-ne: hiriyê mîha ne gevez 16a/19

3.5.3. Di Tewanga Navan de

Di devoka deverê de di rewşa banglêkirinê de tewanga navan wekî zimanê standart e. Tewandina navan jî piranî wekî zimanê standart e lê di qertafan de hin rûdanên dangan hene ku em ê li ser wan bisekinin.

a) Qertafên tewangê yên diya

-ê: Wekî zimanê standart e. Perîşanê dide birê xu 1e/119, Jinikê go 12a/8, Go tê rişta bidî Gurcîyê? 16c/28

-î: ev qertaf li deverê ji bilî çend biwêj an jî gotinên pêşiyar, ku ew jî gelek kêr in, nayê bikaranîn. Di tewanga navên nêr de forma veguhestina navan tê bikaranîn. Dema nav kirde be di hin navan de tê dîtin lê di hinekan de nayê dîtin. Li deverê, di rewşa bireserê de tewandina navan zêdetir tê bikaranîn. Lê em dikarin bêjin ku meyla tewandina navên nêr ber bi rabûnê ve diçe. Pûrta dêwêr 3c/1, Loqman go 12b/8, zavê dixistin 16b/23

⁴⁴ Ji bo ser mijarê zêdetir agahî bnr. Açar, Zafer, “Di Kurmancî de Qertafên ku Ravekê bi Hevalnavan ve Diwesfînin”, Nûpelda, j. 15, r. 9-14.

-an: Di qertafa pirjimarî ya tewangê de tu deman dengdara “n” nayê xwendin. cînara 4a/1, Ez nîkarim bi Adema ra tême şer 8a/4, Jina ‘eba çêdikirin. 16d/13

b) Qertafên tewangê yên nediyar

Di devoka deverê de, di qertafên nediyariyê yên yekjimar de “-ekê, ekî” qertafa nêr a yekjimar “-ekî” zêdetir tê bikaranîn, di gelek bêjeyên mê de- xweser jî bêjeyên ku demê îfade dikin- qertafa “-ekî” tê bikaranîn. Yanî em dikarin bêjin ku di bêjeyên mê de jî meyl ber bi bikaranîna qertafa nêrtiyê “-ekî” ye. salekî 1d/57, xaliçekî 1f/1, mehekî 2a/4, şevêkî 11c/4, rojekî 14c/9

Dîsa di qertafa pirjimar “-inan” de jî dengdara dawî herdem dikeve.

3.6.Di Cotepeyvân de Rûdanên Dengan

Di kurmançî de cureyên cotepeyvân gelek in.⁴⁵ Di devoka deverê de di cotepeyvân de hin rûdanên dengan tên dîtin ku piranî wekî zimanê standart e. Em jî çend heban hin mînakên bidin:

- Di cotepeyvên nêzdeng de dengdara bêjeya duwem piranî dibe “m”. peyn meyn 1b/8, dirûn mirûn 10b/8, nan man 10c/1, cil mil 13c/5
- Di cotepeyvên hevedudanî de dengdêra “o” yan jî “e” dikeve nava herdu bêjeyan û wan bi hev ve girêdide. guşegur 1b/20, xaromaro 1d/3, zarezar 1e/7, xulpexulp 1f/43
- Di cotepeyvên nêzdeng de dengdêra “î” du bêjeyan bi hev ve girêdide. jîr î jêha 16a/18, kir î kîran 16a/18

⁴⁵ Di derbarê cotepeyvân de jî bo zêdetir agahî bnr. Ertekin & Açar, “Di Kurmançî de Cotepeyv û Cureyên Wan”, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, j. 1, r. 82-92.

ENCAM

Me di vê xebata xwe de Devoka Filistanê ji aliyê dengsaziya wê ve da ber xwe û wekhevî û cudatiya wê bi zimanê standart re nîşan da. Me ji gundên deverê bi kal û pîrên deverê yên ser xwe re hevdiştin pêk anîn û ji wan ji şêstî zêdetir qeyd girtin. Ji van qeydan; -çend heb ne têde- me hemî derbasî ser kaxiz kirin û lêkolîna xwe ser dangan û rûdanên dangan kirin. Di serê xebata xwe de me hin tesbît û dîtinên xwe li ser dengsaziya kurmancî pêşkeş kirin. Dûre di qismê duwem de me cî da taybetiyên navçeyê û deverê û hin agahî derbarê wan de me nîşan dan. Di qismê sêyem de jî me ser dengsaziya deverê lêkolîna xwe kir. Me di vê xebata xwe de dengdar û dengdêrên kurmancî li ser tabloyê nîşan dan herwiha me dengdêr û dengdarên deverê jî li ser tabloyan nîşan dan.

Piştî vê lêkolîna xwe em ghiştin van encaman:

1. Li deverê ji bilî 8 dengdêrên zimanê standart 6 dengdêrên din jî hene ku eynî(ع) ne û piranî di bêjeyên esilerebî de tên dîtin.

2. Ji bilî dengdarên alfabeya kurdî ya latînî dengdarên wekî; “ç, ğ, h, k, n, p, r û t” di devoka deverê de tên bikaranîn.

3. Dengdarên “ğ, û h” piranî di bêjeyên biyanî de dertên pêşiya me. Dengdarên “ç, k, p, t” li deverê berbelav tên bikaranîn. Dîsa dengdarên “n û r” li deverê tên bikaranîn.

4. Di devoka deverê de dengdêra “î” di hin bêjeyan de ji ber kewyana kêteyan dibe nîvdengdêr “y”. Li deverê gihaneka “û” nayê dîtin lê dema ku tê bikaranîn dengdêra “û” dibe nîvdengdêr “w”.

5. Dengdêra gilover “û” piranî di lêkerên bi lêkera “bûn”ê çêbûne de vediguhêze “î”yê, dengdêra gilover “u” di bêjeyên esilerebî de vediguhêze dengdêr “î”yê. Dîsa dengdêra nîvgirtî “ê” ji ber bandora “y”yê vediguhêze “î”yê ku di zimanê standart de dibe “i” û dengdêra vekirî “e” di hin bêjeyan de vediguhêze dengdêra nîvgirtî “i”.

6. Di kêteya serî de dema ku kêteya duwem bi dengdêrê dest pê dike, dengdêra “î” dikeve.

7. Di kêteyên navîn de dengdêrên “i”, “î”, “û” piranî dikevin.

8. Di kêteya dawî de dengdêrên “ê” û “î” piranî dikevin.

9. Di dengdaran de guherîna $b > v$, $d > t$, $f > v$, $h > h$, $s > z$, $\text{ş} > j$ li deverê berbelav tê dîtin.

10. Di devoka deverê de ketina dengdaran piranî di kêteya dawî de çêdibe. Dengdarên ku herî zêde ji bêjeyan dikevin; “d, h, k, n, t” ne.

11. Di dengdaran de cotbûn bi sê awayan tê dîtin: Dema ku dengdêra “i” dikeve, herdu dengdarên rast û çepê digihêjin hev, dema ku dangdarek bişid tê xwendin, ji ber kewyana kêteyan dengdar cot dibin.

12. Li deverê ketina kêteyan berbelav e. Hem di serê bêjeyê de hem di nava wê hem jî di dawiya bêjeyê de ketina kêteyan heye.

13. Li deverê kewyana kêteyan gelek tê dîtin. Dema kête yan jî bêje hev digirin, ketin û guherîna dengdêr û dengdaran tê dîtin.

14. Di bêjeyên deverê de di bêjeyan de racivîn tê dîtin. Di hinek bêjeyan de “i” dirêj dibe, dibe “î”, di hinekan de kêteya “eh” vediguheze dengdêra *e* û di hinekan de awayê kurt ê bêjeyan tê dîtin.

15. Li deverê biservekirina bêjeyan berbelav e û bi çend awayan tê dîtin. Di hin mînan de dengdêrên dawî yên daçek, cînav an jî gihanekan dikevin û dengdar bi bêjeya yekem ve dizeliqe.

Dîsa bêjeya serî dikare wekî xwe bimîne û bêjeya duwem bigre. Ev piranî hevgirtina cînavên kesî û paşdaçekan de tê dîtin.

Dîsa di ravekê de dema hin cînav wek raveker in dengdara serî bi raveberê ve dizeliqe.

Di hin mînan de jî dengdêra qertafa ravekê ya diyar an jî qertafa dema bê dikeve û dengdar bi nav an jî cînavê ve dizeliqe.

16. Di ravekê de di tewandina navên nêr de dengdêra dawiya bêjeyê diguhere. Dîsa di ravekê de dengdara qertafa pirjimarî “-ên”ê, “n” herdem dikeve.

17. Di raveka zincîrî de dema raveber bi hevalnavan tê wesfandin qertafên duwem ji bo mê û yekjimar “e”, ji bo nêr û yekjimar “î” û ji bo pirjimarê “ne” ye.

18. Di tewanga navên nêr de meyl rabûna qertafa tewangê ye.

19. Di tewandina navan de, di qertafên tewangê yên nediyar de qertafa navên mê “-ekê” piranî weke ya nêr “-ekî” tê bikaranîn. Yanî em dikarin bêjin di rewşa nediyariyê de, meyl di navên mê de ber bi nêrkirina bêjeyan e.

20. Di cotepeyvyan de rûdanên dengan tê dîtin. Di cotepeyvên nêzdeng de dengdara bêjeya duwem piranî dibe “m”. Di cotepeyvên hevedudanî de dengdêra “o” yan jî “e” dikeve nava herdu bêjeyan û wan bi hev ve girêdide. Di cotepeyvên nêzdeng de dengdêra “î” du bêjeyan bi hev ve girêdide.

ÇAVKANÎ

Açar, Zafer, “Di Kurmancî de Qertafên ku Ravekê bi Hevalnavan ve Diwesfînin”, Kovara Nûpelda, j. 15.

Adilcevaz Bülten, 2013.

“Adrese Dayalı Nüfus Kayıt Sistemi Veri Tabanı”, <http://rapor.tuik.gov.tr>, 03 Sibet 2015.

Aksan, Doğan, *Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, weşanên Türk Dil Kurumu, c. I-II-III, Ankara, 2009.

Aktuğ, Halil, *Gramera Kurdî/Kürtçe Gramer*, weşanên Avesta, Stenbol, 2013.

Amedî, Sadiq Bahaeddîn, *Rêzimana Kurdî, Kurmanciya Jêrî û Jorî ya Hevberkirî*, weşanxana Dîwan, Stenbol 2012.

Aydoğan, İbrahim Seydo, *Guman-1*, weşanên Lîs, Stenbol, 2013.

Badıllı, Kemal, “Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri(Kürmançça Lehçesi)”, Ankara Basım ve Ciltevi, <http://mamosteye-zimane-kurdi.blogspot.com.tr/p/pirtuken-pdf.html>, 10 Sibet 2015.

Baran, Bahoz, *Rêzimana Kurmancî*, weşanên Belkî, Stenbol, 2012.

Bedirxan, Celadet Alî, *Bingehên Gramera Kurdmancî*, weşanên Avesta, Stenbol, 2010.

Bedirxan, Celadet & Lescot, Roger, *Kürtçe Dililgisi(Kurmanci)*, ç. 5. Weşanên Doz, Stenbol 2011.

Bidlîsî, Şerefhan, *Şerefname, Dîroka Kurdistanê*, weşanên Avesta, Stenbol, 2007.

Çakar, M.S. & Işık, F., & Mehmetoğlu, M. & Önen, R. & Sadıkoğlu, E. & Tan, S., *Ortaöğretim Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı*, weşanên Tarih Vakfı, Stenbol, 2010.

Demiray, Erdinç, “Ağız Araştırmalarında Transkripsiyon İşaretlerinin Kullanılması Sorunu”, Turkish Studies, 2008.

Ertekin, M. Zahir & Açar, Zafer, “Di Kurmancî de Cotepeyv û Cureyên Wan”, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, j. 1, 2015.

Espeja, Ricardo Gustavo, *Kurdish Literature*, Rozhin Publication, 2009.

- Farqînî, Zana, *Türkçe - Kürtçe Sözlük*, weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2000.
- Farqînî, Zana, *Ferhenga Kurdî - Tirkî*, weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2004.
- Hassanpour, Amir, *Kürdistanda Milliyetçilik ve Dil*, weşanên Avesta, Stenbol, 2005.
- <http://candname.hawarnet.net/2012/05/em-zimane-kurdi-binasin.html>, 03 Sibat 2015.
- <http://ku.wikipedia.org/wiki/Rêziman>, 02 Sibat 2015.
- <http://www.adilcevaz.com>, 03 Sibat 2015.
- Îzolî, D., *Ferheng*, weşanên Deng, Amed, 2011.
- Kovara Hêvî, “Ziman”, Parîs, Îlon 1983.
- Kurmancî, (Hejmar 1-40, havîn 1987-bihar 2007) Rojnameya Enstîtuya Kurdî ya Parisê, Weşanên Avesta, Stenbol, 2009.
- Kurdo, Qanatê, *Rêzimana Kurdî*, weşanên Nûbihar, Stenbol 2013.
- Ludwig Marchal, Jodi, *The Phonological and Sociolinguistic Analysis of Kurdish*, Southern Illinois University, May 2007.
- “Nüfus”, tr.wikipedia.org/wiki/Adilcevaz, 03 Sibat 2015.
- Ocek, Nezir, *Waneyên Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Sîtav, Wan 2014.
- Özçelik, Saadetin & Boz, Erdoğan, *Diyarbakır İli Çüngüş ve Çermik Yöresi Ağzı*, weşanên Türk Dil Kurumu, Ankara, 2001.
- Öpengin, Ergin & Haig, Geoffrey, “Regional variation in Kurmanji: A preliminary classification of dialects”, <http://www.kurdishstudies.net/407-983-2-PB-pdf>, 04 Sibat 2015.
- Rashid Ahmad, Abdul-Majeed, *The Phonemic System of Modern Standart Kurdish*, The University of Michigan, 1986.
- Samur, Aziz, *Rêziman û Rastnivîsa Kurdiya Kurmancî*, weşanên Nûbihar, Stenbol, 2014.
- Tan, Samî, *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî, Stenbol, 2011.
- “Tarihçe”, tr.wikipedia.org/wiki/Adilcevaz, 03 Sibat 2015.
- Taş, Çetîn, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, weşanên Dîwan, Stenbol, 2013.

www.adilcevaz.gov.tr, 16 Tebax 2014.

www.kurdishacademy.org, 24 Mijdar 2014.

Yıldırım, Kadri, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi, Kurmancî Lehçesi*, weşanên Mardin Artuklu Üniversitesi, Stnbol, 2012.

Zaid Mahmoud, Lanja, *Kurdish Personal Affixes*, The University of Texas, July 1994.

Zêrevan, Arif, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (Kirmancî)*, weşanên Nefel, Stockholm, 1997.


PÊVEK 1: Dengên Kurdî li gor Alfabea Fonetîk a Navnetewî

AFN	Mînak	AFN	Mînak
[a]	agir, artêş, azadî, ar		
[b]	ba, berx, bisk, bî		
[dʒ]	car, ciwan, cî		
[tʃ]	çêlek, çivîk, çûr	[tʃʰ]	çay, çeper, çi
[d]	derî, dil, don, dûr		
[æ]	em, eger, evîn	[ʃ]*	enişk, ezman, egîd
[e]	êş, êrîş, êl		
[f]	fem, firîn, fil, feyde		
[g]	gaz, ger, gêzî, gur		
[h]	har, hêk, hirî, hûr	[h]*	hal, hemam, heyf
[l]	rik, birin, kirin		
[i]	înî, îro, îşev		
[z]	jûjî, jin, jiyar		
[k]	kil, kin, kevçî, kor	[kʰ]	ken, kûsî, kî, kanê
[l]	lîstik, lawik, ling		
[m]	mast, masî, mîr		
[n]	nan, nîvro, nû, niha		
[o]	ode, ol, odlar		
[p]	poz, pirç, pêr, piştî	[pʰ]	pişkîk, parsek, pak
[q]	qijik, qemer, qirik		
[r]	roj, rê, rastî, rewş	[r]	hirmî, tirî, dar, êvar
[s]	sêv, serî, sifîr, sî		
[ʃ]	şêr, şiv, şe, şahî		
[t]	ta, tima, tirs, tendûr	[tʰ]	tî, têr, tor, toz
[y]	tu, didu, ku, ruh		
[u]	ûtî, ûris, ûnîversîte		
[v]	vir, virrek, vazo, vala		
[w]	werdek, welat, wir		
[x]	xort, xanî, xêlî, xal	[x]*	axa, bax, qax, çax
[j]	yek, yasemîn, yar		
[z]	zava, zêr, zeytûn		
[w]	xwerin, Xwedê, xwê		
[ŋ]	deng, reng, tengasî		

PÊVEK 2: Alfabeya Dengên û Tîpên Kurdî - Berawirdkirî

Yegirtû (Unified Kurdish)	North Kurdish (Latin Kurmanjî)	North Kurdish (Cyrillic Kurmanjî)	Central Kurdish (Sorani - modified Arabic)
A a	A a	А а	ا ل ا
B b	B b	Б б	ب ب ب
C c	Ç ç	Ч ч	چ چ چ
D d	D d	Д д	د د
E e	E e	Ә ә	ه ه ه
É é	Ê ê	Е е (Э э)	ئ ئ ئ
F f	F f	Ф ф	ف ف ف
G g	G g	Г г	گ گ گ
H h	H h	h h	ه ه
I i	I i	Ь ь	ئانوسری
Í í	Î î	И и	ی ئی ی
J j	C c	Щ щ	چ چ چ
Jh jh	J j	Ж ж	ژ ژ
K k	K k	К к	ک ک ک
L l	L l	Л л	ل ل ل
Ll	Nîne	Л' л'	ل' ل' ل'
M m	M m	М м	م م م
N n	N n	Н н	ن ن ن
O o	O o	О о	و و و
P p	P p	П п	پ پ پ
Q q	Q q	Q q	ق ق ق
R r	R r	P p	ر ر
Rr	Nîne	P' p'	ر ر
S s	S s	С с	س س س
Sh Sh	Ş ş	Ш ш	ش ش ش
T t	T t	Т т	ت ت ت
U u	U u	Ö ö	و و و
Ú ú	Û û	У у	وو وو
Û ù	Nîne	Ннә	ئییاتی
V v	V v	В в	ف ف ف
W w	W w	W w	و و
X x	X x	X x	خ خ خ
Y y	Y y	Й й	ی ئی ی
Z z	Z z	З з	ز ز
(H' h')*	H h	h' h'	ح ح ح
(E' e')*	E e	Ә' ә'	ع ع ع
(X' x')*	X x	Ѓ' ғ'	غ غ غ
(Kh kh)*	K k	К' к' **	ئییاتی
(Ph ph)*	P p	П' п' **	ئییاتی
(Th th)*	T t	Т' т' **	ئییاتی

NEXŞEYA ELCEWAZ Û DEVERA FILISTANÊ



WÊNE: ÇIYAYÊ SÎPAN, ELCEWAZ Û FILISTAN



METN

-1-

Vebêj: Fatmaya Cemîl/Fatma Açar-63 salî, nexwendî.

Cî: Xornas/Karşiyaka

Berhevok: a) Çêkirina Savar, b) Meşk, c) Çêkirina Kulav, d) Bênder, e) Çîrvanok, f) Çêkirina Xalîçeyan, g) Çîrok, h) Çêkirina Kil

-a-

1Emê dest savar kîn. Savarê xu me kuçkê xu neh deh hev kevîr, me kevîrê mezin neh deh hev kevîrê xu dañanî, kuçkê xu diqelaşt bi bêrê, a me sîtilê xu kuç dikirin. Me savarê xu, ava xu berdday, savarê me dikeliya, ege dar bûna egee gonî bûna egee heşa sergîn bûna çi bûna me dixiştê binî, savarê xu dikeland, me savarê xu vala dikir, 5vala dikire ser cilekî, ava wî diçû îja me savarê xu radixişt, me radixişt du roja savarê me ziha dibû îja me savarê xu dibjart me îja dixiştê conî, cumek hebû ew curna êmelya da êmelya da ew curna çêkirîbû. Hema l gundê me bû zanî? Me îja dixiştê curn. Conî jî hebû conî, zanî conî çîye? conî, conîkî piçûk î aha ne, kevîrekî dirêj î aha navda ne, genim dixnê xura girarê çedîkin ewî dikutiñ. Ew conî ayrî ye ew 10curnê ku savar têda dikutiñ ew jî ayrî ye. Îja me savarê xu dikuta me sê çar hev gencê mîta we, qîz bûk em xura lê çot dibûn me savarê xu dikuta, savarê me dibûûû pîrç dida pîrç dida dibû notanî mijmijk de aha heşa me pif dikîrê nota birinc spî dibû paşê em jê vedgeriyan. Me sa savarê xu dikuta, me dixiştê çewala, têra, tûra, şevêkî têda dima, sibê em radibûn me dida bayê, me dida bayêêê îja dibû nota birinc îja 15me radixişt ziha dibû, me kevîr mevir navda hebûya jî me dibjart îja mey êvarda destarê xu danya, mey destar danya îja mey kulam bigotaña, mey îja kulam bigotaña, çîrok bigotaña, mey qelînek bixara, mey de'nû çêkira bona xewa me ney ha, bona xewa me ney, îja mey heşa sibê savarê xu bihêra, me dihêraaa ew bîst kod savarê xu ku me xilas dikir îja me sibê tañî bêjîngê dida, me carekî bêjînga toxim dida, 20carekî ew bêjînga toxim serkutkê dertê de, serkutka gir ew bêjînga toxim me dixişt me serkutka wî digirt ew ayrî dikir ya dinê jî bêjînga ar hebû me îja ya din jî bêjînga ar dida îja me poxîng bêjînga ar dixişt îja me cake din jî me elegê dida eva du bêjîng eleg, me elegê dida, arê wî nota arê tu niha hevîr dikî ew poxîng, me digo poxîng ew

poxîng navê derdket a me savarê xu jî ewî din î gir î serkutk me cake din destar
25dida dihêra, me savarê xu îja Xudê bereketê têxe navê meş xura dixiştê têr tûrê xu
dixar heta salekî xilaz nedibû.

-b-

1Me heywan xayî dikir, me ze'f heywan xayî dikir, pezê me ze'f bû, tarşê me ze'f
bû, çelekê me hebûn bizinê me hebûn îja dewê me pîr bû wî çaxî zanî wî çaxî, sirsûm
tinebûn, sirsûm tinebûn. Pezêke me yan beranek bimra, yan dewareke dusale bimra
em sa şa dibûn, me digo Ya Rêbbî, Xudê da me, emê meşkekî çêkin, meşkê çêkin
5dew têda bikên, dewara me bimra me meşk, îlahim dewara du salî, me meşk çêdikir
ew postê wî bême'nî di binê dawa wî da isa zol zolî dikir dihat bi devê wî va
derdixişt ha, dêv va derdixişt îja temîz sê roja dixiştne xalîya hêşîn, sê roja xalîya
hêşîn heşa hinek jî peyn meyn dixiştne navê boña ku pûrta wî birûçke, pûrta wî
dirûçikî îja me ku derdixişt pûrta wî dirûçikî îja çil çil çil qerqaş der hundur çil
10qerqaş dibû îja me temmîz dişûşt îja me temmîz miccişt xoy dikir, xoy dikiiir îja sê
roja xoyda dima. Piştî sê roja îja me derdixişt mey îja mizda mizda mizda mizdaaa bi
destê xu mey sa mizda, mizdaaa îja isa nerm dibû, dibû nota çi pembû sa ew 'iyarê
wî pezi nerm dibû a îja taîn didrûtîn binê wî didrûtîn devê wî jî bêm'enî devêw jî
deyja tê qatix têra berdî ha qatix berdî a îja em sa bi dara, bi dara bi benda ew jî ew
15hingil hene pê wana pê peza pê heywana, pê wana darek vî pêyî va darek wî pêyî
va, de televziyonê da cara dertê me îja temîz didrûtîn çêdikirin îja kape xu davîtne
arîka kape xu davîtne her serê wan dara, darê meşkê, her çar piya ra digotîn hingil îja
davîtne dara îja pê girêdidan îja ku kape xu davîtinê îja dew me dikiya îja me dikiya
îja me girm girm girm îja guregura meşkê ka ça ne? Meriv divê bira hema dengê
20wî têr were meriv, bereketa wî çaxî! Me kulamê meşkê carna digot:

Hilê kil kil kil dewê

Dew dikem dew nabe

Wexta (pitik) xew rabe

Taşê maştê kar nabe

25 Delîl halê mi çabe?

E ya meşkê jî sa xaş e ew bîra mi çûye. Ya meşkê jî heye zanî. A îja me qederekî weke bîst sala wisa dewam kir. Îja wexta me av dida ber dikiya dikiya wexta me derî vedikir. Pârzûnê xu dida ser devê sîtila xu paşîya meşkê de devê wî girêdayîye, yekî devê wî aha digirt paşîya meşkê du tewaya ew werîs cake du tewaya davîtîne hingil meşk **30**binê wî bilind dibû serê wî berjêr dibû, berjêr dibû dikete sîtilê digo gur gur gur gur hema sa lep lep lep rûnê nivîşk diket. Ewya me sakî dikiya. Laylon tinebûn kûpê herî hebûn. ‘Eynî pezeke me yan dewareke me bimira ew jî dîsa ‘eynî me çêdikir me tijî penêrê xu tijî giriyê penêr dikir şorava xu berdida ser me devê meşka xu girêdida hizkî sê sala têda bima. Me jê ra digo avrênç. Wexta ku heywaneke me bimira me **35**postê wî sipî çîl qerqaş dikir, xoy dikir, me îja avrênçê xu tijî toraq dikir ew jî ‘eynî meşkê me didirût, wextê tijî toraq dikir hingilê wî bendek diday girêdida dibû mîta tûrekî, wexta te tijî toraq nedikir tey daniya nav malê têtê wêda bihatayî tey bigota qey pezeke qûn rûniştîye, hingilê wî jê nedikirin, rewşa ra hema sa hingilê wî **40**pêva dima. Ewya jî me wisa toraq tijî dikir îja wexta toraqa me dikesirî me îja carke dinê penêrê xu pincara xu toraqa xu me sê çar hev, îja paşê ew avrênç bû me toraqa dixistê wexta me dadigirt têra salewextê ‘îyar, îja ‘îyar îja ew jî ‘îyar, ‘îyarê gere pûrta wî piçik ser neçûya, pûrta wî ser bû. Te peza xu şerjêkîra te ‘eynî ‘îyarê xu temîz dişûşt lê gere pûrta wî ser bûya. Gava me bişûşt me temmîz miccit xoy dikir **45**idî qiyamet rabûya pûrta wî nedirûçikî. Pûrtê nedihîşt toraq xira be. ‘Îyar boña salewextê avrênç boña toraqa re’n bû. Tûredew jî hebû. Tûredew jî, te du mêtro qedekê xu tañî devê wî didirût, bendê xu têra dikir, te toraqa xu berdiday ava wê diçû, sibetîrê tey toraqa xu xoy kira bixista avrênç. Îja te çar pênc avrênçê xu tijî nekîr, firotan mirotan tinebû hema te dixar dida feqîr fiqara. Zemanekî şûnda **50**sirsûmê herî derketin, sirsûmê herî giran bûn, milê me dixistne dar, milê me dixistne çaw. Me weke deh pânzde sala me sirsûmê bi herî îdare kir paşê sirsûmê dar derketin. Me tenêke niv qatix pêda dikir tenêkê jî av berdday, me du heva me girm girm girm me diday bînekî me dewê xu vala dikir. A îja niha sirsûmê ceyranê alîkî, her îmkanê wan hene.

-c-

1Limûjen dihatîn, dezgê xu dataîn, liba dijenîn destîkê wan hebûn, destîkê wana dar bûn a şî tera bêjim ku liba xu xilas dikirin dijenîn dixistîne nota rûnê helandî paşê îja çadir ser dirêj dikirin paşê jî îja kulavê xu ew liba tamam rast dikirin îja paşê av dikirin paşê îja bor dikirin. De hûn dibêjin pêçan em jî dibêjin bor. Bor dikirin vî 5serîyî heta wî serî bor dikirin ku xilaz dibû nava wî çadirî da ew kulava îja taînîn şirtek her serî wî serîyî va girêdidan îja sê çar tewa davîtîne nav, kulêv girêdidan dihatîn serîyê din va girêdidan eva çêbû! paşê neh deh hev genc kom dikirin îja wê li êvarda lêdana, wê lêdanaaa bi pe'na wê lêdana li xanîkî mezin wê biçûna wî serî wî serî bihaşana vî serî lêdana paşê îja du genca milê xu didane ser milê hev îja hakî 10lêdidan aha lêdidan aha lêdidan bi p'ena a kulav xilaz dibû paşê vedikirin îjaa qelînek diqelandin, mewûj kirkirk tev dikirin, me de'nû çedikirin me xurek çedikir îja şayîyeke sa bû îja kulam digotîn hetta sibê sa dewam dikirin. Ku wexta xilaz dibû kulav vedikirin te kulêv dinihêrî dilê te dixeriqî, dilê meriva dixeriqî, meriv digo meriv hema têr raxe ser rûnê. A kulav vî karî sê rojê wî tamam dibû du kulavê te 15bûna şeş roj, a kulav vî karî xilaz dibûn.

-d-

1Îja em behsa bêdera bikin. Bêderê me, deyja em yê şêst heftê sal 'emrê me yê zûda nin zanî zûda. Qijîka sed dolim dusid dolim yê kê hebûya yan pêncî dolimê kê hebûya bi cotê, cotê dar heye? cotê xaromaro jêra digotîn xaromaro, xaromaro cot bû dar bû. Îja çar gayê xu girêdidanê dar jî jêra digonê nîr, nîr davîtîne ser stîyê ga pê cot 5dikirin pê ew 'erda xuşa radikirin. Deyja wisa bi pê ga ra ew merivê biçûya bihaşa, sê cara rakira wexta toxim jî bavîta yekê jî pey tûrikê toxim stîyê wan da bû yekê maç bigirta yekê jî pey toxim aha bireşanda. Eva cotê wî çaxî sakî bû. Wexta hate ber dirûnê, îja qijîka yê dasê xu hildana îja biçûna bidirûtaña, wê bidirûtaña wexta didirûtîn îja êvarê ku hatin îskane ça xu xarin nanê xu xarin nexarin îja yê çaw 10çêkirana, çaw. Tarîgan taînîn av dikirin çaw çedikirin îja yê biçûna ew miştî hemmû, de bi dasa dirûtîne danîne 'erdê, ew miştî temmam wê pêva girêdana bi wan çawa yê texistana gurz, gurz îja yê pêketana partî kirana, partî. Sed partî, pêncî dolimê

te bûya sed part nan parteke wî çil gurz, wê timmam îja lêdana wê wisa ew partê xu
 hemmû xilaz kîrin îja yê ‘ereba ew ‘erebê ga hene? ‘erebe îja wê çar gayê xu
15girêdana îja du hevê biçûna yekê barkîra hilkişiya ser ‘erebê yekê jî biday wê
 barkîrana banyana bêderê, li bêderê lod kîrana, nanê xu hemû kişandin ew sed part
 nanê xu kêmî wî kêmî wî pêncî dolimê kê hebûya sed part dida. Her çe’va digiryan
 digon emê vî sed part nanî çar bikuştin, emê çar serad kînan emê çar bêjîng kînan? Emê çar ji
 kayê derxin? Sa zehmet bû zor bû. Wexta tanîne bêderê, de sed part nîne? deh part
20davîtnê ‘erdê ji tera bêjim darek nava gêlê da me digo gêle orta gêlê da darek
 diçikandin, kandirêp hebû dar bû aha gurover bû çêdikirin serê wî pîncik dikirin
 çêdikirin ew jî dixistnê nava serê wî darî ra dixistnê nava darê îja kap davîtnê ew deh
 dewar pañzde dewar isa kapê wan wê darê va dora wê darê dizvirîn. Dewar dizvirîn,
 dizvirîîn, îja kam hebû kam. Ew ne’lê binê pê hespa hene! Ew ne’lana textekî a ji
25vira derê hanê dibirin ce hosta ew ne’lana hemmû lêdidan, de hesin in, bona nan
 bibire, îja ew kama me digo kam, kam davîtnê pey wan dewara, zarek, gencek ser
 kamê sîyar dibû ew gêle dewar ser nan ra dizivirî heştta êvarê ro aha biçya ava wê
 dewar berdana, gencek wê biçûya ber heştta sibê ew dewar biçêranda, wê têr kîra wê
 av kîra, avda, sibê wê dîsa bide ser gêlê de, sê roja. Du roja ser dibir tanîn, roja sisiya
30ew nan carke bi dirgana bi destta weldigerandin. Weldigerandin bona kanê binîda
 maye nemaye. Sa hûr dikir sa hûr dikir ya Rêbbî! Xudê ti’ala jî çar dibê aşê nezana
 Xudê digerîne, Xudê t’iala jî wan ra alîkarî dikir. A dikuştan îja wê dewarê xu
 berdana, sê roja dewara îstrehet dikir, de dewar diwestîyan, wê îstrehet bikîrana heştta
 ew tîxa ha ha ha serî hebû binî tunebû îja gurover çêdikirin, wê pêketana îja bidana
35bayê, bidana bayêê îja hema du heb dar, ege dar ege sing paşava, paşîya tîxê
 dikuştan wexta ka diçû genim valî dihat sonêda ew her dar derdiketîn idî ew genim
 xilaz dibû. Îja ew genim sa dihat ez bêjim pênsid kod genim tu bê şesid kod genim
 hefsid kod genim jî wî tîxî hinde nan dihat îja mey bigoşa gazîkîra bigoşa serad
 bêjînga hildin werin îja mey serad bêjîng hildana, me piştî nan serad dikir qudûmê
40me tinene. Îja me xu ber hev diguhert. Yekê qedera sed kodî serad kîra îja yeke
 weke sedî, yê din jî destta dikir. Sa serad dikirin dibû nota şûşe. Te tîxa dinihêrî aqilê
 te pêra diçû. Cefa bû îzdirab bû. Xaliqê ‘alemê me ‘ef û mexfirê bîke me ze’f cefa
 kişandîye. Wextê gurz dikişandin, biçûna gûnîya, biçûna gîha bi ‘ereba ga tanîn. Îja
 de dewara ra lazim e qamçî, qamçî. Dewarêk bimra zol, qamçî çêdikirin. Zol jî me

45sê roja dixište nava rêxê, zol postê dewara bû me dixište nava xalîya hêşîn bona ku pûrta wî here îja ku pûrta wî diçû sê roja dima pûrta wî diçû îja micciş xoy dikirin, ze'f xoy dikirin wisa dibû ç a tu me'sîya xoy dikî zola xu ji nav xoy derdixiştin, îja rûn dikirin, rûn dikirin îja mizdidan mizdidan mizdidan sê roja ew zola xu destê xu da aha mizdidan îja ew darê ku didane ser şîyê dewara, nîr ew zola du tewa jî 50stîyê nîrî ra derbas dikirin bême'nî serîkî wî jî kêr dikirin ç a tu rişta, rişte rişteyî dikirin cake dinê nota keziya dihonan îja bême'nî pîncîk hebûn pîncîk çêdikirin, serîkî pîncîk gilê bû yek jî zirav bû îja zolê ra dikirin ku bona bigire ha. Qamçî jî; ew postê dewara zol dikirin, zirav zol dikirin îja temîz xoy dikirin, rûn dikirin, mizdidan îja taînî porkî hineka porkî dihona ew qamçî hineka jî me'rkî e, du celebra dihonan 55îja serê wî gilê dikirin. Ku gilê dikirin sê çar hev zolê wî de idî çend zol be sê çar pirpal jî serê wî zolî va dima ew jî sa ew dibû nota qotîka îja darekî rind ku 'eynî serê wî gilê pêva girêdidan ew qamçî wan ra diçû salekî.

-e-

1Car cara reşmet dê bavê hazir guhdêra. Carek hebû pîrek sê qîzê pîrê. Her sê qîzê pîrê, diya wan dibê qîza min ezê îro serê we bişom. Dibê inê tu serê me bişoy dibê tê me ra ya mezin dibê tê miira qazekî şerjêkî, ya ortê dibê inê tê miira savarê nîska çêkî ya piçûk dibê tê mirtoxa ser bi şekir çêkî. Dibê baş e qîza min. Evna cîya wan ji 5wan ra çêdike dixwin, ç a dibe nişkêva kalekî sêr li wana derdikeve her sê qîza davêje terkîya xu hilde dibe. Dibe cîkî, dixê kûlekî, a, beraşekî aş a dide ber devê wî, careke dinê li qîza inda dibe. Qîz dimînin tî, dimînin birçî, zarezara wan e gazî diya xu dikin. Cîya wan digere cîya wan diçe dêna xu didê, pir diçe hindîk diçe dêna xu didê qîz kûlê da nin. Divêje qîza dibê; qîza min, cîk sabûna hêşîn, şekî serîya, misîne 10av hersêka dide qîzê xu divê hûn ku çûn, divê hûnê birevin, dibê wexta hûn qederekî çûn ewî xu gîhande we dibê sabûnê bavêjin. Sabûn dibe bûz dibe şimşat kalê heta jê dertê qederekî qîz diçin. Qederekî diçin kalê dîsa pir hindîk dîsa digihîne wana, digihîne qîza, qîz şe davêjin, şe davêjin şe dibe derd, devî, dirîk, gincirê kalê dikevinê, kalê heta ji wan dev devîya dertê qîz qederekî dîsa diçin. Wexta xu 15digihîne nêzîkî qîza qîz misîne avê dirêjine 'erdê dibe be'r, dibe be'r kalê nikare, dizvîre ewna diçin. Diçin dibên em ç a bikin ç a nekî, diçine cem şivanekî, dibêjne

wan şivana dibên hûnê herêkî hûrekî pêz bine me dibê me ra lazim e. Tê şerjêdikin her qîzekî hûrekî didine wan kezîyê xu top dîkin didine ser serê xu ewî hûrî dikşîne serê xu dibên em keçel in, kê me pîrs kir emê bên em keçel in. Diçin diçin diçin hûr **20**ser serê wan da 'işk dibe disekine diçin rastî mala paşê tîn, diçin ber derê wan dibêjin; Paşa xaş be! dibêjin em xurâ rênçberîyê digerin em belengaz in hêsîr in. Herêkî deste kincê mêra xu dîke dibê em xurâ îşekî digerin qe îşê we tine? Dibên wele hûnê bibin qazvanokê me. Hersêk dibne qazvanokê wan, dibne qazvanok, diçne ber qaza sed dusid qazê mala paşê bûne. Diçin diçine devê çêm hevra dibêjin, dibê **25**heft xazil wî çaxî dibê emê êvarê bêjne xatûna xu emê fîraqa jê bistînin bi sabûnê şê emê werne devê çêm emê kuçik dadin, avê germ kin serê xu bişon. Êvarê diçin dibêjne xatûna xu dibên xatûnê dibên tê sibê sîtilekî bidî me şe sabûna bidîme emê herne devê çêm xu bişon. Radibe dide wan da diçin. Kurê paşê dewamî pey wan bûye, 'eceba mesele çîye? hersêk jî rengê hevda bûne. Çûne av germ kirine, serê xu **30**şuştîne ya mezin gotîye; heft miraz wî çaxî tedî me serê xu dişuşt cîya min mîra qazek şerjê kir. Ya ortê jî dibê heft miraz wî çaxî mi serê xu dişuşt cîya min mîra savarê nîska çêkir. Ya piçûk jî dibê heft miraz wî çaxî dîya mi serê mi şuşt mîra mirtoxa ser şekir çêkir. Evna hevra dibêjin kurê paşê jî xu li wana telandîye. Carke din jî kurê paşê êpê xu li wan diçîne dibê xazil, ya mezin dibêje xazil ji xêra Xudê **35**ra bira ez jina kurê paşê bûma minê xalîçe ji lal dur jêra xalîçe çêkira. A ya ortê jî dibê xazil wî çaxî ez jina kurê paşê bûma minê nêvanê wî qalîkê hêkê da derbas kîra. Ya piçûk jî dibê xêrê Xudê ra ez jina kurê paşê bûma dibê minê jêra kur qîzekî gulanzerîn banîya. Kurê paşê gustîla ya piçûk ser kincê wê hildide direve, direve diçe dibêje cîya xu hal made vî karî, dibêje bavê xu dîya xu. Dibê qîz nînin husnucemal **40**in, kezîyê wan hinde ne şîtera bêjim van hersêka ezê xu nikah kim. Dibêje cîya xu tê îro qazekî şerjêkî, mirtoxa serşekir çêkî, savarê nîska çêkî heça êvarê qazvanok tîn. Hersê xureka êvarê çêdike qazvanok hersêk tîn. Ça tîn sinîyê rast dîke kurê paşê şivîka xu serê wan dixê, hersêka hûrê serê wan davêje, kezîyê wan dikîşîne van dera qîz nînin husnucemal in, bedew in. Tîne xu nikah dîke. Kurê paşê li bendê dimîne **45**dêna xu didê qe ya mezin da tişte tune, ya ortê jî 'eynî sakî tişte tine, ya piçûk hemle dimîne. Roja wê hemla xu dayne dibêjne xûşka xu, her xûşk, dibêjnê tê herî ser serê kuleka xanî tê biwelidî emê zara te vira bigirin. Emê teyştekî bigrin destê xu da. Xûşka xu dibîne ser kulekê da, xûşka wan radizê kur qîzekî tîne. Her xûşkê wî

dibên Xudê ev her zarê wî yê bibne tiştêkî ‘ecayîb. Dibê em çabkin çanekin, dibê 50emê rabin. Diçin yekî tînin, necarekî tînin, qutîkî çêdîkin, her zara dixne qutî, kâlek, gazî kalê dikin dibê tê evî biherî filan çêmi da berdî. Kâlê dibê wî çêmi da berdide. Kâlekî pîrekî hebûne qe Xudê ewlad tewlad weqînî guhê wan da neanîye. Kâlê dibê ezê herme devê çêmi ew jî kâlekî din bûye. Dibêje ezê herim dezmej bigrim werim, dibêje jina xu. Diçe devê çêmi dêna xu didê qutîk wê hat, gerînekê da 55gerîya gerîya gerîya dibê ezê Xudê bisenim kanê eva çîye? qutîk hat, kanê çîye têda? Tê devê çêmi, kâlê qutîyê hildide, ‘int ‘int tîne malê, dibêje jina xu dibê were em derî vekin kanê eva çî ye. Derî vedîkin dêna xu didnê du zar têda. Avê tînin teyştê tînin serê wan dişon. Wexta serê her zara dişon teyştâ wan tijî zêr dibe, tijî zêr dibe, şa dibin. Pîrê her cara serê wan dişo barê deva mala wan tijî zêr dibe. Mezin 60dike, zar têne bîştâ, zar têne bîştâ navê qîzikê danîne Perîşan navê gede danîne Mîrze Miheme. Mîrze Miheme dibêje Perîşanê dibê ezê îro herme, hê ce kâlê ne. Dibê ezê herme nêçîrê, diçe nêçîrê. Dêna xu didê sîyarek ew jî bi te’jîya xu va hate nêçîrê, nebî ew paşayê bavê wan e! Paşa diçe paşa nêçîra xu digre ewî nêçîra xu dide Mîrze Miheme. ‘Eynî sibê tê nêçîrê dîsa digre dide Mîrze Miheme, ‘eynî roja paşîn 65tê nêçîra xu digre dide Mîrze Miheme. Jinê wî dixne şer dibê tu têt qe nêçîrê naynî! Dibê welle ez çij we veşêrim çij Xudê, dibê ez diçim xortî nîne husnucemal e, muhuba mi difîre ser e tême nav dilê xu, e bixwim dilê mi rihet nabe. Nêçîra xu dikim êvarê dimê lê dixim têm. Divê xûşkê ha xûşkê em çakin ça nekin dibê heye tine ev zarê xûşka me ne. Divê em çakin ça nekin? Divê pîrê ha pîrê! pîra ‘ancûz 70hebûye. Pîrê ha pîrê bextê te ne tê herî, tê bêjî, tê şîret kî Mîrze Miheme tê bişînî rîya hatînin nehatîne. Diçe dibêje Perîşanê dibê hûn vira çidkin? Divê ce vî kalî ce vî pîrê, divê bile hûn zarê wî jî nînin. Pîrê remildar bûye çî bûye. Êvarê Mîrze Miheme tê Perîşan dibê hal made vî karî. Êvarê dibêjne kâlê pîrê, dibêjne cîya xu bavê xu tê herekî me hespekî bidî me dibê emê herin. Kûrê mi lewo qîza mi hûnê kûda herin? 75Naabe kû nabe dibê emê herin, dibê emê herin. Dibê kûrê min gunê min sîyê te be dibê tu çûy, herekî du xurc zêr davêje pişt wana, terkîya wana, dibê tu çûy kêderê hespa te kêderê pîkol kir ew ‘erdê kû pîkol kir wêderê koşk seraya xu çêke xûra bikevê. Dibê bavo baş e serçe’vê min. Diçin deyja diçin tam cînarê bavê xu ‘eynî cînarê paşê hesp wêderê pîkol dîke wêderê koşk seraya çêdîkin, çêdîkin dikevinê. 80Dikevinê, Perîşan dibê Mîrze Miheme dibê me idî xûra koşk sera çêkirine tê dîsa

herî nêçîrê dilê me nêçîrê dixaze, dibê baş e. Mîrze Miheme diçe dîsa paşa tê digjê, tê digjê, dîsa nêçîra xu dike dîsa tê ‘eynî ew xorça, paç dike hemêz dike dibê qe ev qedereke tu naxuyê? Dibê ez bi‘ecîm boña te. Paşa nêçîra xu didê êvarê diçe dîsa jinê wî dibê kanê nêçîra tê? Dibê welle ‘eynî dîsa ew xorça gîştiye min dîsa muhibî min **85**fiñye ser, ez ze’f hijê dikim ez dixme nav dilê xu, min nêçîra xu dayê ez hañime. Dibê xûşkê ya mezin dibêje ya ortê dibê wellehî dîsa ew zarê xûşka me ne. Dibê em çakîn ça nekîn? Dibê pîrê emê nizam çiqas zêr bine te tê Mîrze Miheme bişînî rîya hatîn nehatînê. Diçe pîrê diçe dibê Mîrze Miheme! dibê kirasê Bilbilhezare kirasê reqreqanî dibê serserê darê direqise, dileyîze, dibê hûn jî vêderê du hev tenê dibê hûn **90**çi dikîn, tu bêkar î, xûşka te bêkar e dibê rabin xurî çarekî bikin, herin. Mîrze Miheme dibêje Perîşanê dibê rabe, dibê kincê min bişo arava kincê min têxe kûpekî, dibê çek sîlahê min dayne, dibê çil şevê min bijmêre ezê herim. Dibê wexta çilê min tamam bû dîsa xu bide ava kincê min ku ‘işk bû, çek sîlahê min zeng girtê te’jîyê min ‘işk bû dibê tê wî çaxî min bipîrsî idî ez rîya hatîn nehatînê me. Mîrze Miheme diçe, **95**diçe Perîşan radibe ‘eynî ewî ça gotîye sakî dike. Çil şevê wî dijmire, diçe devê wana vedîke dîsa xu didê çek sîlahê zeng girtîye, te’jîyê wî ‘işk bûye, arava kincê wî ‘işk bûye. Xu dixê, nava çe’vê xu dixê, dibê Pîrê!te çi kir bi mi kir dibê pîrê bira destê min gevela te keve dibê wellehî Mîrze Miheme çû rîya hatîn nehatînê. Perîşan radibe dîsa xu didê ‘eynî gotîna birê wî, radibe diçe, dide hêla linga diçe. Digrî diçe **100**diçe cîyê kirasê reqreqanî, Bilbilhezare jî zanibûye, pê beled bûye. Tê dîsa xu didê diçe kalekê lê dertê qencekî Xudê bûye. Dibê qîza min qîzka min e delal tê kuda herî? Ogir be, bixêr be tê kuda herî? Divê welle hal made vî karî. Dibê qîza min; dibê tê herî zevîke de’l e dirîk e devî şîlanê bikeve pêşîya te, tu nikarî, kincê teyê bikevinê biqelêşin, pê tîra herin tu nikarî tîra herî tê bêjî zevîyê ax zevîyê! xazila mala min vir **105**bûya min tîr nanê te bixara. Dibê tê pêşîyê bê zevîya dernexûn çemê kê xûn xazila mala min vir bûya min tîr te bixara. Dibê tu çûy ber avê dibe bibe av, be’r, çem, kanê dibê tê bê avê tu xaş avî! xazila mala min vir bûya min tîr te bixara. Dibê heft şiverê derkevne pêşîya te tê herî. Perîşan diçe ‘eynî sa dibêje rêdikeve pêşîyê diçe, dibê tê herî kevîrê birê xu hemêz kî bigrî, dibê tê nazkî, dibê tê hemêz kî. Dibê **110**tê bêjî Bilbilhezare! ku ege go kul! wele ranabe, ku go can! Xudê wê rabe, tê bîni jî. Dilê Bilbilhezare dilekî na hezar dilî dikeve Mîrze Miheme, wexta ku Perîşan diçe pey birê xu dikeve dilê Hesenê Dengbêj, navê birê wê Hesenê Dengbêj bûye, dikeve

Perîşanê. Bilbilhezare dêna xu didê dilê birê wî dikeve Perîşanê dibê Xudê ezê bime dû. Kevirê birê xu hemêz dike dibê Bilbilhezare! dibê, de zane dilê Hesenê Dengbêj

115ketiye Perîşanê, dibê can! Dibê Bilbilhezare! dibê can!, dibê Bilbilhezare! dibê can! Qêrîn şîrîpîn dikeve wan merzela, tima radibin, dibê lê tê birê xu ‘işkem bigrî. Ew birê xu ‘işkem digre, Kirasê reqreqanî, heft sazvan, heft defvan, Hesenê Dengbêj bi Bilbilhezare va berjêr dibin tên. Idî şa dibe hildde tê. Tê mala xu. Dibê emê îja heft roj heft şeva her de’wata bikin. Perîşanê dide birê xu, Bilbilhezare jî Mîrze

120Miheme dixaze. Tê, du roj sê roj disekine dîsa diçine raw nêçîrê. Îja Hesen Mîrze Miheme tev diçin. Diçin paşa dîsa ‘eynî li wan dertê dîsa dêna xu didê xort nînin husnucemal in. Hij wan dike xûna wan dikele ser. Dîsa nêçîra xu dike nêçîrê dide wan diçe. Diçe êvarê dîsa jinê wî tên dibên Paşa xaş be! ka qe nêçîra te îro tunebû. Dibê welle heşa niha yek bû dibê îja bûne duduya. Dibê ez nêçîra xu dime wana

125dizvirim. Aha dibê Xudê dîsa ev zarê xûşka me ne. Dîsa dibê pîrê ha pîrê! Pîrê diçe dêna xu didê Perîşan, Bilbilhezare, Kirasê reqreqanî malê ne dileyîzin, şayî ye. Dibê bira pîrê te çi kiribe mi kiribe. Bilbilhezare dibê qîza min tu deyn neke dibê ezê bêm bira here bin cîyê hespa paqîş ke, dibê ezê hespê şîret kim ku ew ça çu hespê lêxe diwêr xe, bikuje. Wexta diçe dibê meqseda te çibe, lê tê herî binê hespê me

130paqîş kî. Ku diçe hespê lêdixê pîrê dikuje. Sibê dîsa ‘eynî diçne nêçîrê, dibê hûn her xort, paşa diçe, dibê ez ze’f hij we dikim, ze’f xûna min dikele ser we dibê hûnê îro bibine mêvanê min. Bilbilhezare dibêje wana dibê her teyrikê ser destê xu biherin, dibê xarin danîne ber we her xarinê hûnê herekî qotekî bidîne teyrikê xu teyrikê we ‘işk bûn hûn devê xu nane wî xarinî. Ku ‘işk nebûn hûnê bixwin. Pêşîyê

135didne heywanê xu, ewna devê xu nadinê naxwin, dibê teyrê me ‘işk bûn. Dibê Paşa xaş be dibê tu jî sibê nêvanê min î. Dibê serçe’vê xu. Bilbilhezare dibê sibê Paşa hat, çil hev kevçiyê wê zêr hebûye, wî çil kevçiyê zêr wextê paşa rabû ezê têxme binê terkîya Paşê, binê zînê hespê. Paşa tê xarinê dixwin, suhbetê dikin wexta rabûnê, dezgîna hespa Paşê digre dibê çil kevçiyê min î zêr tine. Deyja Paşa bi çil

140sîyarî va hatîye ha. Dibê ezê we hemûşka binhêrim. Timama dinhêre axirîyê da tê Paşê dinhêre dêna xu didê her çil kevçiyê wê. Dibê Paşa xaş be! Paşa kevçîdiz? Paşa dibêje Bilbilhezare qe kesî dîtîye Paşa kevçiya bidize? Dibê qe kesî dîtîye însan kûçîkê san. Paşa wê derê pewa dibe. Dibê Xudê eva vê meselê da tiştêkê heye. Dibê hûn ê rast bêjin. Dibê Paşa xaş be! dibê Mîrze Miheme kurê te Perîşan qîza te, dibê

145gulanzêrîn in dibê qasî dinê zêr ji wan çêbûne, dibê jinê te aha wan fêlan serê wî kîrine. Dibê Perîşan haîye, dilê birê min keîyê min bi koma xu va daye pey. Dibê tê werî heft roj heft şevan de' wata me bikî. Heft roj heft şevan de' wata wana dikin ew çûn mirazê xu şa bûn tu jî diçî mirazê xu şa bî. Wêderê wan her jina devekî tî dikin yekî birçî, yekî wê devê va dikin deve xu dikşîne avê, jina wî ye din jî ya birçî va dikin. Tu çûyî mirazê xu ew jî çûn yê xu.

-f-

1Malxê mala digotne me hûnê îsal xalîçekî çêkin. Mey rabûya 'ecele kîra, pez bibirîya mey hirîya xu hemmû bişûştâ, mey hirîya xu avzelal kîra, mey şiv kîra, mey raxista, mey sibetirê me îja nedixiste çewala torba me digo sibê em zibara top kîn bira hirîya me nebe kurtañ. Me deh hev zibare, jin, qîz top dikirin me xanîkî mezin **5**da zibare dañañ, herekî wana şek dañañ ber çokê wan zibara xu ra hirî şe dikirin. Her zibarekî digo tê du hirîya, digotne kebanîya malê, herekî me du hirî du hirî. Kanê kê xilaz kîra pêşiyê kê xilaz nekîra. Wê hirîya xu şekirana îja xaya malê dihat dêna xu didayê ku hirî ze'v rind hel kîrine şe kîrine ze'f kêfa wê xaş dibû ku dixistne gizilgo kêfa wê nedihat digo we hirîya min rind neşkinîye. Îja serbiska xu dişkinîñ **10**ayrî dañañ. Sê devşe tamam dibû, sê devşê xu carke din devê şe dixistin, dişkinîñ ew kûrka xu dañañine wira, navşika xu dañañine wira. Sê dev navşika wan tamam dibû carke dinê dixistne devekî devê şe didan ew jî didane ser serbiskê. A kûrka xu jî hilddan dixistne coban, cobanê 'ereba heye. Wî çaxî werîs tinebûn, şirît tinebûn, dixistne coban da yan jî bidana feqîra wê şuxra texistana mînder texistana organ **15**bavîtaña ser xu, e sakî dikirin. Îja idî wê dest ristinê kîrana. Wê teşî banyana ege du kîlo sê kîlo bidana cînara bidana heq bidana jina yaxu bixu biristaña welhasilî tam pañzde kîlo dibû reng, rengê wî, pirtîk hene tu têda, xalîçê da dañañ. Pañzde kîlo. Pênc kîlo jî 'eynî badidan diristin ew jî arzî wexta ku tevn dadixistin sing dikutañ ew pênc kîlo lê dibirin tañ. Zehmeta wî ze'f bû. Ew dibû heşan pirtîk paşê pêva **20**dañañ. Xalîçêke wana isa dikişand havîn xilaz dibû tam dikete payîzê dadixistin. Wî çaxî payîz îş tamam ser hev da dihat. Îja hezarî yekî gura wî zanibû, kesî gura wî nizanibû. Gur jî bend e davêjî bendekî binî, dargur heye ew jî dargur e ha, bendê xu aha dikî wira gilê dikî, beş jî heye darpişt jî heye, darpişt jî parava ne, ev hemû

parçê wê ne. Befşê xu lubekî binî yekî ser gurêkî xu çêkir befşê xu têra dike
25darpiştê xu wê piştê va dîsa ewê lubê dîsa dide ser darpişt, yekî çêdike dide ser
 darpişt dide ser befş hetta sona wî tê ewa sakî çêdibe. Wexta gur xilaz bû masûr
 hebû. Masûr jî çilpîk bû. Te rîsê xav hema carekî dirîst ew jî reş dikir, îlakim tey reş
 kira, rengê reş, ewî masûrî tey têda bavîta, wê biçûya sê dor, tey carekî bavîta befşê
 xu a aha banya ber, carekî aha bavîta cara paşîn te dikuşa bi kergî dikuşa dihatê
30ber. Cara paştir, darpişt wexta te hilkişand ya binî derdikeve ser, cêrga binî. Destê
 xu aha lê dixî yan pîjê xu aha lê dixî befşê xu têra dikî befşê xu tînî ber masûrê xu
 davêjîyê dikuştî. Ev bû du car, carke dîsa ‘eynî ev bû sê car. Darpiştê xu idî didî
 parava îja ku te sê dorê xu temîz kuşa îja tu pirtîkê xu bi meqesê ane gorî wî ane gorî
 destê xu tilîyê xu zêde dirêj bibî zeyn dibe tê ancax tewekî ya binî tewekî ya ser
35pirtîkeke xu aha valî va daynî yekî aha walî va daynî aha dikşande ber eva çêkirina
 xalîçê jî wisakî bû. Boyaxkirina rîs; wextê ku me rîsê xu hemû rîst ew panzde kîlo
 me dixiştê telaş. Milê xu aha bîne carekî ser carekî binî bibim bînim dibû telaş te
 serçeçekê davîte bona telaş li hev nekeve. Îja pincarek hebû navê wê potîk bû. Ew jî
 piştê kira li Gulîcê wan dera xalîşîrk heye potîk jî heye. Xalîşîrk têlê wê dirêj in
40hêşîn ew pejal gewr ‘erdê. Me îja ew diçû taînî me îja dikeland, ew nebûya rîs reng
 nedigirt. Me ew taînî dikeland potîka xu navê derdixişt me rîsê xu davîte temmîz
 dikeliya xulpexulpa wê dikeliya, me rîsê xu ji nava potîkê derdixişt davîte ser şîrtekî
 ziha dibû. Ziha dibû ‘işk dibû sibetîrê dençî dihat. Dençî wê bihaşa ane gorî rîsê xu
 arzî arzî celeb celeb kîjan reng kîjan reng, carê renek wê bida ser tendûrê bikelya
45wê rîsê xu navda kira îja destîkê destê wî hebû. Îja rîsê xu reng dikir îja boyaxa xu
 îja me derdixişt; qîçîk, kesk, gevez, pembe çêşît çêşît rîs me çêdikir me davîte ser
 şîrtekê. Piştî ku me reng dikir boyax ‘işk dibû îja du meriv rûdiniştin tey bavîta milê wî
 tey ew telaş vekira. Vekira têxista gulok, te ew bîst telaşê dixiştê gulok îja tey bi
 meqesê ane gorî xu tey rîsê xu bida hev, ane gorî çêkirina tilîyê bona ziha nebe, îja
50te pirtîkê xu têda dataînî xalîça xu çêdikir. Tevn çû binê darpişt tevnkirê xu kuşt.
 Tevn hate bin gurê tevnkir bû girê, tevn hate silavê tevnkir dixaze pilavê. Silav ser
 dikeve diçe çêdikin binî va tê ser mêriva xuyan dike. Ku mêriv va xuyan kir dibê
 tevn hate silavê tevnkir dixaze pilavê. Îja tê yan mirtoxê çêkî yan savarekî goşt î xaş
 çêkî, îja wî çaxî jî savar ze’f meşûr bû ze’f maqûl bû. Digo îro savarekî ça
55çêkiribûn. Yan jî wê hevrişk çêkirana. Xudê me panzde bîst roja rê nediketê ku me

serê xu kincê xu bişûşta. Me nikaribû. Mehekî tam ‘eledewam mehekî, me firsend nedidî serê xu bişûşta me ancax nanê devê xu bixara. Me digo ancax mehê em bibirin. Meha me tamam dibû me xalîça xu dibirî.

-g-

1Paşak hebûye, Paşayê Misrê bûye. Dilê Paşa ketîye qîza gavan. Gotîye illakim dilêm ze’f ketyê, gotye dê bavê xu hûnê mirâ bixazin. Paşayê Misrê Qîza Gavan? Wezîr wizareta dibêjinê dibê Paşa xaş be! tê çakî qîza gavan bixazî? Dibê na! Ew ogir e ezê qîza gavan bixazim. Dibê de tu zanî. Heft şeva def de’wata xu dike deyja 5zêr zîv ze’v jê hiz kirîye. Isa hijê kirye tacek jêra serê wê ra, tacekî zêr kirîye. De’wata xu kirye. Sê meha, sê meha Paşa kêlekê ranebûye. Rojekî wezîr wizaretê wî tèn dibên Paşa xaş be! îşê te, qelemê te, defterê te, hesabê te hemû ma cî da. Tu çi îşî dikî qe ranabî nay? Dibê welle e qet kulfeta xu têr nabim. Dibê tu z’ef paş mayî. Dibê tamam, dibê ezê îro idî werim. Radibe tê. Sal diçe zeman diçe qederek diçe 10rojekî yek tê derê malê dibêje jina wî dibê ji boy Xudê, sedeqe, dibê tê tiştêkî bidî min. Dibê tu çi dixazî dibê te hema çi hiz kirye. Wexta gotye te çi hiz kirîye çuye tacê serê xu anye daye wî feqîrî. Zeman diçe rojekî Paşa tê mala xu dîsa dibêje jina xu dibê tê îro rabî ‘eynî bûktanîya xu tacê xu bidî serê xu, xu girêdî, xu bixemlînî, xu çêkî werî ce min. Dibê ya Rêbbî! Ez çi bêjim. Dibê welle Paşa xaş be çij te 15veşêrim çij Xudê. Dibê min tacê xu fisebillah sedeqe de’f bela yek hatîye derê malê min day. Qîzê çakî, hey hewar hey medet meriv çakî tacê serê xu, zêr ew jî, dide feqîra. Welle dibê gotye tu çi hiz dikî tê bidî, mi jî gotye e çi hiz dikim, xêncî tacê serê min çi heye? Radibe herd milê jina xu dişkêne eştera bêjim, pê wê dişkêne, lê dixê dikute dibêje wezîr wizaretê xu hûnê biherin dayne serê filan rê hûnê bihêlin 20werin. Wezîr wizaretê wî hildin dibin daftînin, ewna dizvirin tèn. Dêna xu didê kewranek tê, bazirganek pêşîyê ye kewran li dûye, tê, dibê hürmeta Xudê çib te hatîye, çi xêr e, çi mesele ye, tu çima vira senî, serê vê rê? Dibê welle hal made vî karî min aha kirîye mêrê min jî min kuçaye gotîye tê biherî bigrî bavêjî serê rê werî. Ewî ku tac dayê ‘eynî ew serbazirgan bûye sed hev deve barkirî li pey bûye. Tacê xu 25daye wî da. Rastî jinikê tê dibê were we’d be ezê te biherim qenc kîm, te biherim. Wexta dibe, dibe qenc dike, ew dike dibê hizkirina te hebe, navêjê te tac daye min,

ezê te xurâ bixazim. Divê erê te mada mi birîye qenc kirîye, şterâ bêm serê wê rê xilaz kirîye ezê te bixazim. De'wata xu dikîn, xurâ dimînin, xeber didin, virda wêda dibê welle hal made vî karî dibê feqîr ez bûme ez hañime ber derîyê te te tacê xu **30**daye min, mi pê xurâ kirîn firoşan kirîye, e niha bûme xayê sed devî, migazê mi hene, dikanê mi hene çiyê min hene hene. Jinik dibê ey Rebbil 'Alemînê Mîrê Mîra! dibê hey Tu mezin î. Dimîne rojekî sal diçe zeman diçe deyja idî sala, dûr çûye çikarî bûye. Rojekî Paşa ze'f feqîr dibee belengaz dibe, ahê jina xu. Dibêje wezîr wizaretê xu dibê ezê heçta çe've min bibire ezê hinekî xurâ bigerim kanê dinya çane, boña **35**bêna mi were ber mi. Diçe hizkirina Rebbê 'Alemê Mîrê Mîra, hizkirina Xudê diçe dibe mêvanê jina xu, ew jinka ku sakî lê kirye. Ew jinkê naz nake lê jiniq wî naz dike. Ça tê jiniq naz dike. Ayja, isa kula xu mêvanê wan e, dibe êvar xurâ virda wêda xeber didin derdê xu dibêje; jina min hakî bûye, aha tacê serê xu daye, aha mi lê daye, aha birne avîtine lê daye çûye ça têra dibêjim 'eynî sakî dibêje jina xu, **40**dibêje mêrê wê. Wexta radibe sibê rê dikeve jiniq dibêje dibê welleh dibê 'eynî jina te ez im, dibê te mi avîtye serê filan rê, ev meriv, malxê mala mi jî hañye, rastî mi hañye tacê ku mi dabû wî da, ew jî hañye rastî mi hañye mi birye qenc kirye, anha nikaşa xu ser min birye niha ez kulfeta wî me. Paşa radibe tê. Dinyayê da tu nota sedeqê nîne, ew sedeqe daye, dîsa 'eynî kêrî wê hañye.

-h-

1Jinê berê ze'f xu çêtkirin. Ze'f xu çêtkirin. Mêrê wana digotne wana digo; jiniq tê rabî xu temmîz çêkî, bixemlînî, bisk tuncikê x çêkî, çe've x kil kî werî kêleka me rûnê. Werî kêleka mi rûnê. Îja jina xu çêtkir, ze'f jina xu bedew çêtkir îja kil des nedketin, kil des nedket, hezarî jinekî kil çêtkir yan çenetkir. Kil jî çakî dihatne **5**çêkirinê Xoce! Kil çakî dihatê çêkirinê. Kil roja, illakim havînê, zivistanê na! Havînê. Havînê, gere stêrk 'ezmana bireqisîyana, sayîtyê sa bîya, sayîttas. Hewa notanî sayî aha re' nayî, kil paşê dihatê çêkirinê. Gundê međa yek jinekî tenê çêdkir, Xanima jina Welo çêdkir. Ewê jî çêdkir, tañî du kevçî sê kevçî rûnê xu, qedekê berê, qedekê niha nizam laylon tev he. Qedekê berê laylon tev tinebû. Ew qedeka weke **10**mêtrokî îja hinekî zirav çêdkir, nota piltê çira çêdkir, nava wî rûnî da dikerpiçand, dixiste dîzê, dîz hebûn dîzkê piçûk hebûn. De k sa nava rûn da temmîz ew dikir! Dixiste dîzê, derxûnê dîzê dida ser devê dîzikê. Piçkekî alîkî wî boña hewa hildida

piçkekî devê wî dihîşte vekirî, ew pilte timma dişewitîî, pêva dişewitî ew dû hemmû
 xu dida derxûn, hemmû xu dida derxûn. Ku xu dida derxûn îja pilta wî xilaz dibû ew
15kilê xu danîn temmîz, firaqekî danîn temmîz derxûn dixistnê wê firaqê, êpê çêdbû
 de! Êpê çêdbû. Rûnê mala ha! Rûnê mala. Çêdbû îja wî çaxî aha laylon tinebû,
 laylon tinebû, pîne bûn. Îja kil jî nava pîna da tamam pîna digirt. Wî çaxî laylon
 tinebûn. Îja taîn dîkekî xuy du sale, dîkê du sale şerjê dikirin, ew hêta dîkê kêbirê
 da, kêbirê da jêdkirin ew postê dîkê, du sale, bi pepikê wîya derdxistin, kapa wî va
20derdxistin, derdxistin. Îja taîn êpê xoy lê werdikir, ştera bêjim, du roja xoyda
 dima, ji xoy derdxist, îja miz dida, îja miz dida, miz dida, miz dida, miz didaa ku
 miz dida nerm disekinî, nerm disekinî. Îja ew kilê xu dixiste wê, me jêra digo pêtik,
 binê wî didrût hêta wî da binî ew binî bû didrûtî, diha ha kapa wî va derket ew jî
 devê pêtik bû. A kilçîk tinebû, perîkekî mirîşka taîn çêdkirin dixistne navê, xurfa
25pê dixistne çe've xu. Lê wexta rîs reng dikirin, boyag çêdkirin ew kilçîkê xu
 davîne nava wî rengî îja reng dibû, reng dibû sa bedew dibû! Perê mirîşka. Ee, reng
 dibû. Îja niha, niha kilçîk derketine, niha kilçîk derketine. Niha yê sa bedew nota
 porsêla çêkirîne, hazir in, qul in, bême'nî bendka têra dikin. E îja kil çêdkirin, sakî
 çêdkirin îja dikşandne çe've xu. Kil sakî diha tne çêkirinê, zanî? Roja ku xu
30temmîz çêdkirin, sibê zû, çe've xu didan heza sê roj çar roja çe've wana nedçû.
 Hema sibê zû serçe've xu dişuştin, kil lêddan idî hezanî du roj sê roja kil nedxistinê,
 jê nedçû, ee lê kilê rûn bû zanî. E îja sê roj çar rojê wan tamam dibû, pênc rojê wan
 tamam dibû dênax didanê kilê çe've wan çûye carke lêddan, carke dikşandnê, ee kil a
 sakî diha tne çêkirinê.

-2-

Vebêj: Apê Adil/Adil Ulus-70 salî, nexwendî

Cî: Xornas/Karşiyaka

Berhevok: a) Bênder, b) Dewat

-a-

1Me ga girêdida ‘erd radikir îja me diçand, yek xet me diçand îja wextê havîn dihat me didrût bi dasa. Me îja dixiştê gurz danî bêderê bela dikir îja dewar dida ser, gêle dikir hûr dikir. Îja me top dikir dida bayê, genim jê derdixişt, ka wî jî me dida heywana. Zehmet bû z’ef zehmet bû wî çaxî zehmet bû. Bêderê herî hindik mehekî zêdetir dikşand.

-b-

1De’watê berê em peyatî diçûn dihatin. Em diçûn îja me dest digirt, nişanî pêda dikirin, dihatin carke din diçûne sertêdanê. Ew kesê ku tiştê, zêra, bine wî çaxî tiştê tinebû. Sê mètre dêre mêre her yekî danîn davîtin. Şirînîya xu dikirin salek dima paşê de’wata bûkê dikirin. Danîn sîyar diçûn be’lgî dibirin îja hespa kê pêşîyê derketa 5dezmaleke sor davîtne pêşîra hespa wî. Yê dima jî bê xelat diman. Îja nan didan sîyara, gore didane sîyara. Çiqas sîyar hebûna qasî wan sîyara bela dikirin. Xarina de’watê jî goşt savar bû yê ha ‘eware. Carna yê halê wan baş goşt birinc didan. Tunebûn bû, belengazî bû wî çaxî.

Vebêj: Xwedêdayê Baqî/Hüdeyda Koçak -77 salî, xwendî

Cî: Pargat/Esenkîyî

Berhevok: a) Cot, b) Bîranînek, c) Lîstikek

1Cotê berê dar bûn. Bi ga dikirin. Çar ga girêdidan. Dudu xoîk dudu amor me jêra digo gayê amorê. Dajoîtiñ heça êvarê, êvarê berdidan dihaîne malê yêmê wan didanê, disekinî roja paşîn dîsa dewam dikirin. Gîsnê wî cotê dar bûn serê dara didan serê wan tûj bûn. Dor dihaçe koçana, koçan jî 'eynî koçanê berê dar hebûn, koçanê dar 5bûn, maçîk bûn maçê wan hebûn, digirtîni, dajoîtiñ. Şeş ga wî çaxî girêdidanê, koçan giran bû. Şeş ga girêdidanê merivek jî, zarek mesela sîyar dibû boha pêşîyê bajo, karê me dewam dikir. Me das dikişand. Wextê toxim reşandinê jî textê hebûn, textê lê didan, yek ser sîyar dibû, maç digirt, jêra digo maç, ewî pey jî toxim berdday, bi sextê xu toxim berdday. Wî şeklî xilaz dikirin. Dihaçe dora dirûnê, sala paşîn, salek 10dikete ortê. Sala paşîn me bi dasa didrût. Pênc pale, şeş pale, deh pale me didrût. Piştî dirûnê me dikşande bêderê lod dikir. Bi 'erebê ga me dikşande bêdera. Îja bêder dikirin. Danîn singek dikutañ. Gayê gêlê davîtnê, dora wî heywan vedigerîya. Kam hebû yek ser kamê sîyar dibû gayê pêşîyê qamçî dikir, dajoç, ser simbila digerîya heça hûr dibû. Hûr dibû dibû ka, ewa top dikirin yeke din davîtiñ. A sa wî hesabî 15dewam dikir. Îja wextê top dikir, dida bayê bi şena. Roja ba bihaça dida bayê nanê xu hemû wî hesabî derdixist. A îja paşê derdixist, serad dikir, bêjîng dikir. Xarina xu hildda yê din difroç wî hesabî ew dikir wisa dewam dikir.

1Ayla meda du hev nêçîrvan hebûn. Yek bavê min bû yek jî kuraîpe min Kerîm bû, Kerîm jêra digotiñ. Îja rojekî bavê min hemaşa şev radibe diçe nêçîrê. Hewa xaş bûye, diçe lê dibe bager ew dibe. Sibê zû cabê dine Hecî, Hecî birê wîy mezin bû. Dibê welle Baqî çûye nêçîrê bûye bager niha xeniqî. Gundî تمام top dibin wê derê

5destê hev digrin pêşva diçin. Diçin bavê min jorda, kirê orta me w Xornasê da kirê alîyê me, kirê mey Dêrê, Dêrê jêra dibêjin wîrda jorda berjêr dibe hema hey dikeve nav kevira, hey kevîr hey kevîr heya pozê kir tê dêna xu didê qefle meriv gazî wî dikin, hey gazî dikin; filankes! Em vêderê ne, neîirse, ka tu ku yî? Bêje gazî me ke. Gazî diknê wê derê hev digrin cake din tevê hev dibin tèn. Kerîm diçû nêçîrê, **10**nêçîr dikir. Bi te'jîya diçûne nêçîrê, bê te'jî nediçûn. Kêvrîşk be, rovî be ştera bêjim nêçîr çî be te'jî diçûn. Zivistanê diçûne nêçîrê, eglebê wî zivistanê hebû, bihar bihar jî diçûn, payîzê jî diçûn lê mîta zivistanê nebû. Ziviztanê z'ev diçûn. Sîlağa bi wan ra, demaçê memaçê wan pêra bin ez nizanim lê sîlağa wan darê destê wan bû. Carna tenê diçûn carna bi hev ra diçûn nav li te'jîyê xu dikirin. Navê te'jîyê wan **15**Çelo bû.

-c-

1Me top çê dikir îja danî bi şîşîkêkî didrût. Me ji pûrta dêwêr çêdikir. Me mehes dikir, me mehes dikîir, pûrta wî dadweşîya ew pûrt me top dikir dibû pûrteke aha. Îja me destê xu da aha dikir aha dikir aha dikîir, ew dikir hişk dibû, hev digirt. Îja me post jî dikşande ser postekî ew, îja me lê dida. Destêk valî disekinî destêk walî **5**disekinî îja me lê dida. Îja qale hebûn qala me alîyê me bû qala wan jî alîyê han bû kîjan ji qalê derbas kîra ewî qazanc dikir. Destê wan da dar hebû ewî davît lê dida, ewî davît dest pê wî, ewî din lê dida, ewî davît dest pê wî lê dida kîjanî derbas kir bir çû.

Vebêj: Meta Ezîze/Azize Koçak-60 salî nexwendî

Cî: Pargat/Esenkıyî

Berhevok: a) Çêkirina Girarê b) Çêkirina Xalîçeyan

-a-

1Me berê girar çêdikir. Îja cînara dihatîn dixarin, bereket hebû, îja niha tine. Me diçû binê bêdera paqîş dikir. Me pûng davîte nava girarê. Gîhakî hêşîn hebû, goştbeş dikotin jêra me goştbeş davîte da. Wekî din me de'n dixist. Me de'n dikuta, conîya da danî davîte. Îja me nivça da dikeland. Heçta du si'et dima me radibû dew dikîya. 5Avrênc bû me toraq çe'l dikirin. Me axir ze'v cefa didît, niha rihefî ye. A niha em sirsûmê xu datînin em şuxra rûtinên. Berê sirsûmê dar hebûn, meşk hebûn. Paşê makina şîr derket. Me şîr didayê da, toxafk jê digirt îja dikya. Yanî cefayê mey berê ze'f bû.

-b-

1Em diçûne zozana mel wê derê hirî dişuşt, pez dibirî. Îja me danî liva dirîst carke din şe dikir dirîst me dikir xalîçe. Yanî me ava sûlavê pê ew dikir, em diçûn dihatîn, sar bû. Mel wê derê pez dibirî. Me danî dikire nivîn da, me danî dikire xalîçe da, me dikire çewal da. Gîhak hebû çolê. Me danî dikeland, îja hirî dirîst şe dikir dikire 5telaş îja me ew telaşê xu nava boyağê da dikir. Îja ziha dibû me derdixist darda dikir heçta ziha dibû, temmîz rind diqelîya îja me danî dihat xalîçe xu dadixistîn. Yê rîs biqedanda rîs dirîst, neqedanda qirnap çarsîyê diçûn danîn dihatîn, qirnapê spî. Me danî dihat îja me pê çêdikir. Dezagayê wî jî bême'ne sing bûn. Çar hev dikuta 'erdê. Yek liwira yek wir yek wir yek wir îja digerandin lê, digerand, jinekî digerand. 10Yek li ber serê tevnê rûdinişt. Ayja çêdkirin, dibirîn, çêdkirin yek bifrota difrot, yêku xura hildana xura hildan. Xalîçek mehekî me çêdikir, mehekî paşê xalîçek dihatê çêkirin da. Yê têkirana be'lgî, be'lgî jî heftêkî, deh roja da dibirîn. Yê têxistana xalîçe mehekî paşê dibirîn. Nexşê wî şehra danîn dihatîn lê digirtin, ferz

kim evna neqş in de! Danîn dihaþin lê digirtin xurfa jê çêdikirin, jina ber xu jî
15derdixistin yê nemûşkar hebûn. Tarîxa wî zemanê wî digotin, navê xu jî ser
dinivîsîn. Me salekî çêkir, me tarîxa wî got, me navê xu ser nivîsî. E, e min bixu jî
çêkirîye.

Vebêj: Meta Kubar/ Kibar Erçetin-70 salî, nexwendî

Cî: Arîn/Göldüzü

Berhevok: a) Çêkirina Çewalan, b) Çêkirina Riştayan

-a-

1Me hirîya xu dişkinî îja me taîn dirîst îja me çuwalê xu dadixist îja me çuwalê xu çêdikir. Ne roj ne dudu ne sisê çuwalê me dikşand. Me dibirî îja me taîn didrût, ar genim, savar me dixistê, me dibire aş. Me ar dihêra taîn hevîr dikir, hevîrê xu dipe't nanê xu dipe't. Me çuwal ser dezgeyê çêdikir. Me du dar walî dikutañ, dudu valî 5dikutañ me îja dadixist meyja ewka wî hildida îja me çêdikir. Me îja dadixist reng reng çêdikir bi kergît, neqş têda hebûn. Lê me bi kergît dikuta çêdikir. Çuwalek çar pênc roja da xilaz dibû. Du çuwal ser hev dadixistin, dudu se hev dadixistin îja wextê me dibirî didrût tijî genim menim dikir dişande aş. Min bixu jî çêkirîye. Evam çen çuwal ha bûkam hanê min anî haçe vira hê yek heye. Idî ev torbe morbe derketin idî 10çuwal avîtin nehîştin. Erê welle.

-b-

1Ez behsa rişta bikim. Me taîn hevîrê xu dikir. Me textê xu datanî, tîrax taîn tîr dikir. Yekî mînanî Zihrayê walî dihatin derz dikirin, me şirît radixist riştê me ziha dibûn me dibir datanî ser tendûrê riştê xu diqeland, me taîn dipe't dixar. Me bi kêrê dibirî 5paşê radixist. Me tenê rûn davîte navê, me dida ser dikelîya, nava avê da, me berdda kewgira xu me îja wextê ew ziha dibû me îja berdida nava rûn a didane ber xu dixarin.

Vebêj: Reşîtê Hiso/Reşit Erçetin-81 salî, nexwendî

Cî: Arîn/Göldüzü

Berhevok: a) Cot, b) Dewat, c) Eskerî

-a-

1Cotê me koţanê hesin bûn. Îja me sê gîsin davîtnê da, ‘erd pê radîkir. Ayja piştî me îja nan didrût bi dasê didrûtin îja me bi ‘erebê ga dikşand danî, meyja gêle dikir. A idî ew bû. Me du cara cot dikir. Cot textê bûn textê. Textê kêleka ha bûn îja yekî torbe genim davîte stîyê xu yek jî ser cot sîyar dibû îja ewî aha toxim dar dikir diçû. 5Gîsnê wî hesin bûn, textê wî dar bûn gîsin pêşyê da hesin bûn. Mervek ser sîyar dibû yekî jî dû toxim dikir. Rojekî da, cotê pêşyê da du donim sê donim radîkirin. Angorî dewara. Gamêş bûna ze’v radîkir, ga bûna hindîk radîkir.

-b-

1Diçûn destê qîza yekî ku digirtin, bîst kavir bîst bex yan jî mesela bîst bexê xu ku didan hespek distandin, xelatê wî, a wî karî dibû. Îja diçûn heftêkî wê derê diman îja dihatin de’watê wî dikirin. Yekî digote yê din tê qîza xu bidî kurê min ewî jî digo bira be, qîrarê xu dataîn, qelen dibirîn. Heftêkî şûnda diçûn, nîşanî pêda dikirin îja 5def danîn, zirne danîn îja dileystin, kulam digotin. De’watê da dolabê dileystin, koçerî dileystin, gelek miqamî dileystin. Gava bûk derdixistin xêlî dikirin, danîn dixistne de’watê îja xêlîya wê hildidan, bi hespê dibirin yan jî bi ‘erebê dibirin. Îja xêlî dikirin tanîn îja xêlîya wê du panot, pênc panot dixistne navê, serçe’vê wê vedikirin dikete govendê dileyst. De’watêk heftêk dikşand. Çunkî diçûne ewî gundê 10ku dest digirtin îja paşê dihatne gundê xu jî dileystin. Bûk bi hespê dibirin. Wî çaxî zêr tinebûn, gustîlê zîv hebûn. Nanê de’watê; pezek du pez sê pez şerjê dikirin îja goşt birinc, birinc tunebû savar bû, îja savar çedikirin tê digo, di xanîkî mezin da sê çar cêrge rûdiniştin, nanê wan danîn pêşîya wan tijî dikirin.

-c-

1Min du sal eskerî kir. Li Erzurmê, îja sar bû berf bû bager bû. Em bi trîne çûn, bi trîne çûn gerîyan paşê hatin wêderê pewa bûn. Îja otopêz hebûn otopêzê berê xirabe bûn. Em du roja paş, sê roja paşê derdikeşne wira. Xarina wî ze'f bû. Min du sala eskerî kir ez du cara hatme îznê. Carekî deh roja carekî jî bîst roj ez hatme îznê.

Vebêj: Xatîya Sitî/ Fatma Erçetin-70 salî nexwendî

Cî: Arîn/Göldüzü

Berhevok: a) Çêkirina Xalîçeyan, b) Çûna Zozana

-a-

1Me xalîçe, me danî rîsê wî, me darîk çêdikir orta darîka kort, me ewa hirîya lê dialand, rîs lê dialand heşta vira, me kêr didayê, bêjîngek tijî pirtîk dikir daşanî pişt dargurê wê, me danî wira îja me serê tayê xu danî, me xalîçe xu çêdikir ku rîs bin derê îja kîjan hosta bûya digotî nê reş bavêjê, tê spî bavêjê, tê car bavêjê yan tê 5heşta bavêjê yan tê rindo bavêjê. Îja wextê me ku serî da lêdida me kergîtê xu aha lêdida, me lêdidaa em diçûne serî, carke din me tayêw aha dikşand dihatê ber. Me carke din îja pirtîkê xu çêdikir. Me tevnê xu ser dara daşanî, gura wê hebû îja em sê çar jin ser rûdiniştî n. Mi valî çêdkir walî çêdkir vira jî hostayê me li pêşîya me bû. Digo tê çara daynî, tê rindo daynî, tê kesk daynî, tê qîç daynî îja digote me îja çar 10bûya pênc bûya îja me daşanî, yek bûya me lingê wê daşanî îja me xilaz dikir îja wexta birînê me kêr davîte jêdikir. Me neqş jî davîte, îja piştî kene mal idî me xalîçe terk kirin îja me çuwal çêkirin. Hosta ku ze'v bûya xalîçe mehekî, xalîçeke giran ne ewnê sivîk, mehekî da xilaz dibû. Jin ze'v bûn. Çar jina mehekî da xalîçek xilaz dikirin. Me diçû çêre diçînî dianî, mozîk, jêra digotî n mozîk, me danî dikeland. Me 15dixîste sîtila dikeland. Me telaş davîte navê, ew ta dibû dibû mîna qîr. Mej navê derdixîst sibetîrê me davîte tendûra kartû, îja me dixîste wê sîtilê me dixîste ew bêrê kevn, hesinê kevn, zincîrê kevn ew dixîstne afirê tewlê têda dima zeng digirt, me diçû ew çêre tañî ew telaşê xu hemmû ava wê çêrê da dikeland, ku dikeland me dixîste sîtileke mezin ewê ava reşîk me berdda ser, me berdda ser devê wê digirt. 20Me berdda tendûra kartû me digo bira rengê wî nereve. Me derdixîst radixîst ya Rebbê 'Alemê! Neqşê wê wisa digirt ew ta jî wisa bû dibû dibû mîna qîr. Îja qeynek çêdikirin, nok çêdikir, mewûj danîn îja hêjîr danîn îja me wisa dixar ha sifetê me hinde bû.

-b-

1Zozanê me Kolîkê bû gundê Kemal Begê, Cemal Begê. Em diçûne wira zozana îja makina şîr hebû. Berîya wî me dew dikîya bi sirsûm. Em sê meh çar meha zozana diman. Me pêz xayî dikir, çarsid mîh me dibire zozana, em çar jintî bûn çar qîz bûn. Xasî bû. Me zozana kêşk digirt, me toraq digirt, me pêner digirt, me sîpênc teneke 5sîhevç teneke rûn taîn, me îyara da digirtin. Me toraq berê ewilê dixiste avrênc, girîyê pêner datîin navda heça devê wî digirt. Wextê ku têda nerm dibû me sibetirê îja radîbû dixiste, me hildiçand, me dixiste piştepez me dataîn, hildida devêw weldigeran, hingilê wî me weldigerand me digo bira kurm nekevnê. Îja kaw kubar morîyê hêşîn me ewê wan va darda meçgo bira nezerî nebin. Îja zozanekî xaş bû.

Vebêj: Hecî Bekir/Bekir Keser-93 salî, nexwendî

Cî: Arinçkûs/Kavuştuk

Berhevok: a) Eşîr, b) Dewat, c) Serpêhatî, d) Cot

1Navê gundê me Arinçkûs e navê teze lêkirine, danîne Qavûştûk, navê gundê me anha qanûnê da Qavûştûk e. A îja em haîna xu ku bêjin. A îcarê ku em ji Dîyarbekirê haîne tabî Bekirî ze'v bîye, 'eşîreke mezin bîye, 'eşîreke giran bîye. Îja me tamamî gundê Dîyarbekirê hildane bin zevta xu. Tabî zemanê agalera bîye 5zemanê berê bîye, ji me'ra goîne mej wan bihîstîye. Îja desta me, nivî Bekirî ji wir em haîne derketîne vî memleketî, ji Dîyarbekirê haîne derketîne vî memleketî. A ya me bixu jî em çûne derketîne Îranê. Niha hevşîyê me malê me li Îranê hene. A ji Îranê wexta ku niha îro mesela bi hev ketîne haîne derketîne, em haîne Turkîyayê. Em li Ebegê, navê gundê me Tîrşîk e, Tîrşîkê Mihê Baba dibêjin me Tîrşîk ava kirîye 10em têda rûniştîne. Wextê me Tîrşîk ava kirîye em Tîrşîk da rûniştîne, zeman derbas bîye, êl 'eşîr dîsa li hev ketîye. Êris zor daye me, em ji ber Êris revîne, haînin derketîne Erdîşê. A ji Erdîşê jî zemanê agalera bîye, zemanê mezin bîye, zemanê Hiseyn Paşa bîye, zemanê mesela em bêjin van agalerê mezin bîye. Em haîne Erdîşê, wexta em haîne Erdîşê em Çelîbagê mane, Çelîbag wî çaxî metrûke bîye em 15têda mane. Em têda mane tarîx, zeman derbas bîye Hiseyn Paşa rabîye de'wa paşatîyê kirîye. Wexta Hiseyn Paşa de'wa paşatîyê kirîye, Hiseyn Paşa rojekî ji qewmê xurî dibêje, dibê; emê he'me ser, li Gamêşvana Panosê şer çêbîye, dibê emê herin Heydera, em Ademî ne mesela Me'rxura w Laçekîya filan ev 'eşîrê han jî Heyderî ne. Gotye şerê Heydera w Adema emê çêkin. Yanî gotye ez Paşayê Heydera 20me Adema jî di berda rabûne serê xu quloz kirine emê wana bi'tewînin, nahêlin serê xu hildin. Aa zeman derbas bîye, kirine şer. Kirine şer, Hiseyn Paşa di Panosê da rûniştîbûye muqabileçîyê wî çûne haîne go welle Adema zorê dine Torîne, Adema zorê dine Heydera. Hiseyn Paşa go wî çaxî ezê wan sîyara bişînme pey 'Evdilmecîd Begê Sîpîkî, 'Evdilmecîd Beg merivekî navpêketî ye, mêrxas e were piştî me bike em

25berne Adema. Hiseyn Paşa wexta ku xulamê xu şande pey ‘Ebdilmecîd Begê, xulamê wî hat go çi gotye? Go Beg gotye; “Sibê êvarê ezê werim.” Go Hiseyn Paşa gotê xulamê xu go; “Kuro me neheqî kir, mêrê Ademî taca serê mi bû law, mi çima ha kir? Kuro ez ber bextê Ademî me, tedî mi yeke ça kir?” Ê go Beg, xulamê wî gotê, Mikailê Verekaz digotnê xulamê wî bû, go; “Te gotye em jî çûne, meb gotîna te 30kirîye tu meb gotîna kesî nekirîye!” Go sê roja, go wextê ‘Evdilmecîd Beg hat hewarîya Hiseyn Paşa go ji Hiseyn Paşa pîrsî go; “Ji ‘eşîrê Adema mêrxas kê ye?” Go, “Mêrxas Bekirî ye, Hemoyî ye.” Go, wî çaxî ku Bekirî w Hemoyî be, pêsîra ‘Evdilmecîd Begê berdme pêsîra wana belkî ew qedrê ‘Evdilmecîd Begê dişkênin, ‘Evdilmecîd Begê ji nava me direve diçe kuro Ademî taca serê min e mi yeke ça 35serê xu kir! Mi çima ‘Evdilmecîd Begê anî berda ser serê Adema ‘Evdilmecîd Begê mêrxas e. Careke dinê go, gotê xulamê xu go; “Kuro ka sibe ye, dûrbîna mi bînin e li çiyê binhêrim şer ka qe ça bû?” Go dûrbînê nihêrî, dêna xu dayê sîyarek ji wêda bi zengîya tê. Gotê xulamê xu gotê Mikailê Verekaz, go Miko lew, sîyarek tê ema ji me ye j Adema ne j Heydera ne kê be ez nizamim. Go sekinî dêna xu day sîyar 40hat, sîyar ji mala ‘Evdilmecîd Begê Sîpkî. Go, bavo te xêr e? Go, “Welle Beg, Paşa selama Beg ştera heye, Beg gotye ez nikarim bi Adema ra tême şer, Ademî agir e bi mi ketye, yanî ji Bekirî ji Hemoyî ji ‘Îskî, mesela ji van ‘eşîrê mezin ra. Beg jî parava tê, vegere here dewsa xu.” Ê go de wexta Beg tê, kuro go here paytona mi girêde, gotê xulamê xu, go lew em hewarîyê herin. Beg hewarîya me hatîye da em jî 45hewarîya wî herin, em gere herin derbas kin. Go heça paytona xu girêda Beg hat derbasî Dutaxê bû, Dutax qezakê mezin e, qeza begleran e. Go wexta ku çû Dutaxê Hiseyn Paşa pey çû. Beg gotê xulamê xu go; “Kuro li vê qûçê bisekinin, Hiseyn Paşayê hewarîya min were bira were mi bibîne.” Go, xulama dêna xu day paytona Paşê derket, sêçar meriv li ser in go revîn go go, Beg! Welle bi serê beg Paşa paytona 50wî derket. Go paytona Paşê hat?, go erê. Go Kuro! Deyja qapûtê mi bavêjne nav milê mi, kursîya mi dayne orta odê, tivinga mi dayne ser çoka mi, qema mi dayne ber piştî min, demaçî mi têne ber gîzma min, ezê lingê xu ser hev ra badim bira Paşa bi feqîrî min nevîne. Go derê malê peya bû, go ew xoit jî jê derket. Go ‘eynî wan jî wisa kir. Go çiyê ‘Evdilmecîd Begê di orta odê da çekir, go mesela berê wî dane 55alîyê derî, demaçî wî kirne ber gîzma wî, gîzma wî lêkirin, qapûtê wî anîn, qapût ra wî çaxî digotî apince, go apincê wî avîtne nav milê wî, pê xu ser hev ra avît. Go

Hiseyn Paşa derî vekir, dêna xu dayê ‘Evdilmecîd Beg bi wî awayî rûniştîye. Go; “Beg! Mi bihîşt tu birîndar î, tu birîndar nebûyî êê baş e şikir welle tu wê haftî.” Go ‘Evdilmecîd Begê goşe Hiseyn Paşa go; “Hisoyê Kîr tu rûnê e teşa meselekî 60bêjim.” Go wexta rûnişt go Hiso! te pêşîra mi îro şande nav pêşîra êgir. Hemoyî w Bekirî agir e bi mi ket mi pê nîkarîbû. Hema ancax mi xuj destê wan xilas kîr, welle ez ne birîndar im. Welle şikir kêfê te wê xaş in, demaça te. Go tamam ez birîndar nebûme, mi wisa kîr ku ez ji nava alava wan derêm. Îja eva şera ku paydos bû. Em haşîne Zarûkê Çelîbagê. De merivê me jî nava şer da hebûne. Îja Hiseyn Paşa 65bihîşt ku em haşîne Zarûkê, yanî Çelîbag Zarûk kanîk e li bin Çelîbagê ye. Go, kuro bişînin Bekira bînin werne vira da! Xulamê xu şand. Em, desta me em haşîn nivê me Axçirayê ma, nivê me haşe Arinçkûsê. Aa îja ji meşa ayha goşin, go: “Hûnê bibin eskerê min, erê hûn Ademî bin jî lê dîsa ez hiz we dikim hûn eskerê min in, hûn birayê min in. Arinçkûs ji Şebabê Mihê Baba ra, Axçira ji Ûsivê Me’ro ra, 70evana aqayê Bekira bûn. A welle dane me, a niha em têda nin, heşanî, eva gundana wesyetê Hiseyn Paşa ne. A welle me w zarê mala Hiseyn Paşa bi hev ra biratî derbas kirîye heşa îro jî em mîna bira bi hev ra derbas dikin.

-b-

1De’watê zemanê me, mesela kurê min qîza cînarekî me dixast em bêjin. Em diçûne mala wî mervî, me jê misade dixast, me sêrî, ‘ewil da me ‘işaret diday ku emê werin, misada te hebe emê werin emê destê qîza tî j kurê xura bigrin. Ewî jî hiz dikir. Em diçûn rûdiniştînin me digo deyja qelenê wê bêjin, îja wî çaxî usûl ‘urf ‘edetê ‘eşîrê 5qelen hebûn. Qelenê wê digot, qelenê qîza xu digot. Yan pêncî kavir digot, pêz digot, pere nav da tunebû, zêr jî na. Yan pêncî kavir digot yan sî kavir yan çil kavir digot, tabî Xudê jî qeder dikir, me fathek dixand em dihaşîne mala xu. Neh deh roja dima îja em diçûne sertêdana wê bûkê. Me jî destê xu da çi biribya dibir. Me mesela fişan dibirin me, zêr hebya, zengîn hebûn zêr dibirin, feqîr hebûn qe tiştêk 10belengaza mesela dêrek dibirin. Fişana ra wî çaxî me digo dêre. Îja mesela wexta salek, şeş meha, heft meha ew bûk mala bavê da dima, me qelenê wê dida bûka xu şanî. Îja de’wat, de’wat di xanîkî da dibû êvar mesela de’wat digerya, cergûbez bû jin u mêr tev dileyîştînin. Def zirne paşê çêbûn, dengbêja kulam digotînin. Ee, dengbêja

kulam digotîn. Qaîdê papûrê hebû, qaîdê dolabê hebû, qaîdê mesela laçîbene hebû
15eva tîştana hebûn e. Jûlo hebû jûlo qaydekî giran bû îja dileyst, belengazî dileystin
sa, ê mesela ev qaîdana hebûn. Bûk bi hespê taîn, bi ‘erebê ga taîn. Wî çaxî wesaît
tunebûn. Mesela ji vir em diçûne Axçirayê, me mesela bûka xu li ‘erebeke ga sîyar
dikir, sê çar sîyar bi rex diketin, dileystin, bi def bi zirne, ku def zirne hebya, def
zirne tinebya dengbêja kulam digotîn. Xêlî hebû, bûk xêlîkirî bû. Kesî serçe’vê bûkê
20neddît, heştanî êvarê dihafe govendê, xortek, mesela zengînekî notanî te ya deh
pañot yan pênc pañot anî dikire qulçê xêlîya wê girêdida, serçe’vê wê quloz dikir
cima’etê teva de’watê da ew bûk didît. Dîtîna wan bûka jî wî zemanî wisa bû. Zava
nedkete milê bûkê, şerm bû, digo ‘eyb e pêş mezina. ‘Eyba wîçaxî, şerma wîçaxî
ze’v hebû. Hine hebû, destê bûkê hine dikirin. Xarina wî çaxî, pezêk şerjê dikirin,
25savar çedikirin, goştê pezê dikirin xarin, hema savar goşt bû. Serde’watî hebû,
merivekî mezin kivşe dikirin digo tu serde’watî yî. Mesrefa vê de’watê çi hebe li
stîyê te ye. Ayja xayê de’watê ji wî mervî ra yan beranek dişand yan gâk dişand yan
dewarek dişand, mesrefa wî zêde çêbûya. Mesela bûk em bêjin li Sarixsûyê ye, ji vira
heça Sarixsûyê mesref ze’v çêbûye a wî çaxî heqê wî serde’watî gâk e weyaxut
30çêlekek e. Em bêjin li Axçira ye, heqê serde’watî beranek e. Tîştêkî wisa. Eê belê.

-c-

1Nexaşîya ku wî çaxî da ze’v girane ku çêbûya, tabî dixtor tinebû, qîta dixtora bû
medgo nexaşê hal e, me navê wê nexaşîyê danîbû nexaşya hal. E medgo yan radbe
yan ranabe. Yanî nexaşê hal me’nê wî ze’f in yanî nexaşîke giran e.
Kûrêkî min nexaş bû min ji vira bire Erzurmê. Ji Erzurmê, qedera Xudê tamam bû,
5sê roja ma, min hîşt ez haşme vira gund, li gund jî cab dane mi go were gede dimre
berteref e, bira were kûrê xu bihere. Zivîştan bû. E çûm, ej vira çûme Erzurimê.
Erzurmê, gede ze’v nexaş bû, gede derxistin dane min. Mi gede da pişta xu ez haşim
herim ber otopêzê, mi gede avîte otopêzê. Em haşin l Erdîşê peya bûn, bager e,
qîyameş e. Orta me mala Kamil Axa jî xira bûye, em hev ra neyartîyê dikin, hema
10kes kesî ra xeber nade. Min gede da pişta xu e çûme mehlê, mehlê maleke dostekî
min hebû, em lê bûne mêvan. Ew dostê min jî kirîbê zarê min bû zemande. Erê gede
rojekî ma, çû rehma Xudê. Çû rehma Xudê, min gede cinazê wî avîte ser ‘erebeke

hespa wî çaxî hebû, min avîte ser ‘erebê, ji Pilûrê me anî haçe nava Erdîşê. Erdîşê jî min, teksîya kûrê ‘Evdilayê Gulîstanê hebû, ticarê Erdîşê da zengîn, ticarê bi nav u **15**deng mala ‘Evdilê Gulîstanê bû. Min teksîya kûrê ‘Evdilê Gulîstanê girt, em haşin, em haşine heşanî Goma Reîs, jêra digotîn Goma Reîs, em wira carke din zivirîn. Ew şev gede ma teksîyê da sibê carke din bi teksîyê me hilda em haşin, em haşin rêya gundê me tinebû em derketne Kanzoxa. Em haşne Kanzoxa, mala xezûrê min Kanzoxa da bû, em mane wê derê mêvanî, sibê em rabûn, ‘erebêke hespa hebû, **20**mee, xizek jêra digotîn, me xizeka hespa dane me, me gede lêkir em bi rex ketin. Em sî çil peya. Peya pêşîyê lêdidin cinazê gede pey me tê, cîyê ze’v asê be bêr mêr meşa hene em vedikin tên. Em haşne gund, me cinazê gede anî haçe gund bi wê ah zarîyê bi wê belengazîyê. Me idî mirina gede ji bîr kiribû, îja ‘eçeba emê ça herne gund ka? Ji berfê, rê tunebû, qirêder tunebûn, rê venedikirin, kesî rê venedikir. Me **25**‘erebe bi rêda dikşand, me xu dida ‘erebê kaş dikir. Aa wê belengazîyê em haşin derketin.

-d-

1Coşê mey berê dar bû. Darekî dirêj hebû dikirne gewrî yek jî li binî ddan digo şûn maçê wî çêdkirin bi kûrmancî, jêra digotîn coş e. Îja me ga lê girêdidan. Hine coş hebûn me du ga lê girêdidan hine coş jî hebûn me çar ga lê girêdidan. Ewê zengîn çar ga lê girêdidan, ewê feqîr jî du ga lê girêdidan. Îja me sibê, me malê herekî me hine **5**toraq dikire nava nanekî dida pişta xu, belengazî bû, qit bû, wesait tunebûn, zamanê wesaita nebû. Me nanekî hine toraq dikire nav, dida pişta xu em diçûn me coş dikir heşta taştêya. Me ew nanê xu dixar em tî dibûn îja tîbûna dihaşne felaketê, mirinê îja mey çe’vê xu bigeranda, ‘eçeba li kêderê avek heyê ku em bixun? Hine cara av digiştê me hine cara me tî, belengazî tûk devê meda dibû notanî toraq disekinî. Me bi **10**wê belengazîyê roj coş dikir em êvarê ancaax me dida pey ‘ereba coşê xu em dihaşne malê. Emê bihaşana malê me av dixar, me nan dixar, serê xu daşanî, îja di nava wê xalîyê di nava wê westandinê da tê digo qey em nav organ doşeka da ne, hinde li me xaş dihaş em radizan. Welle me coş dikir hema wisa bi belengazî bû. Gîsnê coş hebû, shehera esnafa difroşin, me şanî. Rojekî da bi du gaya cîyê du koda **15**yan kod nivî ancax radikirin. Wextê ku me toxim davî dîsa ‘eynî textê hebûn. Me

coţê xu tañî textek li valî yek li walî dida, texte dirêj bûn. Li coţ sîyar dibûn, mîta ça meriv haşa li kerekî sîyar be kera xu bajo. Dajote rast diçû merivekî jî torbe genim davîte şîyê xu li pey toxim dikir li pey diçû. Diçûne wî serê zevîyê a carke dinê dizvirîne ser xeşa xu carke din dihaţne ser xeşa xu dihaţne vî serî, toxim jî pey dihaţ 20reşandin. Kê derê toxim xilaz bûya coţê xu didane sekinandin dihaţin, ji têrê hine genim hildidan dîsa dibirin dîsa diçandin. Têra xu tijî genim dikir dibire serê zevîya xu, yan kera xu dikir yan 'ereba xu dikir me dibire serê zevîyê. Yanî ze'f ah zarîke belengazî me kişand zemanê xu.

Vebêj: Meta Hemaîl/Hemail Keser-70 salî, nexwendî

Cî: Arinçûs/Kavuştuk

Berhevok: a) Çêkirina Keşke, b) Çêkirina Kulav

-a-

1Me genimê xu dikuşa, me genimê xu dida ser, me fasulye, nok dixiştê navê, goşt dixiştê navê, me dixiştê keşik dikuşa dixiştê, beroşa xu dida ser dikeland me dixiştê keşke. Ê, birê xurâ bêjim welle me savar dixiştê sîtila, du sîtil sê sîtil me kuç dikirin. Me savarê xu dikeland, savarê xu dikuşa, savarê xu dihêra, tijî firaqa, torba dikir, tijî 5dikir. Niha idî ew rabûye, tişt miştê wisa idî nemane, idî ew rabûye. Welle bira me hirî dişkinî, me xaliçe çêdikir, me werîs çêdikir. Me cefa îzdrab me ze'f, heţta tu bêjî me dît. Bûkê niha yê berê jî yek nebûn. Bûkêk a ser pîya bisekinîya heţta te negota bûkê rûnê! ew bûk rûnedinişt. Ê niha sa nîne, dewreke xaş haţîye, dewreke temîz haţîye, dewreke baş haţîye. Ya me belengazî bû. Ji bera ji bêdera ji çawê devê 10dewara ji kam gêla em xilaz nedibûn. Qurbana birê xu me.

-b-

1Limûjen dihatne gund. Wexta limûjen dihatne gund medgo welle îro kulav dora me ye. Me diçû limûjen dianî, me liva xu dianî limûjena dijeeend, ew liva me xilaz dikir, rojêk du roja da dijend xilaz dikir. Pîştî wê, ew kulav davîtnê, ew kula davîtinê îja çend gencê ha du şeva heţta sibê lêdixişt. Ew kulav lêdixişt, ew kulav ji borê 5derdiket, me kulavê xu derdixiştin radixiştin ziha dikirin, me kulavê xu dipêçand, hildidan. Bi Xudê, a xaliçe jî me dadixiştin, xaliçe me yek mehî 'erdê diman. Me zibare digirtin me çêdikir yanî zecra me ye berê ze'f bû. Kulavek du roja da xilaz dibû, du roja da xilaz dibû. Kulavekî ra panzde kilo hirî diçû, deh kilo diçû, kulavê normal deh diçû. Kulavê mexse vê odê bigirta panzde kilo şanzde kilo diçû kulava. 10Çadirek radixiştin, ew liva ser radixiştin îja bi neqş îja rind. A ser radixiştin, çêdikirin ew kulav davîtnê, du roja wan genca îja dikuşan. Me ser şiv çêdikir, xarin

çêdikir, de'nû dikelandin îja ew kûlav davîtnê. Îja kulam digotîn, de'waţ dileystîn,
qeynek çêdikirin, de'nû çêdikirin a îja ew kûlav davîtnê, ew kûlav du roja da
derdiket.

Vebêj: Mihemedê Reşîd/Memed Keser-80 salî, nexwendî

Cî: Arinçûs/Kavuştuk

Berhevok: a) De'wat, b) Bêder, c) Cirît, d) Çarix

-a-

1De'watê berê ez qurbana te me, diçû destê qîza filankesê digirtin. Qelenê wê çîdbû dibirîn. Midet daşanîn, mehekî yaxut salekî, qelenê xu didan, de'wata xu dikirin. Sîyar dikirin, sîyar dibûn, be'lgî danîn îja de zemanê berê, be'lgîyê zavê dibû îja danîn dihatin. Bûk peya dikirin îja de'wat dileystin. Dengbêja digo, dengbêj tinebûna 5şeyî hine de'wata def zirne digo şuxra lêdida, erê. Birê xura bêjim, a wisa dibû, de'wat wisa bûn. De'watê berê bi hespa dikirin, 'erebe tinebûn. Bûkê hespekî dikirin, sîyarê dinê sîyar dibûn li kêlekê diketin. El Cergeşînê me wê derê be'lgî hildaye anîye Arinçûsê, bi hespa, erê welle. A wisa bû, 'edetê berê wisa bûn. Zemanê berê xaş bû, xazila xêrê Xudê ra hema niha wisa bîya, erê welleh. Sîyar peya dibûn, bûk 10diçû hundur, sîyar top dikirin, nan dida wan, nanê de'watê didan. Herkesî nanê xu dixar radibûn, hineka dileystin, derketine cirîtê, cirîta hespa. Cirîta hespa dileystin heşaaanî dereng, dereng diçûne malê xu. Serde'watî hebû. Hem serde'watî hebû hem berbû. Kê dibû serde'watî jina wî dibû berbû. E kê bibya serde'watî jiniê dibû berbû. Qelenê wî çaxî kavir bûn, pêncî kavir, çil kavir, sî kavir. Kavir bû wî çaxî erê pez 15bû. E wisa bû.

-b-

1Wî çaxî bêdera nan dighîşt, me bi dasa didrût. Me pañzde, hema nêzîka mehekî bi dasê didrût. Piştî ku me didrût, me xilaz dikîir meyja mey bi 'erebê ga bikşandana. Neh deh roja jî bi 'erebê ga dikşandin. Piştî 'erebê ga me part dikir îja mey bêder kîra. Îja deh pañzde roja jî bêder dikirin, bi dewara, ee, bi dewara me gêle dikir. Ew 5gurz me 'erdê radixistiin îja me dewar didane ser bi dewara me dikuta, digerland, dikuta. Paşê îja topî ser hev dikirin, bi şena didane bayê. E bi şenaa didane bayê, ew genim ji nava kayê derdixistin. Ez birê xura bêjim, welle halê me jî wisa bû. Bêderek

pañzde, hema nêzîkî mehekî dewam dîkir, zanî, bi dirûn mirûnê va hema mehekî
temam dîkir. Îja me genim derdxist dida bayê îja serad danîn jina serad dîkîir xurâ
10hilddan, dixistne çewala xurâ hilddan. Yê zimhêr jî dibirne aş xurâ malda dihîştin.
A halê me jî wisa bû.

-c-

1De'wat bela dibû, de'wat kû bela dibû, sîyara nan manê xu dixar, deyja yê rabin
dekevne cirîdê jî, de. Serîkî xu dida vî serî yê din alîyê wî serî disenî. Îja sîyarek
dihat, yekî dida ser yekî dihat. Deyja bi cirîda dañanîne hev. Me cirîd dileyst hetta
'aciz dibûn idî da. Bîst, sî sîyar bûn, sîyar ze'f bûn, hesp ze'f bûn. Destê sîyara da
5şivkê zirav hebûn. Ewî şiv davîte yê din eger şiv lêketa derdiket. Yê kû lêxista digo
ew sîyar jêhañî ye, cirîdê xaş dileyze.

-d-

1Meb postê dewara me danî çarix çêdikirin. Wî çaxî me lingê xu digirt, îja me danî
çêdikir, didrûtin, me pozîk wana, me 'eynî, lêhê, me dora wana jêdikirin pê pozîkê
wan didrûtin. Wexta k dewarê xu post dîkirin îja postê xu xoy dîkirin, didane ber
tavê 'işk dîkirin, kû 'işk dibû tabî 'işk dibû carke dianîn dihañin nerm dîkirin, nerm
5dîkirin îja dixistne zol. 'Eynî mîna zola çêdikirin, dixiste zol, dixistne çarix. Ane
gorî pê wî danî me dora wî bi ewê, bi kêrê, şûna wê bi bend, me qul dîkirin, bi şûjinê
me ta têra derbas dîkir. Çarixek me mehekî dixiste lingê xu, îja çarix 1 lingê me
dernetket 'işk dibû, lingê me dibû avlik, dernetket, mehekî meña diçû. Ew îja me danî
pence dîkir, pence dîsa 'eynî çarixek me dida ser meçgo bira kelem lingê meña
10neçin. E bira kelem lingê meña neçin. Çarixek havînekî diçû. Erê erê havînekî
diçû.

Vebêj: Hecî Bekir/Bekir Gönültaş-80 salî, nexwendî

Cî: Arîn/Göldüzü

Berhevok: a) Cot, b) Çûna Bajêr, c) Çûna Aş

-a-

1Zarîfya me da bi ga cot dikirin. Ga girêdidan, gamêş girêdidan, pê cot dikirin, koşan dikirin. Bi hespa jî diçûne nêçîrê, nêçîr dikirin, dihaşin. Bi hespa diçûne gunda, li gunda diçûne nêçîra gura, gur digirtin, dikuştin, taşin. Bi hespa berddane gura, digirtin, taşin, dihaşne îja derê malê îja girêdidan, kelb berddanê, kûçîk berddanê, 5çîka digo, ewî digo kelbê mi jîhatye ewîj digo kelbê mi jîhatye.

Cot, çar ga girêdidanê. Cotê berê yê dar hebûn. Çêdikirin, gîsin serî didan îja xura pê cot dikirin. Mehekî da sed dolim ancax, sed pêncî dolim ancax xilaz dikirin.

-b-

1Zarîfya meda em diçûne şehir, wesayît tunebû. Xurçik hebûn. Cemekî wî çû parava ser pişta meriva cemekî w dihaşê pêşîya mêriv se milê me. Em diçûne şehera. Çar pênc hev em digîştine hev em diçûne şehir. Me tevdîra xu didît. Mervek tenê dikaribû şehir? zivîştanê bager dibû li çola diman. Em çar pênc meriv dibûne yek me 5diçû tevdîra xu didît, em rojê da vedgerîyan dihaşin. Îja me êmîş dikirî, me tevdîra malê didî, em bêjin; şeker, çay... tevdîra malê me dikirî îja me davît stîyê xu em carke îja dihaşin. Deh ro, bîst ro, mehekî, du meha şûnda em carke diçûn. Em zivîştanê jî diçûn, havînê diçûn, biharê diçûn îja me diçû tevdîra malê xu didîtin em dihaşin. Îja ku gund nêzîk bûna em derdkeşne malê xu, demekeşna em çolê diman. Îja 10em diçûne gunda li mala dibûne mêvan, em sibê radbûn dihanê mala xu. Em peyaşî diçûn dihaşin, wesayît tunebûn.

-c-

1Geñim, aşê avê hebûn. Gunda, Sîpana, ji Elcewazê virdatir. Em diçûne wira îja em bi heywana diçûn, bi ga diçûn, bi ‘erebê ga, bi dewara, heşa hizûra te bi guhdirêja. Me bar dikir diçû me nanê xu dihêra em dihatin. Heqê aş me geñim dida. Çûn hatîna me, em rokî diçûn, em şevêkî du şeva di aş da diman geñim kû ze’v bîya, em bi **5**‘erebê ga biçûna, aşê avê bû. Giran dixebiî, merivek tenê, dor tinebû, hine roja em çar roja pênc roja diman paşê dor dikeşe me. Hine cara jî em diçûn dor hebû me dihêra em teda şevêkî diman sibê em dihatne mala xu. Me çewala da geñim dibir, çewal hebûn, têr hebûn. Du hev çewal bi hev va bûn. Ewa yê guhdirêja bûn, ga dikirin, kera dikirin, her cem tijî geñim dikirin davîtne ser pişta heywana dibirin. **10**Çewal jî me davîte ‘ereba dibir. ‘Erebê ga. Me ar dihêra me dixiştê wan çewala, dadigirt, me davîte ser pişta heywanê xu, ser ‘ereba xu me tanî derê mala xu.

Vebêj: Fatmaya Kamil/Fatma Toğal-70 salî, nexwendî

Cî: Axçira/Akçira

Berhevok: a) Çûna Zozana, b) Çêkirina Xalîçeyan, c) Dewatên Berê, d) Şînên Berê

-a-

1Em diçûne zozana. Me malê xu dibirin Miğarê datanîn, îja Miğare gund e li ber e, Gulîzer, jorê ye. Ayja em diçûnê meyja pèzê xu li wira diçêrand heştanî payîzê dadgeryan dihatin. Îja me zegîra xu digirt. Em biharê diçûn heştta payîzê pèz stewr bûya em dihatin. Sê çar meha dikşand. Me wira xanî çenedikîr, çadir bûn, em 5çadirada diman, ayja me pèz bexê xu diçêrand, ewkêk jî Celalya jî binya meda bûn. Zozanê wana jî binya meda bûn ew jî dihatin, ji welatê jêrê niza jku dihatin, ew jî digo em seba çêrandina pèzê xu tèn digo em seba zegîrê nayên. Îja pèzê me hindik bûn. Jiniê go ka xazila eva go bizinê maleke pèzê wî ne go xazil xura debo rûn bigirta. Jintîya min wana kenîyan. Go çira kenîyane? Go welle sê debo rûn girtîye.

10Go pîî! ew ê şivana tev pèz xarine. Bi me kenyan, jinekê Celalya, go welle em seba zegîrê nayn em heqa jî na go biznê me weke pèzê wê ne, pèzê mi sed pèz e. Îja em hatin, Mala Miğeme Saliğê tîyê min bexê wana sed bex bûn, bexê me jî deh pânzde bex bûn. Îja Naîf piçûk bû diçû ber, kûrê Miğeme Saliğ herro bexê xu tanî tev dikir ew diçû Miğarê herro herro. Rojekî bi mi rojekî ez nikaribûm qîza jintîya mi

15çû, êvarê bexa veqetînin, hat welle Fatê bexêke te tev tune. Mi go qey êvare nayne xuyanê. Go welle me nedîne. Sibê zû dîsa rabûn geryan ew her qîzê me çûn go welle libek tine. Çûne Warê Mikaîla dênax danê ew pânzde bexê me temmam gura xarine. Yeke mala Miğeme Saliğ tenê tev bû, erê welle. Sed bexê wan bû pânzde mi bû, e idî niza veqetandibûn niza çikarî kiribûn, hiştibûne cîda, gede piçûk bû fe'm nekiribû.

20Anîbûn îja, bexêk birîndar bû, mi dêna xu day ejî hema ber derê çadirê rûniştibûm digiryam ew jî çûbû bexa digerya. Anî ewa bex, Hecî hema anî bex ber min 'erdê da go welle eva jî bexa nahêle, birîndar bû lê hê birîndar nebûbû. Anî îja Hecî Soro go welle ew bexa jî gura bizanibya, yeke Miğeme Saliğ xaribûn, go bizanibya ew bex ya

Mehme Salih e gura ew jî nedxarin. Go hew zanibye ew jî ya Fesoyê Feqîr e. Erê
25welle.

Zegîre; me penêr digirt, me toraq digirt, keşk digirt, rûn digirt lê em seva zegîrê
diçûn. E, îja Zozanê Gulîzer tevayî kirîbûn. Me jî welle perê xu dabû. Kesekî me jî
tinebû. Apê te se mi zewicîbû, sê jin anîbû. A welle, ewk bû Fesîh, tiştêk destê meda
tinebû me bêşa wî dida. Go emê Gulîzer bikin, erê kirîn me bêşa wî dida. Wextê
30firotanê pere merê kesî nebû. Wextê em diçûne zozana motor nedçûn, lê rîya wî
tinebû. Heke nizam teze çekiribin. Heça Migarê wesaîta dibirin, idî wekî dinê heşa bi
barê kera dikşandin. Nivîn mivînê xu. Celalya hema jî warê wan alyê me wêda bûn,
heçta sibê li pişt kera penêrê xu lêdikirin, tanîn dibirne Migarê, dihatne Erdîşê
difroşin. Wesaît nedçûn. Wesaît nedçûn ku meriv hildikşya, çîya bû, hema ha çîyakî
35biilind bû, rê pêsîra çîyê ra diçû. Lê zozan meriv ku diçyê isa rast bû, heçta çê'vê
meriv bibirya isa rastêke xaş bû. Ayja kirîn, carke dinê Hecî Soro kirî îja em hatne
Livindê. Livind berê niha sêsid dolim 'erdê me têda hebû. Bavê mi hergav digo
kevîrê li bin, digo ew ara me Norşînê ye, ew 'erdê Norşînê ye niha gundê me têda ha.
Men'a wan e, tiştêkî we têda tine. Îja sêsid dolimê me be'rê girt. Be'rê girt îja bavê
40mi go mala di men'ê da çekin go hukmat wan mala hilnaşîne. Berê hema 'erd
dikolan, dîwar daneţanîn, 'erd dikolan, kûr dikirin, serra ava dikirin, yêku çadir
hebya çadir, têda heça du sê meha seba pez here kir. Pêz wira nedigîştê. Kolikê da
diman, zegîra xu datanîn ew dikirin îja gundê me be'rê girt. Be'rê girt îja men'a
Norşînê ye me têda çekirîye, xezîne ya wan e. Îja bavê min deh mixtara ra ketê
45de'wê neda wana. Ewa îja go mala têda çekin, mala idî hilnaşînin. Îja mal
hilneşandin, kanê idî difroşin, pera distînin, qe nadin. Livind niha tiştêkî me tê tine.
Erê welle, ayja niha tu neçî kir, kirê para me jî niha, sala bavê min hebû hersal kewş
derdixişt. Nedhişt ew gundê dora me kirê me biçêrînin, pezê me diçyê îja ku vira
diçûne wira nikaribûn veşerin, diçûne Livindê seba rê nêzik be heça tîr didrûtin
50dihatne vira. Kolikê bin'erd çedikirin. Ayja idî ku ava kirin idî nayên. Idî bû gund.

-b-

1Xalîçe me çedikir îja berê mala Miheme Emîn vêderê bû, Hesenî ne. De kulama
wan dibê Mala Seydo. Melê vira bû, e, melê vêderê bû. Îja be'lgî berê tine bûn îja

xûşkeke w haþ be'lgî çêkirin. Gund hemû çe'v day çêkirin mi jî xurâ sê hev çêkirin. Ewna qetyan çûn me avîtin, mi sala paşînê heft hev çêkirin, niha odê ne. Mi heft hev 5çêkirin, a ştera bêjim sisê heft jî, aa, deh, sisê heft jî başqe dezgahê wî ha hê mala me ye, mi anye. Ewê hate, hukmat hate Arinçkûsê dezga dane wana, rîs dane wan go tevna çêkin. Îja mi çû dezgay Arinçkûsê anî mala xûşka min e, mi anî da se vê balgonê, mi dîsa heft hev niha li oda me ne, me yek jî piçûk çêkir, Loqman go pîrkê tu, Xudê, tu kurt bibirî go ezê oda xu xim. Min çêkir dirût mi navê xu ser nivîsiye 10ewkeke reş nivîsiye, qeytaneke reş girêdaye. Zarê Miheme Salih hatibûne vira hildabûn biribûn. Nizam divê qaleriya xu dane, odê xu dane? A, a min heft hev niha li odê me ne, mi sisê jî daye qîzeke xu, mi yek jî daye ya Enqerê a heyşt hev, dibe çen heva? Heft li vir in, heyşt, neh, deh, yanzde, pânzde. Ew jî mi teze vira çêkirine, xalîçe jî mi du hev xurâ çêkirine, mi du emenî xurâ çêkirine, mi du emenî qîzeke 15xurâ çêkirine l Erdîşê bûka mala Kazim e, mij wêra j çêkirine aa mi dudu jî j mala Kubara xûşka xu, mala Mele Bavê ewa jêrê mala wan e. Erê welle mi du xalîçe jî wan ra çêkirine, mi emenî dudu mala bavê xurâ çêkirine, xalîçe mala bavê min anîne, li wana nedhat, dîya min anî mala meda daxist mi vira mala meda çêkir dîya min ra. Mi axir çî, mi sicadê mêjê, niha pênc, qîzê me, şeş qîz bûn şeş sicadê mêjê min 20çêkirine. Mi her qîzek yek çêkirîye, mi xinamiya xurâ yek çêkirîye, min ze'f tevn çêkirine, tilya mi loma hakî bûye.

Me hirî dişkinî dirist ayja me reng dikir, boyax dikir îja me dadxist, tevn berê, niha dezga derketne, sing dikuþan, çar sing dikuþan darê mezin aha þanîn dixistne tevnê yek didane valî yek didane walî rîs lê dalandin, gura wê hilddan çêdikirin. Îja me 25çêdikir, xalîçe îja piþta wê tê kuþanê. Xalîçe dorek rîsê xav tê avîtin, dorek pirtik tê lêdanê, e lê pirtik lêdidin. Ayja me xalîçe sakî çêdkir lê emenî pê deþta hildiçînin îja piþta wî nayê kuþanê. Xalîçe mehekî çêdikirin, bîst roja çêdikirin lê dereng çêdibû, yê mezin bûna pênc metro bûna. Boyaxa wî; boyax jî rîs hebû, boyaxa wana tima reng reng hebû. Me dikirî, þanî davîte nava avê, þeva spî davîte, rîs reng dikir îja pê 30çêdikir. Ayja mi du ber çêkirin, ber kesî çenedikirin. Ber jî mîna xalîçe piþt tê avîtinê ew jî nemûþeke ayrî ye. Yeke mala pîrka min e Neno dîya Apê Bedî' çêkiribû e çûm go welle tu bêjî yê çêkin. Dîyam go qijikê go meriv ser here go meriv nizane meriv bê, mi go qîzê çakî bîra mêriv diçe. Télek yaniþ bûya mi digo qey mi eva çenekirîye, nedtîye, isa zor e. Ber ze'v zor e. Ber radixin. Mi çêkir Qur'an mi sê

35meha paşê birî. Zarê mi tinebûn ejî tenê bûm gundîyaj kesî jê nizanibû, hew dîya mi zanibû, xatîya, jina ewkê Mihêy ‘Emerê zanibû. Ewê tenê ber dizanibû gund da. Ayja ku mi carekî wexta wana mi rast kir qîzeke me ha piçûk bû ewê alîyê mi pişt wê lêda, ew jî pişt tê avîtinê, mîna xalîça ew jî pişt tê avîtinê lê rîsêw pirtîk nîne. Zîka çêdikin aha ber ra dikirin îja carê du sê heva hilddin çara hilddin, pênca, yekî. **40**Ber zor e, neqşê wê ze’f in, kes nizane, nikare çêke. Min çêkirine lê birine, ka hîştine! Me ew kir me îja ew kir, çêkirin, mi go welle mi beza xu birî, Apê Bed’î gotibû kes nikare nemûşê dîya mi çêke Faţey çêke? Mi birî mi go inê welle ezê biherim oda Apê Bed’î raxim. Dîya mi go porkurê go apê tey bixeyde, yê teze biya erê, go yê bê eva sê mehe mi gotye hê bîra Faţê neçûye. Go nebe oda wî ranexe, **45**ayja ewî ji mi stand bir firot. Niha firotye daye, mala wan pişt mala ‘Izedînê birê min e, daye mala Birhan. Wiraye îja xûşkam digo e ku dçim derî vedkim digo tudbê qey çiçekeke digo dilêm qîrar nade edivêm hema, derî digrim edivêm Faţê cefa dît çêkir ewî jî anî raxiste vir. E, yek jî em hev cihê bûn zarê me dane mala Wehêy me, niza kîjanî dabû duhêj dîsa mi behsa wê kir. Mi go ewa bedew dane mala Wehê. **50**Ewana du tej heva ne tê dirûn yek ya min e mezin yek tej bû mîta xalîça yekta. Îja bûkê biribû vekiribû avîtibû ser balgona xu. Mi lê dinhêrî dilê mi dişewitî. Midgo ezê bêjim ka bide yê bê xalîçeke wan heye dane mi dîya wî haç carke me stand bir, bûkê bêje, mi qijîkê. Zozanê Gulîzer îja em çûn, me mala xu danîbû, aha dûr danî me kişande jorê em hildin, beza mi mabû wêda, Ûsib Çawûş go; ey Faţê! go mal **55**kişandîye eva hîştîye cîda go welle eva mala te pîzê te nivînê te hemû hêja ye, te ber cîda hîştîye, erê Quran, sa bedew bû, dane mala kurê min î elê, a jînikê biribû avîtibû ber şemîkê. Erê welle.

-c-

1De’watê berê, ez hergav dibêjim şikir qîzê me xilaz bûn, tiştê sa tinebûn. Hema te qîza xu bida kê qîzê qebûl dikir, ber bavê xu xeber nedida. Heşa we digo hema yê berê digo hema bide sekî meriv serê xu têxe nava pûrta wî, dikevin. Yê niha îja bixu begem dikin. Dibê bavo mêra na eva. Edbêm şikir tiştê ha qîzê me da tinebûn. Erê, **5**ayja didanê, wexta bavê wan bidana kê xu ker dikirin nedgotnê eva na eva. Dikirin îja de’wat dikirin, diçûne şîrnayî, sîyarkirinê îja xelîya wan yek qîçîk bû yek gevez

bû. Ya gevez davîtne pêşîya wê ya qîçîk davîtne parava. Dezmal hevva didrûtîn davîtne serserê wan. Tanîn de'waţ dikirin îja hespa sîyar dibûn. Îja sîyara cirît dileystîn îja sîyara pêş be'lgî tanîn. Kîjan hespa wî jêhatî pêşyê be'lgî banya îja xelat **10**davîtne sîyê hespê, dezmal davîtnê. Ew dikirin îja de'watê wana cergubez, tevê hev dileystîn, kulam digotîn, isa xaş dileystîn. Kulamê de'wata davîtne ber hev îja de'watê wana ze'v xaş bû, serde'watî digirtîn. De'waţ welle hema em bêjin îro yê biçûna hinê de'waţ bû heţta roja dinê sîyar kîrana, roja sîyar kîrana jî heţta dereng dileystîn idî bela dibû. Bûk bi hespê dianîn, li hespa dikirin tanîn îja be'lgî kîjan sîyar **15**jêhatî bûya dorê didane meydana, vî serî diçûne wî serî dihatne wira, dihatne wir, diçûne wir pêşyê dizvirîn heţta îja yekî pêşyê kîjan hespê wan jîhatî bûya, Apê Mecîd dewamlî be'lgî danî, hema Apê Mecîd birê piçûk bû şixul nedkîrin na welle. Apê Hemîd yê mezin bû çî bêjî dikir, Apê Mecîd hema xu çêdkir xu gulyax dikir. Ew dikir hespê xu çêdikir, dewamlî de'wata da wî diçû be'lgî tanî, belgîyê bûka wî tanî. **20**Nanê de'watê berê nota niha nebû. Nanê de'wata berê qeysî savar dipe'tîn îja vê axiryê ku idî ewk bû goşt jî pe'tîn. Pêz jî şerjê dikirin. Pêşyê ku tunebû, yê tunebûyî hema qeysî savar dipe'tîn îja idî vê axiryê ku dewletî bûn, keçe destê wan idî pêz jî şerjê dikirin. Nan çêdikirin, savar çêdikirin, avsîr çêdikirin, didane de'watîya dixar îja de'waţ jî sakî bûn. Îja pere davîtîn, bûk didîtîn. Bûkê berê hemûya dêrek didîtîn **25**îja niha bi zêra qayîl nabin. Dêrek didîtîn, erê welle, dîtîna bûkê kê bihaţa dêrek dibir didît, çar mêtro pirtî bû.

-d-

1Te'zîyê berê jî nota niha ewk nedkîrin çadir madir, mala gazî dikirnê. Mirîkî yekî bimra carê cînarekî gazî wana dikir. Dibirin nan dixarin. Îja niha te'zî hene çadira vedigrin bixu bixu nan didin îja nanê wana çî girtîye perê wî didin, cînar bêşa xu didin. Lê yê berê isa nebûn, mala gazî dikirin. Cînarekî bimra wî cînarî gazî dikir, wî **5**gazî dikir, wî gazî dikir. Lê yê niha sa nînin. Berê mîna niha şekir mekir nedbirin. Van sala derkeşye.

Vebêj: Pîrika Mihtê/Ferîde Kesercî-72 salî, nexwendî

Cî: Axçira/Akçira

Berhevok: a) Bêder, b) Çêkirina Emeniyan, c) Çêkirina Savar, d) Çêkirina Girarê, e) Xwendina Quranê, f) Çûna Zozanan

-a-

1Bêder; diçûn genim taînîn dihatîn, radxistîne ‘erdê da, gurz radxistin îja ‘erdê pe’n dîkirin îja bême’nî taînîn dewar, qedera bîst dewar deh dewar hema kîjan biya, bîst dibû deh dibû, didane ser da hûr dîkirin. Em li kâmê sîyar dibûn, me kâm dajot a hettanî ‘esrê, hettanî êvarê a t̄era bêjim. Ser digerîyan hetta nîvro, nîvro îja me 5berdidan ew diçûne çêre em jî dihatne malê, dîsa carke dîsa dihatîn. Gêle hebû bîst roja jî dewam dîkir, deh, bîst, p̄anzde, se genim bû. Îja me taîn dihat me top dîkir, topî ser hev dîkir îja me dida bayê da em hêvya bayê disekinîn. Îja me dida bayê da, bi şena me dida bayê. Bayê me derdxist îja me danî serad dîkir. Îja ku me serad dîkir îja me dadgirt îja me dibire malê. Yê dibirne malê yê bifrotana difrotin yê 10nefrotana dibirne malê xu da. Ka genim me bi şenê dida bayê, em hêvya bayê disekinîn, me dida bayê, bayê hev derdxist. Erê welle.

-b-

1Me emenî çêdkirin em mehekî ser emenîya diman, me şev ro emenî çêdikirin îja meha me tamam dibû îja me dibirî me des bi yeke dinê dîkir îja me peyra xalîçe çêdikir. Emenî ser tilîya me hildîçinî se tilîyê xu. Me bi rîsê p̄ez çêdikir, me rîsê p̄ez digerand îja me bi destê xu avde davîtnê, zîk çêdkirin avde davîtnê, bi tilyê xu 5hildîçinîn, teweke ser yeke bin, teweke ser yeke bin. Reng rengî me hemû reng rengî; qîçik, kesk, hêşîn, gevez, albonyax, şirik hemû ev rengana me çêdkirin. Me çêdkir bona oda raxin, cilê wan tinebûn, sawanê wan tinebûn. Hema nota cila mezin, mezin radixistin, yek meh me çêdikirin. Emenî hebûn bîst roja, emenî hebûn p̄anzde, emenî hebûn mehekî ser merifa bû, merif hebûya yardim hebya zû çêdibû. Boyaxê

10rîsa dihatne firotanê, yê nota te danîn difrotîn. Me xurâ yê deh kevçî yê pânzde kevçî yê bîst kevçî xurâ dikirîn cure cure, celeb celeb dikirîn îja me pê rîs çêdkir. Me îja bi teşîyê dirîst îja me badida. Me li ‘erdê sing dikuşan, me îja digerland îja me gura wê hildida bona tewâ ser ya binî nota hev, hevyeke be ha îja me çêdkir.

-c-

1Bismîllahîrehmanîrehîm Ya Xudê. Me tañî kuçîk çêdikir. Me kevîr datañî, me sê kuçîk datañî, me nîvçe tañî dihatin didane ser. Av dikelya me genim îja me temîz bi bêjîngê aşî dikir me pêda dikirin. Deh debo pânzde debo çî me diqedand, çî taqeta me hebya. Me xurâ dikelan me îja bi satila hildiçand derdixîst meyja dibir se kulava, 5kulav hebûn, cil mil tinebûn. Me se kulava radixîst, sê roja ziha dibû me îja hildida. Meyja tañî dikire conî meyja bi mîrkuşa milê xu dikuşa. Me bi mila dikuşa. Îja me dida bayê da îja wexta me dida bayê xilas dikir, ‘îşk bûya me xilaz kira meçû îja destar tañî îja me bi destara destê xu savar dihêra. E, îja me savar dihêra. E îja me savar yekî pêda dikir yekî dihêra, me dihêraaa, me sê roja xilaz dikir, du roja xilaz 10dikir, rojekî xilaz dikir. Ser merifa bû. Savarê mi ze’f bû.

-d-

1Gîrarê; ez tînim tendûra xu daddim, de’nê xu dişom, dixme firaqa xu da, de’nêm gava kelya îja ez tînim dew berdme navê îja heskêkî hilddim hêdî hêdî hev dixim heşa kelya ayja pûngê dixmê, kundira dixmê, aa çêdikim, kelya îja emê bixun. Hema kûndir e, pûng e, de’n e, bi dew, gava kû kelya îja de’nê te kelya xilaz bû idî tê dew 5bidî ber, hev xî a dew jî lê dikele bona kû neqete ayja kundira dixê.

-e-

1Ez hema şeş heft salî bûm mi desb Qur’anê kir, mi go Ya Allah Ya Xudê mi Qur’an xand. Hema mi ce kîjan merfî dihat, hema mele tinebya hema mi xu dighande merfekî mi digo hûnê xêra xu dersa mi bidin. Mi Qura’ana xu xitim kir, carî kir. Niha hemd Xudê ra niha jî Qur’ana xu dixûnim, mêja xu dikim. Ce mela jî rabûm, wexta

5ku mele hazir nebûna dihatme cem te dihatme ce merfekî dinê xurâ dera xu distand. Mele belkî mal nebya mi dera xu paş nedxişt dest ji Qurana xu nedkir.

-f-

1Em diçûn, hema piçkeki 'erd ha beynefi çedibû em diçûne zozana da. Me diçû xurâ piçe kolik molik idare dikir em diketne binî. Hine cara jî hema çadir madirek hebû em diketne binî me pez didot, me penêr davîte, me dewê xu dikya, me rûnê xu hildida hetta wextê ku nan dibû firik da idî em dihatne warê xu da. Em mehekî meh 5niveki diman. Hetta mehekî çend roj havîn diçû em dihatin. Me pez tenê xayî dikir, em dewara xayî nakin. Me dew dikya îja gava me dew dikya, me şîrê xu germ dikir îja me dikire qatix îja me dew dikya îja me rûn hildida îja me penêr digirt. Sirsumê me yê dar bûn, me darda dikir, yê dar da dikyan.

Vebêj: Hecî Îbrahîm/ İbrahim Çetin-67 salî, xwendî

Cî: Qerekeşîş/Yarımada

Berhevok: a) Aş, b) Zozan, c) Cot

-a-

1Em diçûne aş da, em ha diçûn: bi ‘erebê. Îja em gava bi ‘erebê diçûn, Xudê car hebû heftêkî belkî dor paşê dihafe me da. Aş Sîpanê Jêrê hebû, yê avê bû. Ayja, Xudê gele cara jî em têda birçî diman. Îja heyata niha tabî rind bûye. Heqê wî bîsta yek bû, me geñim diday. Geñim me çewala da dibir. Em bê çar çewal pênc çewal me 5‘erebeke ga dikir, çar ga girêdidanê. A emê rojekî biçûna wira dibû êvar! Ew şeva emê wira bimana ku dor hebya me dihêra, tinebya em diman hefa dor were me da. Wî karî.

-b-

1Em şeş bira bûn, birayê dinê ayrî bûn lê ez Hecî Memê em tevê hev bûn. Ayja zozana ez diçûm egleb, sala ez, du sala ew çû çar pênc sala jî ez çûm. Xudê, em vira bi makîne diçûn egleb, makîna me hebû wî çaxî. Ayja ji wira jî haşa me bi kera hildikşande jorê. Em bê weke sî kîlemêtrê, ça ji vira Xoñnasê, me ew jî ker bar 5dikirin îja ker ‘erdê diketîn, em îja çiqê pêra ‘aciz dibûn, çiqê zor bû. Ew jî sakîna. Zozana egleb çar pênc meha diman. Çar meha, pênc meha em diman. Rûn digirtîn, toraq pêner digirtîn, ayja her tiştê me zor bû, meriv nikarbû hema zebeşek jî zarê xurê bibira jorê da. Yanî dûr bû, wexta ku meriv gund pêya dibû, ka sî kîlemêtrê tê çî bidî destê xu biherî? Zozana em şeş mal bûn. Em hema gund qompîle diçûn. Belê 10belê, kes gund da nedima wexta em diçûne zozana. E wî karî em diçûn dihafe. Zozan xaş bû, vê axiryê xirabû em neçûn.

-c-

1Me coṭ dîkir, coṭê ga. Wextekî pûlig derketin îja pûlig me coṭ kîr îja coṭê tîr jî cem Ahmed Hosta çêdkirin. Ahmed Hosta hostakî ze'v meşhûr bû. Cem çêdkirin, Xudê nanê wî jî sa dihat, bi dilê te! Îja heṭa vê axiryê, vê axiryê eva tiştê hanê çêbûn, idî millet xilaz bûn. Niha jî pûliga me heye. Coṭê ga; gayê zexm bûna du ga davîtnê 5gayê normal bûna çar ga davîtnê. Carekî radkirin, careke din dîsa me gîsnek lêdida îja me taṭan davîtê pey ga, merfek ser sîyar dibû, ser taṭanê sîyar dibû taṭan dîkir. Em bê textek daṭînîn ser sîyar dibûn diçûn. Wî karî me taṭan dîkir, coṭê tîr jî; coṭ çêdkirin taṭîn me vira daṭînî, yekî toxim davît yekî se maç digirt. Ee, wî karî me dewam dîkir. Welle rojekî ze'v ze'v şeş heft dolim 'erd radîkir. Hewqas bû.

Vebêj: Xalê Mihemed Emîn/Mehmed Emin Çetin-72 salî, nexwendî

Cî: Qerekeşîş/Yarımada

Berhevok: a) Bêder, b) Zozan, c) Giya

-a-

1Bêder; me bi dasa tîr didrûtîn, meb ‘ereba dikşandin, gurz girêdidan, belkî we gurz girêdan dîtibe nedîtibe e nizamim, meb ‘ereba dikşande bêdera, lod dikir berê, piştî lodkirinê me îja kuleş davîte ‘erdê. Dîregek ‘erdêda dikuşan digon “singê bingêlê” îja me, deh dewar bûya danzde dewar bûya çi hebya me girêdida kamek dida bin, kam 5pey me dewar dajot, gele dajot. Sê roja çar roja me textirme nan radikir, rojê du ‘erebe. Ee, niha weke zemanê me nîne, niha riheş e. Hinde nan du si’eta da tê hasilatê. Piştî textirme jêra digotin, me top dikir, dixiste tix, dida bayê bi dirgana, me dida bayê. Piştî bakirinê ku genim jê derdiket meyja serad dikir, safî dikir, piştî seradkirinê dihaşê hildanê, dipîvan, hildidan, ee, bêder vî karî çêdibû. Ka genim 10bayê ji hev derdixist. Ka ayrî çêdibû genim jî ayrî tix dibû, me genimê xu dixiste çuwala. Berê weke ewk jî nebû me dixiste çuwala ser ‘ereba me dişand berdda çe’la, çe’l dikir, çe’lê xalîyê da. Me çe’l dikir heşa zemanê hêranê derdixist dihêran.

-b-

1Zozanê me, em diçûne Zozanê Gelyê Zîla, Zozanê Gulîzer. Mej xurâ kirîbû. Biharê, meha pêncâ da, sona meha pêncâ da em diçûnê heşanî meha neha em dihaşin. Zozan xaş bû. Weke van dera nebû. Mesela zozan hem hênîk bû zemanê wî rind derbaz dibû. Zarîya xu da ez neçûm, ez malxê mala xu bûm paşê çûm. Bavê çûye min 5nedîtye, ez bavê xurâ neçûme zozana. Me pez xayî dikir, dewar xayî dikir. Zêde ce me xayîkirina tiştêkî nebû. Zegîre, me ew digirt, penêr digirt, rûn digirt, toraq digirt zivistanê pê derbazya xu dikir. Em sê meh nîv çar meha diman. Sê meh nîv çar meha zêdetir nedman.

1Te, tirpanê dizanî yan na? E, meb tirpanê gîha didrût. Tirmix dikirin, dixistne tapûl, bi dirgana dixistne tapûl. Me dipêça, dixiste texe. Hinekâ girêdida, hinekâ negirêdayî dibir. Mesela sakîna danîn bi ‘ereba me dikşand, lod dikir heta zivistanê dida tarişê xu. Gurz, hinekâ du texe didane ser çawekî girêdidan, çawê gîhê çêdikirin. Çaw bi, 5çika digotîn? bi çirîka, bi çirîka badidan, bi çirîka badidan, gîha bû yê pelex. Zaten gîhay pelex dibe çaw da, çawê gîhê. Çawê gîhê yê nan lê naye çumkî gurzê gîhê mezin dibin, ee. Lê gurzê nan me bi nan girêdidan. Gurzê gîhê bi çirîkê badidan weke du mêtira filan dibû, hinekâ du texe didane ser girêdidan hinekâ sê texe didane ser girê didan dixistne gurz, sakîna danîn lod dikirin.

Vebêj: Xatiya Gurcî/Gürce Deniz-68 salî, nexwendî

Cî: Koçerî/Erikbağî

Berhevok: a) Xalîçe, b) Dewat, c) meşk, d) Rîs

-a-

1Me pez dibiñî, hirî dişûşt, şe dikir, dirist, eglebî, me ze'f bişev dirist, ber tavehîvê, ber çirê. Îja me tabî ewk dikir, reng reş dikir. Me telaş çêdikirin. Me carekî dişûşt ji bona xuhê, qirêjê renga rind bigrin. Îjaa me sîtil didane ser, me boyax davîtê, eşqerê wî hineka xoy davîtê, hineka jî şeb davîtê, şeba spî, belê. Îja me reng çêdikirin, reng 5jî tabî tecrube bûn. Digo mesela destê yeke mîna Wehîdeya rihmetî rind digre, weka destê min nagre. Îja me reşik jî mee, tabî kelîmê tirkî jî hene naxazim bikevne navê. Yanî eşqerê wî, me diçû zarûk hebû, pincar, çolê. Zarûk, sîce me tanî dihat, haa me neţanî, tenekek heşa daţanî, hesinê zeng; ku rast bihatana, ne'lê hespa, ne'lê ga filan, av dixistne ser, ewa wisa dibû dibû weke rreş. Ewa ava daţanîn îja didane ser 10dikelandin, sîce w zarûk ze'fê wî aliyê Xorasanê hebû, tanîn dihatin welaţê me Eledaxê. Ew jî dikelandin, ava wê qîç bû. Heke ku telaşê ji bona renekî têda kirana ew isa qîç derdiket, bêboyax. Ayja ew jî davîtnê çêşî îja reng çêdikirin, her çêşî. Al, gevez, reşik ji wî bû. A îja paşê eva derman derket, reş davîtnê. Ayja me çêdikir, me badida.

15Xalîçe, xalîçê giran, mezin-piçûk, yanê jinê jêhañî bişev çêkirana, ber çirê, lambê heyjde roja evana me dîtin. Heyjde roja, ha, xalîçê giran, malê giran mehekî, e. Îja tabî jinê jêhañî ku dereng çêkirana, e, mêra dihatin digotin, mezina digo; çênakîn, 'eware ne, digo ne îş jîr î jêha ne digo kir î kirana e: bira yanî çêkirina wî meqbûl be bira dereng çêbe. Heta mîra jî digotin. Belê îja wira sorcîn digotin, hiriyê mîha ne 20gevez ew jî, sade, xurî kurmancî, zimanê mey î kurmancî xurî gevez bû. A kew tinebya, hirîke qerqaş hirîke reş mel hev dixist me dixiste kew. Ewa kew e evana tev orcînal in. Îja qîçkê rindo, qîçkê kulîlka, al, gevez. Evana tev belê, rengê wan bûn. Îja telaş davîtin, masûr çêdikirin, pirtîk dibiñî. Hineka jî hema serê guloka, xûşkeke

mele ye rehmetî hebû, ewê hema sa çêdkîr. Ê mebxu jî masûr, darik, bême'ne ara
25wana ew dikirin, lê dalandin dalandin, dişidandin kêl didanê dibû pirtîk.

-b-

1De'waţ; ê zaten ze'f hindik, hineka hema diçû kûr dizewicandin bê kûra, belê. Qîz jî bihatana şuxu qe qîza deyn nedîkir. Qenc xirab didan, belê. Destê wan digirt, nîşanî pêda dikirin, herêkirin digo nivê me'rê ye, tamam e. Destê wan digirtin, diçûn, mal derdixistin, ayja paşê sertêdan hebû, şîrînayî hebû. Şerbet dixistne avê da. De'waţê 5wan dikirin, xêlîyê wan gevez bûn. Min xêlî, Arînê bûk anîne Pargatê mi heft reng dîtîn, heva dirûtibûn. Ewa ez wî çaxî ha ha bûm, mezin bûm. Heft reng xêlî bû 'eynî belê, dirûtibûn. Bûk jî bi 'erebê anîn, 'ereba ga. Mêzer, mi sê reng mîbxu jî dirût, mi Medê ra jî dirût. Ya vê axiryê Apê min î rihmetî me zewicand. Belê, eva kesê bû, eva qîç bû eva gevez bû. Belê, eva mîbxu jî dirûtye, mi terzîtî dikir. A evana mêzerê 10wana wisa bûn, porîkkîrî bûn, dêre bûn pêsîrê wana, îşlikê wana hebûn. Vê axiryê qedîfe bûn, çiftexas bûn, ê qilçikê wana çîtê spî bûn. E, ser kinca da, pêşê dêra hinek yê maqûla, mezina kobe bûn. Navê kobe awha, merivê mezin e naskîrî ewna kobe didane ber, heçkî, heçkî didrûtîn. Çiftexas tayê reş qûnkêl bi derzîya me didrût, ber çîrê, lambeya, paşê bûne lambe. Belê me didrût. Gore, dest da, niha jî gora min ser 15şîşîka ne me çêdikîr. Me bişev radbû dew dikya. Dew jî zehmet bû.

De'waţ îja ze'f xaş bûn, dengbêja, du heva hevra digo, de'waţê Hemoyîya yê Bekira ze'f xaş bûn. Ê ştera bêjim, xarin; nan çêdikirin. Xarinê de'waţê, 'Elîyê Heyştahir, mala minê, nehîştin ez birim. Temmam min şa dibûn, nanê min ayrî wana da hem asa goşt mira taînîn. Savar rişte çêdkirin, belê savar rişte meqbûl bû, birinc şuxu tinebû. 20Ê ştera bêjim, goşt savar bû. Bûk sîyarî bû, rastê jî bihaça, dûr jî bihaça, 'erebe bû. Belê eştera bêjim heţanî de'waţêke eqrebayê me hewale anîbûn Apê min ê rehmetî digo hespê min bi'ecîye, ga jî maye sirê birye welle berf a niha, e, lê wexta taînîn dihaţin be'lgîyê bûkê direvandin. Ee, be'lgî direvandin, ê zavê dixistin, zava dibirin ji bona xelatê. Rôvî hebû, belê. Îja digo filan rojê emê rovî bişînin de'waţê kûrê 25(Mizefer e). Belê emê bişînin wê here (Pargatê), rovî ça here? Navê wî rovî ye yê here roj dayne ayja, ('Evdîyê) (Mele Nisredîn) bişîne yê bê tê hefî cabê bidî mala (Mizefer) emê filan rojê werin. Ê rovîyê here rovî çawa biqedîne kû dizîkava here,

negrin? Gere xu veşêre. Wisa ku bigrin, hinek nav pêz da diçûn, nava şivana. Apê Pâpê çibû nava jina da, sakîna hildabûn gotîbûn mala Mihêy Çîçê ye digotîn, gotîbû; **30**mala Mihêy Çîçanê kîjan e? Gotîbû çima, ewana hogeç digirtîn, zengîn bûn. Digo emê herin ezê bêjme, ê dêna xu didmê tewşa wî ya rênçberan e wisa. Avê hildde hema dikeve hundir, datîne divê; neb rovî me neb şêrim, xud de'lê da vedşêrim, yeke din jî hebû mi bîr kirîye. Aa wisa, apêkî me jî navê wî Ûsiv bû. Dişîne Gomikê divê gund kevin yê werin. Xu ew bi yekî va. Wisa ça diçe digrin îja tînin tîn dibê welle **35**emê çikarî 'etab kîn? A Îja heşa serde'watî were, digo Apê Hecî Mûsa gotye; na na! Kûrê Ûsivê Hisêy Me'mo, ew kir go heyfa Ûsiv ezê Ûsiv viz kîm; hema gonî şil kîn bidne ser, Ûsiv bidne ser, go sa kelem têra çûn sa didane xebera.

-c-

1Meşkê ga ewk bûn, qîmetlî bûn, destê herkesî, du jina digirtîn. Meşka jî jina nizanbûn dewamlî mêra didrûtîn, meşkê ga, bi postê çêlekê, ga, erê. Aha ji vir dera han, min navê wê bîr kir, ewa wê digirtîn, ha ayja pey wî ra meşkê biznê. Meşkê biznê didrûtîn mêra, a werîs darda dikirin weke kêrana, ha wextê valakirinê nîvçe **5**datañîn parzûn dixistnê, jinê zexm destê xu davîtê ku ze'f giran biya jî yekî jî, bilind dikirin, jorda berddan îja parzûnê wî hildikşandin, e. Me pêz didot sê cara; carekî me didot carken digo pêz vegeîne bêriyê emê, emê paydoş kîn, a, îja mey berda yê carken biçûya qasekî şûnda yê bihaşa carke 'esrê mey dîsa bidota, belê. Ê pezek bimra şuxu yanî ne mumkun bû post, şivanekî têxişta merivekî dixeydî. Darda dikirin **10**dixistne 'îyar ji boha toraqê, penêr, belê. Di gunda tinebiya, Pargatê radibûn digotîn emê herin mala Se'îdê rihmetî ew zengîn e, diçûn 'îyar tañîn dixistnê da, dixistne 'îyara da, qûnê wan didrûtîn bême'nî. Êştera bêjim evana hemû eserê kem bûn. Ê, nan hindik bîya ze'v bîya, ze'v bîya jî gere mitleqa hevîr bihaşa kîrin, tendûr jina dadida. Me nanê sêlê dipe't bi deşta, nanê tîrê tinebû, belê tîr tinebû. Erê palê **15**gîhê da, palê, nanê ceh em zarbûn jî, ew mala Apê Şamil hebû hatîn, ewana ji Erdîşê hatîn mi garis wî wextî dît. Garis hêrabûn, 'îyar da bû, hevanê rût, eh. Ê şixu ceh bû, tabî zemanê me da niha jî idî kes naxwe. Ayja malê mezin, heşanî jina dişuştin dibjartîn, digo cehê mala filankesê, nanê wan hinde ne, ceh dişon, eştera bêjim wekî din jî cîyê kirîk kirîk bûn, cîyê mesela Filîştan, malê giran du teyşt

20dikirin; eva genim ji bona mêvana, eva han ceh jî ji bona malê, rênçbera, pala, nan tune bû. Yanî ‘adetê dunyayê wisa bû. A bigotana filankes diçû pincar çolê tañî dikelandin ewdikirin, a digon eva jî para bûkê. Malê zengîn jî zengîn bûn eştera bêjim, ez hatme, e teklîf kîrime pânzde roja mame Xornasê mesela hema qelaçî hatye amana qela dîke. Ew dor ser mala Tahirê riħmetî ye. Aaa, Meta Şe’rê goşe mi go 25were go ezê nan qelaçîya ra bihêrim. Go, du sê darîk mi hildan ewê jî nan hilda taştê em çûn hema Apê Hiso riħma Xudê lê, go Şe’rê go te Gurcî birîye ce wana çi? nezerî, go na na Hiso! Tu nezerî nekî kes nezerî nake. Go te çi pala ra çêkirîye? Go ezê rişta çêkim. Go te rişta bidî Gurcîyê? Go welle ewê dîkekî ha mîra çêkir, ayy! Xudê tu riħma Xu li wan kî! Ee zeman diçe. Xudê zirîya wan bişeref bike.

-d-

1Bi rîs şalê mêra, şalê mêra bêedebî tê tabî ewê wî, doxînê wan. Serê doxîna jî kesk, sor, zer/qîç, serê wan çêdkirin çîçîçî. Eva doxîn bi danzde, şeşa ser hevra, ez bixu jî dizanim çêkim. Wextê bizîyê wana didrûtin, bizî, şûna doxînê bêedebî tê. Wexta têra dikirin tañîn serê wê sê çîqa; eva gevez, eva kesk, eva qîç. Eva îja serê wan jî qotîk, 5mêr ku wêda bihatana bi şalê wana rîs, va şalê ku niha xu nakin Dîyarbekir, Ûrfalî, ‘eynî wisa, belê, mi dîtin mezin bidî min çêkirine. Rîs: rîsê gewr, rîsê sipî, rîsê sor. Digo mi şalê Apê Ûsib piştepez wisa be, hirîya piştepez yanî bêreng, bêboyax. Piştepez, sorcîn eştera bêjim evana reşkew, e belê, reşkew yanî bixu, e bêboyax. Belê bêboyax, ayja ewana çêdkirin hetanî dev delingê wan jî wisa bi renga, e, belê 10çêdkirin.

Bi rîs gore hebûn, lepîk hebûn, kumîk hebun, belê kumê rîs, kumê tiftîka bizîna, eştera bêjim weke papaxê ewka çêdkir, herkesî çenedkir! Îja bi nîk, gorê tiftîk papaxê tiftîk ayrî. Jina ‘eba çêdkirin, ‘eba ew bi mûyê bizîna, belê mûyê bizîna yeke Necmedîn jî heye. Bi mûyê bizîna çêdkirin, weke êlenga weke çakêta, jêra digotîn; 15‘eba filankesê ‘eba hezoyî ye, jina digo. Çîtê mêra çîtê kona. Çîtê mêra ayrî kon ayrî ye kulîna eva jina çêdkirin. Digo em ser nemûşê Îranê çêdkin, belê bi desta bi şivîka, her tişt dihaçe çêkirinê; çewal, xurc, belê, xurcê xaliçe rîs, davîtne ser milê xu zivistanê. Têr jî, têrê me çewalê me niha ser hev da wisa ketîne. Têr belê ser hespa ser, haşa ga, piştê ga, bar. Jina tañîn dihatin alîk bilind dikirin weldigerandin ew

20têr çewal jî, şixu wexça bêdera bihaça idî heçya jin, lezzeta jina tinebû, jin agir da bûn. Îja jinê berê ne, jinê niha zaten bûne weke laylon, zaten nexaş in qişka.

FERHENG

-A-

ademî	(n)	: Navê konfederasyoneke hin eşîrên Serhedê ye ku ji duwazde eşîran pêk tê.
afir	(n)	: Ciyê xwarina êmê ajelên gir.
aman	(n)	: Firaq, derdan.
amorî	(n)	: Gayê paşiyê yê li ser gêleyê.
‘ancûz	(hn)	: Ecûze.
anha	(h)	: A niha.
apince	(n)	: Qapût, sako.
ar	(n)	: Ard, ardê genim, ceh û dexilên din.
arav	(n)	: Gava kinc tên şuştin ava ji wan derdikeve.
arîk	(n)	: Arîk. Binban, di malê banê wan bi kêranan hatine çêkirin de binê ban.
aşî kirin	(l)	: Serad û bêjîngkirina dexil.
avde	(n)	: Perçeyek rîs.
avrênc	(n)	: Tûrê ji postê pez an jî dewarekî hatiye çêkirin ku têde toraq tê girtin.
avsîr	(n)	: Avşor, tirşik. Xwarineke bisalçe, bi kartol û hin sebzeyan tê çêkirin.
awha	(hn/h)	: A wiha.
axirî	(h)	: Di dawiyê de.
ayja	(h/g)	: A îja.

-B-

bedew	(hn)	: Xweşik, rind, delal.
befş	(n)	: Di tevnê de texteyê ku tayên tevnê vedike.
bekirî	(n)	: Eşîreke Herêma Serhedê, ji Konfederasyona Ademî.
be’lgî	(n)	: Balgî, balîf.
bend	(n)	: Ben, ta.
beraş	(n)	: Kevirê aş ê ku pê dexil tê hêran.
beroš	(n)	: Derdaneke ji sîtilê biçûktir e.
ber	(n)	: Xalîçeyeke xemlê ye ku piranî bi dîwaran ve tê darvekirin.

berteref	(hn)	: Kesê gelekî nexweş, li ber mirinê.
bex	(n)	: Berx.
beynetî	(n)	: Derbiharê, germbûna hewayê û sistbûna axê.
bêder	(n)	: Bênder, karê hûrkin û ji hev kirina berên zeviyan.
bêjîng	(n)	: Amûra vebjartinê ye, ji seradê biçûktir e û dexil ji kozelê û hûrê wê dike.
bême' nî	(g)	: Bêmane, ne di maneyeke xirab de.
bêr	(n)	: Amûra devfire ya kolan û vedanê.
bêş	(n)	: Par. Di karekî komî, kirîn an jî peredana tiştê de para kesekî.
bidî	(h)	: Şahid. Di hizûra (wî/ê) de, li ber çavê (wî/ê).
bisk	(n)	: Pirça por a li rexê serî.
bizî	(n)	: Şûna doxînê.
bor kirin	(l)	: Bi balûleyî pêçandina cil an jî kulavan.

-C-

cab	(n)	: Xeber, xeber şandin.
cake	(h)	: Careke din.
carî	(n)	: Dubare. Piştî xitimkirina Quranê cardin xwendina wê.
ceh	(n)	: Dexlê ku libên wî ji yên genim biçûktir e û nanê wî ji yê genim hişktir û tarîtir e.
celalî	(n)	: Yek ji eşîrên Herêma Serhedê ye.
celeb	(n)	: Cure.
cem	(n)	: Ji du bêrikên xurcikan bêrikek.
cergeşîn	(n)	: Gundekî Erdîşê ye.
cergubez	(n)	: Dîlana ku jin û mêr bi hev re dilîzin.
cêrge	(n)	: Rêz, di rêzekî de man.
cînar	(n)	: Cîran.
coban	(n)	: Werîs. Benê stûr ê ku pê sap an jî giya bi vagonê ve tê girêdan.
conî	(n)	: Ji curn biçûktir e. Di tê de dan tê kutan.
cot	(n)	: Amûra bi gîsin a çandina dexil.

curn (n) : Hewza biçûk a kevirî. Berê dan dixistinê û bi mîrkutan dikutan da ku bikin savar.

-Ç-

ça (h) : Çawa.

çakî (h) : Çawa.

çaw (n) : Ji bo girêdana gurzên giya û genim, benê ji giyayê pelex an jî sapê tarîgan.

çelîbağ (n) : Navê beldeyeke Erdîşa Wanê ye ku bi tirkî navê wê “Çelebibagi” ye.

çe’l (n) : Çal, kort.

çe’v (n) : Çav.

çikarî (h) : Çawa.

çirîk (n) : Amûra ku pê giyayê pelex badidin û dikin çaw.

çil (hn) : Spî, cureyeke rengê spî ye.

çîţ (n) : Cureyeke qumaşî ye, tenik e.

-D-

dargur (n) : Darê ku gura tevnê pê tê girtin.

darpişt (n) : Parçeyeke tevnê ye.

das (n) : Amura tîrdirûnê.

de’l (n) : Daristana biçûk.

demaçe (n) : Çeka biagir a destan.

den (n) : Ji boyaxa telaş re tê gotin.

de’nû (n) : Danê kelandî.

derxûn (n) : Serdevkê dîzikan.

deştâr (n) : Amûra hêrandîna xwê.

deşte (n) : Lijne, kom, şaxeke qebîleyê.

deştîk (n) : Amûra destan ku pê karek tê kirin.

devî (n) : Qirş, dirik.

devşe (n) : Hirya bi qasî devê şeyekî.

de'waṭ	(n)	: Şayiya dawî ya zewicandinê ye ku lîstin, bûkanîn û dana xwarinê di nav de ye.
dewleṭî bûn	(n)	: dewlemend bûn, zengîn bûn.
deyja	(g)	: De îja.
dên	(n)	: Bal, dîqqet.
dirgan	(n)	: Şene, melêv, amûra dirançetel a giya û sap.
dîz	(n)	: Derdana ji axa sor a hişkirî.
dolabê	(n)	: Navê dîlaneke dewatê ye, bi giranî tê lîstin.
doxîn	(n)	: Benê ku navtenga şal/şalvar digre.
dutax	(n)	: Navçeyeke bajarê Agirî ye ku navê wê yê niha Tutak e.

-E-

e	(h)	: Erê.
'eba	(n)	: Kincekî stûr e û ji mûyê bizinan tê çêkirin.
ebex	(n)	: Navçeyeke bajarê Wanê ye ku niha navê wê "Çaldıran" e.
'eledewam	(h)	: Berdewam.
emenî	(n)	: Cureyeke xalîçeyan e.
erdîş	(n)	: Navçeyeke Wanê ye.
'etab	(h)	: Kar û kirinên êrbet, nedîtî.
'eware	(h)	: Qels, bêkêr, nexurt.
exleb	(h)	: Piranî, zêdetirî.

-Ê-

êl	(n)	: Qebîle, zozan.
êpê	(hn/h)	: Gelek, pir, zêde.
êrmenî	(n)	: Ermenî.

-F-

file	(n)	: Ermenî.
filistan	(n)	: Deyşteke li navbera Erdîş û Elcewazê ye ku dikeve bin riya herdu navçeyan.
firaq	(n)	: Derdan, aman.

firîk (n) : Simbilê xay, genimê negihîştî.

-G-

ga (n) : Ji cinsê çeleke dewara nêr.

gamêş (n) : Ji cinsê medekê dewara nêr.

garis (n) : Cureyeke dexilê.

gede (n) : Lawik, kurik.

geliyê zîlan (n) : Navê deverê ye. Bi komkujiya ku lê hatiye kirin tê zanîn.

Niha girêdayî Erdîşa navçeya Wanê ye.

gerînek (n) : Babelîska ku di avê de çêdibe.

gevel (n) : Porê ne li ser hev, belawela.

gevez (n) : Rengê ji sor tîrtîr.

gêle (n) : Karê kutan û hûrkirina simbilan.

gincir (n) : Kinc û cila kevn û peritî.

girar (n) : Xwarineke bi dan û dew tê çêkirin û pûng, kundir û nok jî tev dibin.

girê (n) : Parçeyek penêr.

gîsin (n) : Perçeyê hêsîna devê cot.

gizilgo (n) : Hiriya ku li hev aliyaye, tevlihev.

goştbeş (n) : Navê giyayekê ye, dikeve nava xwarinan.

guhdirêj (n) : Ajala barkêş, ker.

gulêc (n) : Ciyê gul û kulîlkan. Ciyekî bintara Çiyayê Sîpan e.

gulîzer (n) : Navê zozanekî li devera Geliyê Zîlan e.

gur (n) : Di tevnê de tayê berayî.

gurz (n) : Koma giya yan jî simbilan a girêdayî ye ku ji texe yan jî miştiyan pêk tê.

gûnî (n) : Giyayê bi strî ye ku ji bo şewatê tê derxistin û hişkirin.

-H-

ha (b/h) : 1. Bersiva gazîkirinê, çî. 2. Wiha.

hakî (hn/h) : wiha, wisa.

hal (n) : Nexweşiyek e.

heçkî	(n)	: Celebeke kêla dirûtinê ye.
hemoyî	(n)	: Eşîreke Herêma Serhedê, ji Konfederasyona Ademî.
hemûşk	(cn)	: Hemî.
herekî	(n)	: Her yekî.
herro	(h)	: Her roj.
heţan	(n)	: Rîsê ser dezgayê tevnê.
hevan	(n)	: Turê ji bo nanê şivanan ji postê pêz tê çêkirin.
hevrişk	(n)	: Xwarina ku nanê kel ê ji tendûrê dertê tevê rûnê nivîşk dibe.
hevşî	(n)	: Goma pêz a servekirî.
hevyek	(n)	: Weke hev, bi qasî hev.
heyderî	(n)	: Navê konfederasyoneke hin eşîrên Serhedê ye ku ji duwazde eşîran pêk tê.
hêt	(n)	: Ran.
hij kirin	(l)	: hez kirin.
hilçandin	(l)	: 1. Ji bîrê bi satilê av derxistin. 2. Bijartin, veqetandin, ji hev kirin.
hinde	(hn)	: Evqas.
hine	(n)	: Toza ku bi tevê avê dibe boyax.
hingil	(n)	: Dest û piyên postê pêz re tê gotin.
hûr	(n)	: 1. Biçûk, ne gir. 2. Di zikê însan de perçeyên ji aşikê jêtir heta dawiya roviyan.

-I-

inda	(hn)	: Winda.
inê	(b)	: Dayê.
'inte'int	(h)	: Ji ber westandinê dengê ji mirov dertê.
isa	(hn/h)	: wisa
'işk	(n)	: Hişk.
'işkem	(hn/h)	: Hişkanî, bi awayekî hişk.

-Î-

îlahim	(h)	: Di her rewşê de, xusûsen.
---------------	-----	-----------------------------

îskan	(n)	: Derdana cam a çay vexwarinê.
‘îskî	(n)	: Navê eşîreke Serhedê ye.
‘îyar	(n)	: Turê ji postê heywanan tê çêkirin.

-J-

jenîn	(l)	: Şekirin û amadekirina hirî û livayê ji bo çêkirina kulavan.
jûlo	(n)	: Navê dîlaneke dawetê ye. Bi giranî tê lîstin.

-K-

kam	(n)	: Texteyê ser gêlê ye.
kandirêp	(n)	: Darê li nav gêlê.
kanê	(h/b)	: Ka.
kanzox	(n)	: Gundekî li bintara Çiyayê Sîpan e û girêdayî navçeya Elcewazê ye.
kap	(n)	: Hestiyê çîpê mîrov.
kap	(n)	: Ta, ben.
kartû	(n)	: Ne nû, ne teze, kevinbûyî.
kavir	(n)	: Peza ji şeş mehê heta yek salî.
kelem	(n)	: Strî.
kem	(hn)	: Kevn.
kergît	(n)	: Amûra tevnê ya bi diran a ku pê tevn tê kutan.
kerpiçandin	(l)	: Di nav de kirin, lê hesikandin.
keşke	(n)	: Xwarineke ku bi dan û goşt tê çêkirin.
keşk	(n)	: Toraqa hişkîrî. Ji bo têkeve nava hin xwarinan toraq di şiklê hirmiyar de tê hişkirin.
kew	(hn)	: Rengek e dişibe rengê gewr, boz.
kewgir	(n)	: Amûra bi destî a daweribandina xwarinan.
kewran	(n)	: Karwan.
kewş	(n)	: Karê diyarkirina sînor û zeviyar.
kêl	(n)	: Dirûnek.
kêran	(n)	: Darên li ser banê malan tînin raxistin.

kêrbir	(n)	: Şûna birîna kêrê. Di binê movikê de şûna birîn û jêkirina bi kêrê.
kêvrîşk	(n)	: Kîvroşk.
kîlçîk	(n)	: Amura lêdana kil li çavî.
kirîk	(n)	: Cureyekî genim e.
kir	(n)	: Gir, topik.
kîrkîrk	(n)	: Giyayeke ku hebên wî hûr in û gilover in.
kobe	(n)	: Perçeyeke qumaş e ku li ser kincekî ve tê kirin.
koçerî	(n)	: Dîlaneke dewatê ye û bi lezkî tê lîstin.
kod	(n)	: Pîvaneke dextlê ye ku beramberî nêzî çil û çar kîloyî ye.
kolîk	(n)	: Malên ku ji bo demeke kurt tê çêkirin. Pîranî binerd in û li zozana tèn çêkirin.
kön	(n)	: Reşmal, mala ku perçeyê wê ji mûyê bizinan hatiye çêkirin.
kort	(n)	: Çal.
koşan	(n)	: Cotê havînê, cotê duwem.
kuç	(n)	: Kevir.
kuçîk	(n)	: Ji bo kelandin an jî patinê agir û kevirê li dora wê.
kulav	(n)	: Cila stûr a ji hiriya pêz tê çêkirin.
kulek	(n)	: Paceyê banê xaniyan.
kuleş	(n)	: Giyayê nerm ê belavkirî.
kulfeş	(n)	: Ehlê malxêyê malê.
kulîn	(n)	: Mitbexa konan.
kurşan	(n)	: Hiriya ser piştê pêz a ku hev digire.
kûrk	(n)	: Hiriya ku piştî navşikê ji şê dertê.
kûl	(n)	: Kuna heywanan.

-L-

laçibene	(n)	: Navê dîlaneke dawetê ye.
laçekî	(n)	: Navê eşîreke Serhedê ye.
liba	(n)	: Liva. Hiriya berxan.
limûjen	(hn)	: Kesê ku livayê dijene.
lod	(n)	: Li ser hev komkirina gurzan.

livind (n) : Li devera Filistanê, navê zozanê Axçirayê ye niha êdî bûye gund.

-M-

maç (n) : Parçeke cotê ga.
maçîk (n) : Parçeke cotê ga.
maldexiştin (n) : Piştî xwestina qîzekî çûna mala qîzikê, sertêdan.
malxê (hn) : Reîsê malê.
masûr (n) : Tîrka tevnê.
mehes (n) : Mizdana ser laşê dewar an jî hespan.
men'e (n) : Erdê aîdê gel, erdê ku ne milkê şexsî ye.
me'r (n) : 1. Mar. 2. Nikah.
me'rxurî (n) : Navê eşîreke Serhedê ye û ji konfederasyona Heyderî ye.
merzel (n) : Gor, qebr.
meşk (n) : Sirsûma ji postê heywanan tê çêkirin.
mêj (n) : Nimêj.
mêzer (n) : Berpêş.
micciç (h) : Ciddî, tam, têkûz.
miğare (n) : Navê gundekî Erdîşê ye û nêzikî Zozanê Gulîzerê ye.
mikaîlî (n) : Navê eşîreke Serhedê ye.
mirtoxe (n) : Helewa ku ji ard, rûn û şekir çêdibe.
mişî (n) : Koma simbilên belavkirî ku çend heb dibin gurzekî.
mîh (n) : Mî, mih.
mîrkut (n) : Amûra kutana dan û dexil e ku ji dar tê çêkirin.
mîta (d) : Mîna, wekî.
mozik (n) : Navê giyeyekê ye. Ji bo ku telaşê rîs reng bigre ev çêre dikelandin û telaş davêtine navê.

-N-

navpêketî (hn) : Navdar.
navşîk (n) : Hiriya pêz a piştî serbiskê tê ye.
ne'l (n) : Nal, nalê hespan.

nemûş	(n)	: Neqş, mînakên neqşan.
nemûşkar	(hn)	: Kesê bi nemûşan dizane.
nîk	(n)	: Navê neqşekê ye.
nîr	(n)	: Darê ser stiyê ga.
nîvçe	(n)	: Derdaneke ji beroşê mezintir e, sîtil.
norşîn	(n)	: Gundekî Elcewazê ye.
nota	(d)	: Mîna, wekî.
notanî	(d)	: Mîna, mînanî, wekî.

-O-

otopêz	(n)	: Otobûs.
---------------	-----	-----------

-P-

paç kirin	(l)	: Maç kirin, ramûsan.
pale	(hn)	: Karkerê demî yê ku bi heq dixebite.
paşax	(n)	: Kum, cureyekî kuman.
paşûrê	(n)	: Dîlaneke dewatê ye ku bi lez û tevger e.
paşava	(n/hn)	: Li paş, paşî.
part	(n)	: Koma gurzan. Ku hinek ji çil hinek ji şêst gurzan pêk tîn.
parzûn	(n)	: Ji bo daweribandina şîr, paçika tenik a didin ser beroşan.
paydoş	(n)	: Dema duwem a dotina pêz e ku ya yekem serdoş e.
payton	(n)	: Fayton.
pejal	(n)	: Tiştê şaxê wê pir bi pirç.
pelex	(n)	: Giyayê nerm û zirav.
pence	(n)	: Perçeyê ku li binê solan tê xistin.
pepîk	(n)	: Piyê hin cinsê heywanan.
perîk	(n)	: Pûrtek ji heywanên bipûrt. Pûrteke teyran.
peyn	(n)	: Hûrê pîsiyê heywanan.
pêşik	(n)	: Kildank. Derdana ji postê dîkan tê çêkirin ji bo dagirtina kilê çavan.
pilte	(n)	: Benê nava çirê.
pilûr	(n)	: Navê taxeke Erdîşê ye.

pirpal	(n)	: Tayê ser tişteki ve, pirpirk.
pirşik	(n)	: Rîsê ku kurt tê jêkirin.
pirî	(n)	: Qumaş.
piştepez	(n)	: Rengê hiriya ser pišta pêz.
pij	(n)	: Hesînekî sêdiran e ku pê xalîçe tîn kutan.
pîkol kirin	(l)	: Bi pê xwe erd kolan.
pîncik	(n)	: Darîkek e ku li rûyê tevnê tê dan.
porik	(n)	: Perçeyê zêde yê li ser dêreyan.
potik	(n)	: Navê giyayekê ye ku ji bo rengirtina telaş tê kelandin û telaş dikeve nav ava wê.
poxîng	(n)	: Toza savarê kutandî.
pozik	(n)	: Serê pê, sol an jî goreyan.
pûng	(n)	: Giyayekî bêhnxweş e û dikeve nava girarê.
pûrt	(n)	: Mû, pirç.

-Q-

qaput	(n)	: Sako, sakoyê dirêj.
qazvanok	(hn)	: Zarokê ku diçe ber refa qazan.
qedek	(n)	: Perçeyê spî yê nivînan.
qedera	(d)	: Bi qasî.
qela kirin	(l)	: Biraqandin û nûkirina hin metalan.
qelen	(n)	: Heqê ku ji bo dayîna qîzan tê standin.
qelînek	(n)	: Danê ku di sêlê de tê qelandin û li gorî xwestinê yan xwerû yanjî bi tevê mewij û kirkirkan tê xwarin.
qeme	(n)	: Kêra mezin a şerî.
qerqaş	(hn)	: Spî, çîl.
qeytan	(n)	: Xet, şerît.
qeza	(n)	: Navçe.
qilçik	(n)	: Perçeyeke li ser dêreyan.
qirnaþ	(n)	: Tayê ku pê nivîn tîn dirûtin.
qîç/qîçik	(hn)	: Zerê sayî.
qîr	(n/hn)	: Rengê reş, wekî qetranê reş.

qoç	(n)	: Parçeyek xwarin, parçeyek nanê devê mirov, balûl.
qoçîk	(n)	: Ji bo xemlê benên ku bi hev ve tèn girêdan û serê wan gilover tê çêkirin.
qudûm	(n)	: Taqet û hêza çokan.
quloz kirin	(l)	: Rakirin, bilind kirin, hevraz kirin.
qûç	(n)	: Kom.
qûnkêl	(n)	: Cureyeke kêla dirûtinê ye.

-R-

rav	(n)	: Nêçîr.
remildar	(hn)	: Faldar.
reşkew	(hn)	: Rengê ku reş û kew tevlihev in.
rindo	(n)	: Navê celebeke rengê qîç e.
rişte	(n)	: Navê xwarinekê ye.
rovî	(hn)	: 1. Ajeleke goştixwir. 2. Kesê ku ji aliyê mala zavê ve ji bo rojdanîna dewatê ji mala bûkê re tê şandin.

-S-

sakî	(h)	: Wisa.
sakîna	(h)	: Wisa.
salewxî	(n)	: Salek, seranserê salê.
savar	(n)	: Genimê kelandî û kutandî.
seba	(d)	: Bona, ji bo.
serad	(n)	: Amûra aşîkirina genim e. Ji bêjîngê girtir e.
serbisk	(n)	: Hiriya pêz a ser devê şê ye.
serde'waftî	(hn)	: Kesê ku ji bo karê dawetê bi rêve bibe ji aliyê xwediye dewatê ve tê peywirdarkirin.
serkuçk	(n)	: Gava savar tê kutanê savarê ku ser dimîne û baş nehatiye kutan.
serçêdan	(n)	: Çûna pêşîn a ji mala zavê ji bo mala bûkê û şayiya dergîstîtiyê.
sing	(n)	: Darê serîtûj ê di erdê de tê kutan ji bo tiştê rakêşe.

sirsûm	(n)	: Amûra çêkirina rûnê nivîşk.
sîce	(n)	: Navê giyayêkê ye ku ji bo rengkirina telaşê rîs tê bikaranîn.
sîpan	(n)	: Çiyayekî bilind e û navbera navçeyên Elcewaz, Milazgir, Erdîş û Panosê de ye.
sîpanê jêrê	(n)	: Gundekî Elcewazê ye, li bin Sîpanê Jorê ye û dikeve bintara Çiyayê Sîpan.
sîtil	(n)	: Derdaneke ji beroşê mezintir e. Nîvçe.
sîyarkirin	(l)	: Roja dawetê derxistin û birina bûkê.
sorcîn	(hn)	: Rengê hiriya miya sor e.
şewr	(hn)	: Ajela neavis.
sûlav	(n)	: Cew, çemê biçûk.

-Ş-

şeb	(n)	: Kevirê krîstal.
şene	(n)	: Amûra komkirin an jî belav kirina sap û giya. Dirgan.
şerjêkirin	(l)	: Serjêkirin.
şîrîmayî	(n)	: Roja dawetê. Kar û barê roja dawetê.
şiv/şivîk	(n)	: Darê ajotina heywanan. Ço.
şiveê	(n)	: Riya yekalî ya peya yan jî heywanan.
şixu	(h)	: Jixwe.
şîrîpîn	(l)	: Şîrpe şîrp, dengê şîrpandinê.
şorav	(n)	: Ava şor.
şûjin	(n)	: Derziya mezin a dirûtina cil an qumaşên bi rîs.

-T-

taþûl	(n)	: Giyayê pan ê rastkirî.
taþîgan	(n)	: Cureyeke dexilê ye, simbilê wê dirêj e.
tarş	(n)	: Koma heywanên tên xwedîkirin, pez û dewar.
tavehîv	(n)	: Heyveron.
teþ	(n)	: Perçeyên hevyek ên xalîçe û berikan.
te'jî	(n)	: Seyê nêçîrê, tajî.
taþaş	(n)	: Rîsê bi teþiyê hatiye ristin û hatiye gulokirin.

terkî	(n)	: Paşiya zînê hespê.
teşî	(n)	: Amûra ristina hirî.
tevn	(n)	: Çêkirin û dezgeya ristinê.
tewle	(n)	: Goma dewaran.
tewş	(n)	: Teşe, tîp.
texe	(n)	: Ji çend perçeyan perçeke gurzê giya.
teyrîk	(n)	: Çûkên ji teyrên mezin biçûktir, teyrê biçûk.
têr	(n)	: Xurca mezin a davêtin ser piştê heywanan.
tiirmix	(n)	: Amûra bidîran a komkirina sap û giya.
tirpan	(n)	: Amûra devtûj a birîna sap û giya.
tişşik	(n)	: Gundekî Ebexa Wanê ye.
tîr	(n)	: Zeviya bixet.
tîr	(n)	: Darê vekirina girikên hevîr ên pankirî.
tîx	(n)	: Koma dexil. Genimê wekî girekî berhevkirî.
torin	(n)	: Eşîreke Serhedê ye û ji konfederasyona Heyderî ye.
toxafk	(n)	: Rûnê ser şîr ketiye.
trîn	(n)	: Wesaîta bar û rêwiyan, tren.
tûncik	(n)	: Porê li pêş serî, li ser eniya mirov.
tûredew	(n)	: Tûrikê ku toraq tê lêkirin.

-U-

‘urf	(n)	: Edet, kevneşopiya gelekî.
-------------	-----	-----------------------------

-Û-

ûris	(n)	: Rûsya. Kesê ji netewa Rûsyayê.
-------------	-----	----------------------------------

-V-

vira	(h)	: Li vir, li vê derê.
-------------	-----	-----------------------

-W-

welatê jêrê	(n)	: Tirkiye. Rojavayê Tirkiyeyê.
werîs	(n)	: Benê stûr ê ku bi rîs çêdibe.

wira (h) : Li wir, li wê derê.

-X-

xalîşîrk (n) : Giyayekî zerkî ye ku di nava wê de aveke wekî şîr, spî heye û ev giya ji bo şewatê tê çinîn û hişkirin.

xet (n) : Her cêrgeyeke tîrekî. Xêzeke tîrî.

xêlî (n) : Pirtika ser rûyê bûkê.

xêncî (d) : Xeynî. Ji bilî.

xîţim (n) : Carekî qedandîna xwendina Quranê.

xorîk (n) : Navê gayê pêşiyê yê li ser gêleyê.

xoy (n) : Xwê.

xulpexulp (n) : Dengê kelîna avê yan jî kelîna tiştêkî di avê de.

xurc/xurcîk (n) : Cila sermilan a bi bêrîk e, du bêrîkên wê hene.

-Y-

-Z-

zarezar kirin (l) : Zarîn, bi derd û keser gazîkirin.

zar (n) : Zarok.

zarûk (n) : Navê giyayekê ye.

zeğîre (n) : Girtin û hilberîna berên şîr.

zibare (n) : Xebata bi komî, ji bo kirina karekî, biheq an bêheq, civîna hin kesan û xebata wan.

ziha (hn) : Ziwa, ne şil.

zîmhêr (n) : Dexilê ku ji bo hêranê diçe aş.

zîk (n) : Rîsê emeniyan e.

zol (n) : Postê ku xet xetî û dirêj tê jêkirin.